




دیا جوان

جارهك ژ جارا

كورتە چىرۆكىن فۆلكلورى



جارهك ژ جارا



- نافي پرتووكى: جارك ژ جارا
- نفيسەر: ديا جوان
- بابەت: كورته چيروكين فولكلوري
- بهرگ و ديزاين: مهسعود خالد گولي
- قهواره: ۱۵سم × ۲۲سم
- ژمارا لاپهرا: ۲۰۴
- تيراژ: ۵۰۰
- نرخ: ۳۰۰۰
- ژمارا راسپاردنى: ۲۲۱۸ ل سالا ۲۰۱۲
- زنجيره: ۱۹
- چاپخانه: چاپخانه ههوار/ دهوك- كوردستان
- مافين چاپى د پاراستينه بو ريفقه بهريا مه و خودانا پرتووكى ©

دیا جوان

جارهك ژ جارا

(پیلهك ژ دهریا پیمايی كوردی)

كورتە چیرۆكین فۆلكلۆری

ديارى

ژبو باقى جوان

به لکى،

جاره که دى ژ جارا

ره همه ل دى و باقى حازرو گوهدارا

چيروکا مه هه ره دهشتى

ئه زو تو هه قدوو ببينن ل بوهشتى.

ديا جوان

نافەرۆك

- ۹پېشگۈتەنەك
- ۱۱مىننەت
- ۱۳گوندى شووز
- ۱۵سۆفى
- ۱۷هەفالىتى
- ۲۰ئى نە بى مىكوت
- ۲۲ژنەكە كورد
- ۲۳عەبباس
- ۲۵كوپى ل سەر رىا سىرتى
- ۲۸شۇربا نىسكى (۱)
- ۲۹شۇربا نىسكى (۲)
- ۳۰مروڧەكى گوندى
- ۳۲شقان
- ۳۳تەخت تىرا مە ھەرچارا ناكە
- ۳۵قولنگ و روڧى
- ۳۷ژنتى
- ۳۹ھەر تىشتى دزى، دمرە ڧى
- ۴۱حسرهتا كانيا بەلەك
- ۴۴بەھرا من ڧى ژ ەلۆ رە

- ۴۷ مرۇڧ ل چ بگەرە دى ۋى بىينە
- ۴۸ ھەيڧا مە
- ۴۹ گۈللەك
- ۵۰ شاھ
- ۵۲ خىيارى تەحل
- ۵۵ ەلۋا تەتۋ بدە بابۋ
- ۵۸ خەون
- ۶۱ بەخت
- ۶۸ بېش
- ۶۹ بازىرگانەك
- ۷۱ چىرۋىكا دەرەوان
- ۷۵ دەرەۋ
- ۷۷ قەرەجى نابىن خاتوون
- ۷۹ بەرخ
- ۸۱ شىرەت
- ۸۵ گۈزرا باقى
- ۸۷ دوكتۇر
- ۸۸ ژ چىرۋىكىن مىرەكان
- ۹۱ بەشەك ژ گۈتەين پېشىين كوردان

پیشگوئنهك

فۆلكلۆر، گیانی گەله، گیانی وی یی پیرۆزه، فەژینه كه ژ دیرۆكا وی ره،
دهرگههه کی مهزنه ژ ملهتین دن ره، کو تی ره دهرباسی هنافین فی ملهتی بن،
وی بناسن، ناسینه كه خوهشك و سپههی ژ ههر ئالی فه؛ هزر و بۆچوون،
جفاك، ئابۆر، هونهر، چانده یا ب تهفایی.. و هتد. ل گهل كو فۆلكلۆر
گرنگترین ره گهزه ژ ره گهزین دهوله مدكرنا سه میانی چاندهیی گهلیری یی
ژیندار ره، نهینه كه ژ دیتنا رووی وی یی پهتی و روئیدار ره.

كهله پوور ب تهفایی - و كهله پووری دهفکی ب تاییه تی - پارچهك ژ فی
فۆلكلۆری یه، فەژینه كه ژ بوهره داریا وی ره، كۆلانه كه د دیرۆكا وی یا
كهفن ده، لیگه ره كه ل دیتنا ره هین وی یین كوور د خاکی ده چوویی.

كهسی كو ب دانهه فا فی كهله پووری رابه، رۆله كه وی ب خوه ژی خوه
د هشتنا باندۆره فی کاری ل یی دی - چ خوهنده فان و چ گوهدار - ده هدییه،
چكو دانهه فا وی ژیهاتیبوونه كه خورت دخوازه.. دفی كو ئه و كهس ژی ههز
بكه، كارساز و بکیرهاتی به.

د فان چیرۆکین كهله پووری ده، من ئەفۆتشت پهلاندن، ئەز ههست بووم
كو دیا جوان - ب هه موو شیانین خوه، خوه سپارتیه فی بابه تی، ژ دل و جان
کار ژی ره دكه، ئەفۆیهك من د دهربرینین وی ده دهردخست، ده ما كو
چیرۆكهك ژ وان دخوهند، و پی ره ژ کێفا ره دکر كو بفره، وه كه کێفا

زارۆكه كى كۆ ب له يستكه كه خوه بى نوو شا به. نه تهنى وهها، لى ههر كو
خوه ندنا وى چىرۆكى دوباره ژى دكر، ههر ئهو دهر برين ل سهر ديمىن وى
خويا دكرن.

هيقيا من ئهوه كو ئهف چىرۆك هن قورچك ژ دىرۆكا مه رۆنى بكن، هن ژ
ژيانا مه، دلپاكيا مه، و رهسهنيا مه بهرچاڤ بكه.

فهواز ئهبدى

مننهت

یهك ب رېكی ده چوو، جلیڼ وی پر تهنك بوون، هه و دی بارانه كه خورت لی كر. د بن بارانی ده مەشی. ژ نشكا فه دیت زلامهك ل مهینه كه بۆز سواره، ب تاخم و بهدل و كوركه، د بهر وی فه چوو و راوه ستیا. ژی پرسى: تو دچه كووده رى؟ بهر سف دا: نهز دچم فلانده رى. میړكى سوار گوت: نهز ژى دچم وی گوندى. یی سوار ژ یی په یار ره گوت: ها ژ ته ره فی كوركی من ل خوه كه، ژ بۆ تو شل نه بی و نه جهمدی. میړكى په یار سپاسی ژى ره كر و گوت: نه خیر من ناڅی. هنگی روو لی دانی میړك قه بول كر و كورك ژ دهستان گرت و ل خوه كر.

پشتی دهمه كه نه دريژ، باران سه كنى. كوركی میړك ژ خوه كر و د گهل چهنه د سپاسیان دا خوه دی. لی خوه دیی كورك، هه ر كیلكى، ژ میړك ره دگوت: بنیره، خوه دیی نهز ژ ته ره رېكرم، خوه دیی ده لیلی ته بوو كو تو راستا من هاتی، گهلۆ كو تو راستا من نه هاتا و من كوركی خوه نه دابا ته، وی چ ب سه رى ته بهاتا؟!

جاره كه دن میړكى په یار سپاسیا وی دكر، و دگوت: بهلی راسته. هه ر هنه كى ب رى فه دچوون، خوه دیی كورك دگوت: یا هو، كو نه ب خیرا فی كوركى با، نه افا ژ جلیڼ ته دهه ركن، فیگا حالى ته نه ت

حال بوو، فېڭا تو ئاۋ و ھەرى بوو. مېړك دهمه كىٰ خوه كەر كر و ھەر
بەرسقا وى دا، ھەتا گھا دەھما گۆلە كە ئافى. ل سەر كەڤيا گۆلى سەكنى
و خوه ئافىتە نانا گۆلى. خوه د ناۋ دە گەڤازت. دەما ژ گۆلى دەر كەت،
تەڤدە بوو ئاۋ و ھەرى. ل خوه دىي كورك نەرى و گۆت: فېجا تىشتە كى تە
ب من رە ما؟.

گوندى شووز

هەر كەزىزەرەك سىمبىلسۆرەك د پىشت دە يە

ناۋ و دەنگى گوندى شووز ب مالدارى، مېرخاسى و جوانيا كەزىزەرەك وى بەلاۋ بوو. جاره كى برەك دز گەھانە ھەۋ و ژ ھەۋ رە گۆتن: وەرن دا ئەم ھەرن بگرن سەر شووز، ئەمى تېرا خوە مالى دىيائى بىنن، و ئەمى ھەر يەك زەريەكى ژى ژ خوە رە بىنن. وەرن دە ئەم خوە بدن ھەۋ و ھەرن.

خوە ددن ھەۋ و بەرى خوە ددن گوند. ب رى ڤە، پېرگى پېرەكى و نەڤىي وى تېن. پېرى ژ وان پېسى: ھوون كېنە و ب كووفە دچن؟ ژى رە گۆتن: بەرى مە ل شووزە، ئارمانجا مە ژى فلان تشتە. پېرى خوە ئاڤىنە تۆر و بەختى وان و ژ وان رە گۆت: ھوون نەڤىي من ژى ب خوە رە بىن. بەلكى ھوون ھەك مال بدن و زەريەكى ژى ژى رە بىنن. ژ بەر نەڤىي من سېويە و ئەز خزانم و نكارم وى ب ژن بكم.

نەڤىي پېرى ژى دگەل خوە برن و چوون. چوون و چوون، تا كو گەھانە بىندەرى گوند.

شووزى ل وان ھاتن ھەۋ. بەريا كو بگەش نانا گوند، كتەك ژ وان نەھشتن، ھەمى كوشتن. نەڤىي پېرى گرتن.

ژى پېرسىن: تو كوركى بچووكى، تو نە بى ڤان تشتاى. تو ھاتىي چ؟ كورك ژ وان رە گۆت: ئەوان ژ پېركا من رە گۆتن "ئەمى ھەرن مالى

شووزيان ژ خوہ ره بينن و ھەر يه کي کەزیزەرە کي ژ خوہ ره بينن " ژ بۆ ولۆ
پيرکا من ئەز ژي ب وان ره رێکرم.
ژ کورک ره گۆتن: دە ھەرە، ئەم تە ناکوژن، دا تو ھەری سەرانسەری
وہلاتي خوہ بەلاڤ کي و ژ خەلکي ره ببيژي: راستە کەزیزەرین شووزيان ھەنە،
لي ھەر کەزیزەرەك سەبیل سۆرەك د پشت وي دەيە.

سوڤى

سوڤى خوهدى رههكه سېى و دريژ بوو، دريژى و فەتليڻ وي دگهانه
ناشتهنگى. سوڤى پر خوه ب وي رهى پايه دكر، نهمازه د كوچك و جقاتان ده.
خهلكى ژى پر ريژداريا وي رها سېى دگرتن. سوڤى تم نهو ره مينا سهميانه كى
ژ خوه ره دديت؛ هدر و هدر د جقاتان ده ب وي دلەيست، ل دهست و تليين
خوه ديپچا و دبر و تانى، هن جارن شههك بچووك ژ بهريكا خوه دهردخست
و شهه دكر، ههتا روژه كى د جقاته كى ده، كهچكه كى ژى پرسى: نايى سوڤى!
تو ب خوهدى كى، تو ب شهڤى دهما كو تو رادزى، تو رها خوه دخى بن
لخيفى، يان ل سهر وي دهيلى؟

نايى سوڤى ژ فى پرسى فهجنقى. ژ كهچكى ره گوت: خوه ل من بگره،
سېى دى بهرسقا ته بدم.

سوڤى ب گيژو ميژو هاته مالا خوه. ژنا وي، زاروكين وي ژى پرسين: چ
ب ته هاتيه؟ بهرسقا وان نه دا. تهنى گوت: زووكا جيى من دهينن دا رازيم.
سوڤى كهته ناڤ جهى خوه. رها خوه خست بن لخيفى ده، دهياخا وي
نه هات. داني سهر لخيفى، ديسا دهياخا وي نه هات. ههتا روژ ل سوڤى هلات،
خهو نه كهته چافى وي. سوڤى ههر وي رهى دخه بن لخيفى و ددهينه سهر
لخيفى. ههما كو روژناهما روژى دا دهر، دا خوه رابوو، نهو ره دا بهر مەقهس و
جووزانان، نهو رها سېى مينا بهله كى بهر فا چيايى هه ره كوولى ب سهر بهژنا
سوڤى ده ههركى و هاته خواري و ل نەردى بهلاڤ بوو ل بهر بايى كهت. دهما

سۆڧى ل بەر مړىكى ل خوږ نه‌رى، نه‌ما خوږ ناسكر، و هډو كارى هډره كۆچك
و جفاتان ده روونى. سۆڧى بوو پېته‌فركى ده‌ڧى گوندى و جيرانان، بوو
به‌نيشت و كه‌ته نا‌ډ ده‌ڧى خه‌لكى، ته‌نى تشتى كو ژ سۆڧى ده‌ات نه‌ډ بوو؛ هډر
كو ل بهر نه‌ينكى رادوه‌سته‌ها دكر نه‌چ و دگوت: ڧى بېياڧى چ ژ من كړ!

هەقالتى

كۆرەكى نووگەشتى بۈك هەقالتى خۇە رە پەيدا كىرۈۈ، ل نك باقى ۋى بابەتەكە زۆر بالكىش بوو و گەلەك گۆمان ژى دكرن. ناۋا ناۋنا رە، باقى ژ ۋى دپرسى: ئەۋ هەقالتىن تە كىنە؟ چاۋانن؟ تو ب وان باۋەرى، كو ئەو هەقالتىن؟. كورك ب ئاجزى ل باقى خۇە قەدگەراند: بەلى باقۇ! هەقالتىن من چىترىن هەقالتىن.

د بەر رە قەرقىن خۇە ل باقى خۇە دكرن؛ ژى رە دگۆت: بىرە باقۇ! ئەز ب قى تەمەنى كچك، من ھەندە هەقالتى ژ خۇە رە چىكرنە، و تو خۇەدى قى تەمەنى درىژ تە نكارى ژ يەك هەقالتى پىقە پەيدا بكى! ھەتا رۆۋەكى مېرك بان كورپى خۇە كر و گۆت: تى ئىرۆ ب من رە بى و مالا هەقالتىن خۇە نىشان من بكى و بى كو تو بئاخقى و بى كو پرسەكى ژ من بكى.

كورك ژى گۆت: بلا باقۇ! مېرك رابوۋ چەۋالەك تژى قەرىپال كر، و چەند كەقەر ژى كرن ناۋى دە. پىشتى نىمىزا ئەشايى ژ كورپى خۇە رە گۆت: دە بىدەشە دا ئەم ھەرن. مېرك راھىشت ۋى چەۋالى قەرىپالان و ئاقىتە سەر پىشتا خۇە. كورك دا كىلەكا باقى و مەشەن. ل دەرىيە هەقالتى لىۋك بى پىشى دان. هەقالتى لىۋك دەرى قەكر. خىرەتەكە گەرم ل وان دا و ژ وان گۆت: كەرەمەن ھوندر. لى باقى لىۋك د جەي خۇە دە ما راۋەستايى و ژى رە گۆت: بەرىا ئەم

دەرباسىن مال دە، ھاجەتەك مە ھەيە.

ژى رە گۆت: ھا ئاپۇ! بېژە، خېرە؟

مېرك گۆت: شەقى دى، دز كەتن مالا مە، ئەڭ كورى من بى كۆ ھەقالى تەيە، يەك ژ وان كوشت، و ئەڭ چەوالى كۆتول سەر پشتا من دىيى، لاشى وى تى دەيە. مە دقى ئېشەڭ توفى لاشى ل جەم خوە بهەوينى تا كۆ ئەم سبەھى رېكى ژى رە بىين.

لاوك كەتە ھەڭ، و ئەما زانىبوو چ بېژە، و گۆت: ژ بۆ خوەدى ژ من دوور بىكەڭ. و دەرى د رووى وان دە گرت.

ب قى ھاوى چوون مالا ھەقالى ددوان، و بى سسيان و بى چاران... ھتە. ھەميان ئەينى بەرسىف دانە ھەقالى خوە و باقى وى.

مېرك ژ كورى خوە پرسى: ھەقالىن تە خەلاس؟

لاوك گۆت: بەلى بابۇ!

گۆت: دە قىجا وەرە ئەم ھەرن مالا وى ھەقالى منى ب تەك و تەنى.

چوون، گەھان دەقى دەرى، دەستى خوە ل دەرى دان. ھەقالى وى دەرى فەكر، و خوە ئاقىتە دەڭ و رووى وى، ب چەند گۆتېن بوھا و رېژدار پېشوازى لى كر، ژى رە گۆت: كەرەمكە دەرباس بە. لى باقى كورك ژى رە گۆت: نەخېر. دەم دەرەنگى شەقى يە. ئەم دەرباس نابن، لى ھەوجەبوونەك مە ب تە ھەيە. خوەدى مالى گۆت: كەرەمكە بېژە. گۆت: شەقى دى دز ھاتن دا بىكەڭ مالا مە، و من يەك ژ وان كوشت. فا من لاشى وى كرىە قى چەوالى دە، دا ئەز ئېشەڭ ل با تە بهېلم ھەتا سبەھى رېكى ژى رە بىين.

ھەما خوەدى مالى، بى دودلى دەستى خوە ئاقىتە چەويل و ژ پشتا وى ئانى

خوار، و دا پشتا خوه و بره هوندر، و ب لهز ل ههڅالی خوه څه گهرا و ژى ره
 گوت: ده دهرباس بن هوندر، ده ست و روى خوه بشون، دا هوون شېڅه كى
 بخون، نها تو پر وهسته هايى، لى چه وال و تشتى د چه ويل ده نه ته ديتى و نه ته
 كرى. نهو تشتى بووى ته نه ديتى و ته نه بهيستى. هه مى دبه ئايدى من و ب
 من څه گرېدايه، و نهز دزانم چاوا و چلو بكم.

ميرك وى چاخى ب كه لوگرى ل لاوى خوه نه رى و ژى ره گوت: كورى
 من! ته هه څالتي ناسكر چاوايه؟

و ل هه څالتي خوه څه گهرا، ژى ره گوت: نهو چه والى كو ته راهستى و بر،
 ت لاش تى ده نين، نهو تژى قه رپال و كه فرن، ته نى من خوه ست لاوى من
 بزاني كا هه څالتي راست چاوايه.

لی نه بی میکوت

دهما کو تهحسیلدار دهاته گوند، دا کو بیښی ژ گوندیان بستینه، گوندی همدی ل مالا موختیر کوم دبوون، بیښا خوه ددان، ژ بلی مروځه کی گوندی کو خوه کربوو "سید و خوه دیی کهراماتا" پیځه. ل سید دبوورین. ب تهحسیلدار دابوون فیملکرن، بی کو تائنداری ل سید بکه، وی سید و "نجدادی" سید ب وان څه بدن و وان بکوژن.

ب فی هاوی سال و مده دهرباس بوون، نهو ماموور هاته گوهترن و یه کی دی هاته شوونا وی. گوندی همدی کوم بوون، ماموور نافی وان یه کو یه کو خوه ند، نافی سید ژی خوه ند، سید ل وی دهری نه ناماده بوو. میرک پرسى: چما نه هاتیه؟ ژی ره کوژن: سید ژ بیښی مه عفی یه. میرکی تهحسیلدار کوژن: نه ز فی تشتی نزام. دفی وهره نهو ژی وه که گوندیا، بیښا خوه و کوفله تی خوه بده.

گوندی نه چار بوون، ریکرن پدی سید، نهو و کوړی خوه هاتن جفاتى. دهما دوزا بیښی ل سید کرن، ناقل د سهری وی ده نهما. هنگی گه ف ل ماموور کرن: نه زى ب تهفه بدم، وی جددی من ب تهفه بده. میرک کوژن: نه ز زلامی دهوله تی مه، نه ز فا تشتا نزام. نه ز نیشه ل گوندم، موهله ت هاتا سیهی ب ته ره یه، کو تو ژی مینا فان گوندیا بیښا خوه بدی.

کوړی سید دیت کو وی بافی وی ژی بیښی بده. یا ژ وی موهمتر وی بافی وی ژی بیه مینا مروځه کی گوندی، ئیدی کهس ژ بافی وی ناترسه و

ههسا با ناکه. کورک ما شیار و پر فکری. گۆت: دقئ نەز تشتەکی بکم.
 راهشته میکوته کی و چوو کەتە وی گۆفا کو مهینا تەحسیلدار تی ده یه.
 میکوته ک ل ئەهینا وی دا. مهینی نه دا و نه ستهند، د جه ده مر، و هیڊیکا
 کورک فەگهرا مالی و کەتە ناؤ جی خو، بیی کو کەس لی های بیه.
 سەری سبهی، سەید و کورپی خو ژی، چوون بیشا خو دان. میرک تاشتیا
 خو خوار، و چوون دا مهینا وی ژی ره بینن، دا هه ره سەر ئوخرا خو. چ
 بینن، وا مهین د گۆفی ده مری یه. گونڊیا هه میا ژی ره گۆتن: ئەؤ ژ ناھی
 سەید بوو. کەزەب ل ماموور قەتیا. ریکره پە ی سەید و کورپی وی. پەری وی
 لی فەگهرا نندن. دەستی وی ماچکر و دانی سەر سەری خو، لیبوورین ژی
 خوەست، و گۆت: یا ره بی تو زارۆکین من بهاریزی.
 سەید دیسا گەش بوو و ژی ره گۆت: من ژ ته ره گۆت "کەس نکاره به لا
 خو ل من خی، جددی من ژ وان ره قەبوول ناکه". کورپی سەید هیڊی هیڊی
 ب خو ره داخفی و دگۆت: بابۆ وهله تو راست دیژی لی نه بی میکوته.

ژنه که کورد

ژنه که کورد ب دو جانا بو، د مه ها خوه يا داوی ده، کو زکی وی ل
نهرچدنا وی دکهت. هه و دیتن ئیقاره کی مهفانه کی وان هاته مال ده. پشتی شیفا
مهفان دانی ب قهدهره کی، میړک ژ ژنا خوه ره گوت: ده هدره شهبه شه کی ژ
مه ره بینه دا ئه ز و مهفانی خوه بشکین و بخون.
ژنک چوو راهشته شهبه شه کی مه زن، و نانی ل بهر میړی خوه و مهفان
دانی. میړک گوت تهرق تهرق دهستی خوه ل شهبه شه دا. ژی ره گوت: هرمدت،
ب خوه دی ئه ژ شهبه شه کاله. کا وهره فی به، یه کی دی بینه.
ژنکی هیډیکا و بی دهنگ هات راهشته وی شهبه شی بر و یه کی دی نانی.
ههفت جاران ژنکی شهبه شه ک دبر و یه ک تانی. داوی ده میړک ژ مهفانی
خوه ره گوت: تو دزانی! ب خوه دی ژ فی شهبه شی پیقه د مالا مه ده نینه.

عەبباس

ل گوندى مە، كۆركەك ھەبوو ئافى ۋى عەبباس بوو. عەبباس ژ بچوو كاھيا خوە دە نە مەشى و ب رېقە نەچوو، و ھەم ژى يەكانە بوو ژ دى و باقى خوە رە. لى تەقى ۋى رەوشا خوە ژى، ھەر سېھ ب چالەپكا، ژ سېھى ھەتا ئېقارنى، ژ مالى دەردكەت و دچوو ئافى زارۆكا دليست. ئەو ژى مينا ھەمى زارۆكىن گوند دچوو، دھات، ب وان رە دليست، لى ل سەر چارپىكا ب ئەردى قە دخوشيا. لى جارنا خوە د ليستكى دە ژبىر دكر، ھەو دديت كۆ تارى كەتە ئەردى، و زارۆك ھەمى دېەزىن دچوونە مالىن خوە. عەبباس دما د جھى خوە دە روونشتى، ھەتا كۆ دھاتە بىرا ديا ۋى دچوو لى دگەرھا، رادھشتى و ئەو تانى.

تەمەنى عەبباس د نەھساليا خوە دە بوو، رۆژەكى مينا ھەمى رۆژىن دى، د ئافى زارۆكان دە، ل سەرى شېرى، دليست. دەم زەرە كرۆژ بوو. تارى ھىدى ھىدى خوە بەردا ئەردى، ژ نشكى قە، زارۆكان ھەمىا دان بەر قىرا و گۆتن ھەڤ:

-بازدن، فا گاران ژ ور قە تى، ۋى چىلە كا چىچ، پىل مە بكە.

عەبباس ھەو ديت كۆ زارۆك ھەمى ژ دۆرى چوون، ئەو ما ب تەنى. ديت كۆ گاران ژى ژ ور قە تى، ل دۆرا خوە نەرى، ديت كۆ جىرانا وا ژ كانى تى، و بەرى ۋى ل مالى يە. عەبباس بانگ ل ۋى كر:

-خالىكى! توب خوەدى كى، توبلەز ھەرە مالا مە، ژ ديا من بىژە:

عەبباس ل سەری شیرەیی، یە، بن خوە گەمار کریه، و وا گاران ژێ ژ ور فە
تێ، بلا بێ من ببە، هەدی نەخوە وی چیلە کا حیچ پیل من بکی.

ژنکی ژێ لی فە گەراند و گۆت:

-عەبباس! هەدی رهێ خالە تا خوە، هەوقاس زمانی ته درێژە، دە بده خوە و
رابە بده شه. ب خوە دی ئەز نەچووم و من ژ دیا ته ره نە گۆت. بلا هەما
چیلەك پیل ته بکی و دیا ته ژ ته خلاس بی.

دژنك مەشی و چوو. عەبباس ل هاوێردۆری خوە نەری، دیت کۆل کۆلانا
ژێ کەس نەمايه. ژ ئالیکي دیقه دیت کۆ گاران هیدی هیدی نێزیکي وی
دبوو. عەبباس مرنا خوە د بن سمین چیلە کێ دە تانی بهر چافی خوە. بی گۆمان
عەبباس ب خوە ژێ نرانی چلۆ و چما دا خوە و بهزی، و بی راوهستان، تا کۆ
گەها مالی و خوە ئافیتە سینگا دیا خوە.

كۆرۈل سەر رىا سىرتى

ل گوندېن كوردستانى، ھەر داويا پاينى، ژ ھەر مالەكى مۇشەك يان دو مۇشەك دچوونە باژىر، دا پىندىيىن خوە بىن بەريا كۆ بەرف بى و رى و رىبار بىنە گرتن.

رۇژەكى، د داويا ۋەرزى پاينى دە، مېرك و ژنا خوە، بارەك مەويژل كەرى خوە كرن و بەرى خوە دان باژارى سىرتى، دا كۆ مەويژان بدن ب جاو و ھنەك پىندىيىن خوە. پىشتى قەدەركى چوون، د نىقى رى دە، راستا مۇشەكى كۆر ھاتن. دىتن كۆ تەقەرەقا چۆفكى وى يە، ل كەش و كۆرتكان دلو كۇمە. مېرك و ژنا خوە ژ بى كۆر پىرسىن:

-تو دچى كۇودەرى؟

مېرك گۆت:

-ئەز دچم سىرتى.

ۋان ژىرە گۆت:

-ئەم ژى دچن باژارى سىرتى. دە ۋەرە دا ئەم تە ژى ب خوە رە بگھىنن

باژىر.

مېركى كۆر بى دودلى ب ۋان رە بوو ھەفال و چوون. پىشتى دەمەكى مېرك

ژ ژنا خوە رە گۆت:

"تو ژ ناڧارا كەرى پەيار بە، ئەمى ڧى جوامىرى كۆر سوار بكن."

ژنك پەيار بوو، وى و مېرى خوە ب دەستى كۆرۈ گرتن و ل كەرى سوار

کرن. هەرسێکا ریا خوە بەردەوام کرن. ب رێ دە یی کۆر دەست ب پرسا کر :

“نافی ته چیه؟ نافی ژنا ته چیه؟ بارێ کەری ته چیه؟”

مێرک ژێ بەرسقا هەمی پرسین وی ب دورستی دا. ب ریا خوە دە چوون تا کو گهەان دەستپێکا باژێر. ژ یی کۆر رە گۆتن:

-فا ئەم گهەان قۆناخا خوە. دە قینجا پەیار بە، دا ئەم ژێ هەرن ب کارێ خوە فە.

هەو دیت ژ نەشکافە کۆرۆ کر قیر و هەوار. خەلک ل خوە جفاندن. خەلکی پرسی: «وہ چ ژ فی مروۆفی حافز دئی؟!» مێرکی کۆر رێ نەدا یی دی و گۆت:

-ئەز مروۆفەکی حافزم، ئەو پیرەکا ها ژنا منە، ئەو ژێ کەری منە، نافی ژنا من ئەفە، و بارێ کەری من ژێ مەویژە. ئەو مروۆفی ها ب ریتقە راستا مە هات، هەفالتیا مە کر، خویایە ئەو و ژنا من ل من بوونە یەک. دخوازه ژنا من و کەری من ژێ من بستینە.

یانی چیرۆک سەرووبن کر و بەرووفاژی فەگەراند. چقا مێرک و ژنا خوە بانکرن و سووند خوارن، مێرک گۆت: “ئەو ژنا منە و ئەو کەری منە.” لی گۆتین وی یی ئەنجام بوون. خەلکی هەمی ژ یی کۆر باوەر کرن و ژ وی و ژنا وی باوەر نەکرن. خەلک ب دار و کەش و خەبەرەن ب مێرک کەتن، دگۆتن: “ئەو فەقیر کۆرە، تو دخوازی ژن و کەری وی ژێ بستینی.”

د وی قەلەباخی دە پۆلیس هاتن. مێرک و ژنا وی گرتن و برن. یی کۆر ب تەنی ما. پۆلیسەک تەنی ل بەر وی هشتن بیی کۆ هایا وی ژێ هەبی. ژ وی

ھەبوو كۆ دەنگى ۋى ناچە كەسى؛ د بەر خوە دە دگۆت:
 ”ب خوەدى ھەگەر ژنك و كەر گھانە من، فیتلان و فیت، ھەگەر يەك ژ
 وان بگھى من ژ خوە فیت.“
 د جە دە ئەو پۆلىسى نۆبەدار ب فركا ۋى گرت، و ل سەر گۆتني ۋى
 بوو شاھد. ژ نووڤە ژنك و كەرى ۋى لى ڤەگەراندن و ليپورين ژى خوەستن.
 لى بەريا ميړك ب رى بکەڤە و بچە، ل يى كۆر ڤەگەريا و گۆت:
 -ئەزى ژ بو خوەدى شيرەتەكى ل تە بكم: تو ڤى تىشتى كو ب مە رە
 چيپووى ژ ت كەسى رە نەبېژە، ژ بەر ھەچى بېھيزە ھەو رەھى ل كوران
 دكە. بى گۆمان كۆر ھەمى نە مينا تەنە.

شۆربا نيسكى (ا)

مرۆفەك چوو مېقانداريا مالەكى. سەرى سېهەي، ئەو و خوەدیی مالی روونشتن ل بەر سفری ل هێقیا تاشی. پشتی دەمەكە نە درێژ، كەبانيا مالی بەرۆشا نيسكى نانی، فالاکر لەگەنەكى و دانى بەر وان. مێركى مېقان يەك نەكر ددۆ ب لەز راهشته كەفچكى خوە و د نيسكى فە كر، داگرت و ب سەر خوە دە كر. و پێرە زمان و گەورى هەمى لى پەرتين، نەما زانیسو وى چ بكە. داقورتینی بلا قرك و هەناف بىشەوتن، يان ژى ژ دەفلى خوە فەگەرىنە و فالاکە بەرگەشى و خوە بهەتكینە! هەما بوو خەرخەرا وى و بەرى خوە ب ژۆر فە كر. شۆربە د دەفلى خوە دە بر و نانی.

خوەدیی مالی زانی كو چ ب سەرى مېقانى وى هات. ژى پرسى:

-مېقانى دەلال، خېرە؟ تو چما ب ژۆر فە دنېرى؟

مېقان ژ نەچارى شۆربە داقورتاند و ژ خوەدیی مالی رە گۆت:

-ئەزبەنى، من دخوەست ئەز ژ تە بېرسم، كا تە ئەف بەشت و كژوولەك

چاوا چيكرنە؟

خوەدیی مالی لى فەگەراند و گۆت:

-مېقانى هېژا، چيكرنا وان بەشت و كژوولەكان پر ب هيسان چييوونە،

تەنى من ئەو ب هەك دەياخ و دو پفا چيكرنە.

شۆربا نيسكى (۲)

رۆژەكى مۆڧەك و كۆپى خوه، چوونه مېقانداريا مالهكى. خوه ديا مالى تاشتيا وان شۆربا نيسكى چيكر. دهما بهرۆش ژ سهر تفكى داني يه كسهر قالالا كر له گه نه كه كورور ده و داني بهر وان. كورك خوه نه گرت، ههما دهستى خوه ئاڧتته كۆدين داگرت ژ نيسكى و ب سهر خوه ده كر. ژ گهرميا نيسكى دهڤ و گهورى ههمى لى شهوتين. ژ بهر ئيش و شهواتى يه كسهر رۆندك ژ ههر دو چاڧى وى بارين و ب سهر هناركين رووى وى ده هاتن خوار. هين باڧى وى دهست ب خوارنى نه كرىه، ل كۆپى خوه نېرى و ژى پرسى:

- كۆپى من، خيهر؟ تو چما دگرى؟

كۆپى وى لى ڧه گهراند و گوت:

- باڤو ب خوه دى نه و براى من يى وى سالى مرى هاته بىرا من، و كهلا گرى ل من دا و نهز گريم.

باڧى كوروك ژى د پدى وى گوتنى كهڧچكى خوه د بن شۆربا نيسكى داكر و ب سهر خوه ده كر. ئاگر و پيت ب دهڧى باڧى ژى كهت. هيسرا ب سى ريزه ژ چاڧى باڧى وى ژى دان پدى ههڤ. كوروك ژى ژ باڧى خوه پرسى:

- باڤو، تول سهر چ دگرى؟

باڤو لى ڧه گهراند و گوت:

- كۆپى من! خوه زى نهز ل سهر ته بگرىما بهرىيا براى ته.

مرؤشه کی گوندی

بهريا نميڙا نيڦرو، زلامهڪ چوو سهر كهڦري نيڦي ھولا گوند^(۱) ده، شيپا
سهڪني و بانگ گونديان ڪر:

-ههواره گوندينو ههواره. ههواره گوندينو ههواره.

گوندي ههمي ڙ ماليڻ خوه دهرڪتن، هوور و گر، بچوڪ و مهن، ڙن و
ميڙ، پير و ڪال. ههمي ل ھولا گوند ل دؤرا ميڙ ڪوم بوون. ميڙ ڪي پري:
-گهلو ڪس د مالا خوه ده نهمايه؟

ڙپره گوتن: نهخير. ههمي نامادهنه.

ميڙ ڪي دهست پيڪر و گوت:

-ڦي سبهه ڙوون ڙ خوه رابووم. من تاشتيا خوه خوار و جلي خوه ل
خوه ڪرن، من ڪهري خوه ئيم و ٺاڦ ڪر و ٺاڦول لي ڪرن، و من بهري خوه دا
چي. ل ور من داري خوه بهرهه ڪرن، و ل ڪهري بار ڪرن، ب وهريس
شداند، و من بهري خوه دا مالي. ب ري ده، دهما نهز گهام نهوالا گرڪي
ڙپرا، ڪهري من شهمتي(تهحسي)، ڪهته ٺاڦا ههري و چامووري. هيدي هيدي
د ٺاڦ ده چوو خوار، من باري ٽيڙنگا ڙ سهر پشٽا وي ٺاڦيٽ. من جارنا گوهي
وي دکشانند و جارنا دووڦي وي. لي فعيده نه ڪر. بهرف ههلهها بوو و

(۱) تهحتنه ڪه (لات) مهن د نيڦي ھولا گوند ده ڀه. نهو لات جهي ڪومڪرنا گوندياڀه د
چيپوونا بروڀره ڪه گرنگ ده.

چامووری زۆرا من و کهری ره‌به‌ن هه‌ردوو کا بر. کهری من د ناڤ ده نۆق بوو
و مر. من ب دله‌کی کول و ده‌هی ب کۆڤان ده‌ڤ ژێ به‌ردا و به‌ری خوه‌ دا
مالی، و ئەز هاتم.

ب فێ گۆت نا داوی ره‌ راوه‌ستا و بێده‌نگ ما. هین خه‌لکی گوند ل هه‌قییه‌
کا وی چ بێژه. ب هه‌ڤ ره‌ بانگ کرنی:

-ئێ..ئێ..ئێ..ئێ.. چ چیبوو؟ دی تی چ ببیژی؟

مێرک ل وان فه‌ گهراند و گۆت:

-هه‌و، ئەڤ بوو یا من ژ وه‌ ره‌ گۆتی.

خه‌لکی کرن نه‌چ نه‌چ، ده‌ستین خوه‌ ل هه‌ڤ دان و سه‌ری خوه‌ هه‌ژاندن.
گۆتن:

-هه‌ما ئەڤ بوو؟ ته‌ ئەم هه‌می ژ بو فێ یه‌کی ل فیده‌ری کۆم کرن؟ ما

هه‌ژابوو ئەم هه‌می ده‌ڤ ژ کار و مالین خوه‌ به‌ردن و وه‌رن؟

مێرک ل وان فه‌ گهراند و گۆت:

-به‌لی هه‌ژابوو. ما ئەز ڤالامه‌ ژ نه‌ا و چار سالین دی، چ یه‌کی گوندی

بگه‌ی من و ژ من بپرسه‌: کا کهری ته‌ چاوا مر؟

شقان

شقانەكى كارا خوه كر دا بچه حەجى. بەر يا ب رى بكهفه، پەزى خوه
هەمى كۆم كر و ژ وان ره گۆت:

-باش ل من گوهدار بكن، قا بەرى من كەتیه مالا خوهدى، ئەفە چەندك و
چەند سال كو ئەز و هوون ب هەفرە نه، ئەز دزائىم كو من گەلەك تەعدارى ل
وه كرىه، من گەلەك ل هەوه دايه، من گەلەك جاراسمك و سترهه هەوه ژى
شكاندنه، و من زارۆكىن هەوه ژى گورانده، لى بى گۆمان ئەز ژى ب وەرە
وہستەهامە و ژ بو هەوه شيار مامە، فېجا هەگەر كو هوون ل من نەبوورن،
حەجا من قەبوول نابە.

ب فى گۆتى ره شقان راوہستەها، پەزى وى هەميا ل هەف نەرىن و بەرى
خوه دانى و ب يەك دەنگى ژېره گۆتن:

-بەلى ئەف تەشتين كو تە گۆتن هەمى ژى راستن، و ئەم ژ بو فان هەمیان
ژى ل تە دبوورن، لى يەك تەشت ب تەنى هەيه كو ئەم ل تە نابوورن.

شقان د جهى خوه دە جەفلى و كەتە هەف، پرسى: گەلو ئەو چيە؟!

پەزى وى لى فەگەراندن و گۆتن:

-تە ئەف كەرى ها، زەنگل دكر و سبەھ و ئىقارا ددا پېشپە مە، و مە ژى ژ

نەچارى ستووى خوه خوار دكر و ددا پەى وى، تە دزانى ژى كو ئەم هەمى ژ
وى زانەتر بوون.

تەخت تېرا مە ھەرچارا ناکە

زلامەكى بى ب ژنەكە بى رە شوو كر. ژ ھەڧرە گۆتن: ھالى مە
ھەردوو كا مينا ھەڧە، ئەمى ھەردوو ژى ب ھەڧدوو بستر. پىشتى دەمەكە نە
درېژ، ھەر كو مېرك ژ دەرى ڧە بھاتا، و تىشتن بى رە بانا، ژنكى قىما خوھ پى
نەتانى. ھەگەر مېرك كىلۆك گۆشت بانىا، ژنكى دگۆت: ھۆۋۆ، مالا مى!
رەھمەتى شەقا پەزەكى تانى.

ھەگەر كىلۆك ماست بانىا، وى بگۆتا: ھۆۋۆ، مالا مى! رەھمەتى ب ستلا
تانى.

ھەگەر كىلۆك دمس بانىا، وى بگۆتا: ھۆۋۆ، مالا مى! رەھمەتى ب دەنا
تانى.

مېرك ژى ژ ئالىي خوھ ڧە تەخسىر نەدكر. ژنكى چ بkra و چ چىكرا ئەوى
ژى قەلف و رەخنە لى دكر. دەما كو خوارنەك ددانى بەر، دگۆت: ھۆۋۆ، كا
خوارنا رەھمەتى!

دەما كو مال پاقژ دكر، دگۆت: ھۆۋۆ، كا پاقژيا رەھمەتى!

دەما كو جل دشووشتن، دگۆت: ھۆۋۆ، كا شىشتنا رەھمەتى!

ھەر وى دگۆت "رەھمەتى"، و ھەر وى دگۆت "رەھمەتى". ھەتا رۆژەكى
مېرك بانكرە ژنكى گۆت: ھەرمەت كا وەرە روونە و ل م گوھدارى بكە.

ژنك ھات روونىشت و گۆت: بەلى بېژە ئەز گوھدارم.

مېرك ژېرە گۆت: وەرە ئەمى ھەڧوودوو بەردن.

ژنکی خوہ ھلانی ول نەردی دا، گۆت: وا پەپووکى! وا کەزیکورى! قەى
چ بووید؟ چ قەومیە؟ چلو ئەمى ھەفودوو بەردن؟ سەر چ؟ ژ بەر چ؟ ھینا
نەبوویە چار مەھى مە! فى گۆھتنى ژ سەرى خوہ باقىژە.
لى مېرك ژ یا خوہ نەھاتە خواری، گۆت: ھەرمەت، دفى ئەم ھەفدوو
بەردن، ژ بەر کوریا مە ھەر چارال سەر تەختە کى نینە.

قولنگ و رۆقى

رۆژە كى رۆقى و قولنگ راستا هەڤ ھاتن. رۆقى ژ قولنگ رە گۆت: «دە وەرە ئەزىبەنى، ئەز و تو دەستى ھەڤالتى بدن ھەڤ. ئەمى داويى ل دژمنا تيا د نافيەرا باڤ و كالىن خوە دە بين». قولنگ گۆت: «ب خوەدى تو راست دييژى. ئەز ب خوە ژ بۆ پەيمانا ئاشيتى د نافيەرا من و تە دە ئامادە مە». رۆقى گۆت: «دە وەرە دەستىكى دە ھەڤدوو بەزمين سەر فراڤينى، دا كو نان و خوى د نافيەرا مە دە چيىبە، و دلى مە ل ھەڤدوو ڤەبە». رۆقى پيىدە چوو گۆت: «بلا جارا پيشى دۆرا من بە». قولنگ گۆت: «بەلى، وەكە تو زانى». رۆقى گەور، دەم و جە دەستيشان كر. قولنگ چوو سەر فراڤينى. ديت كو رۆقى پەلوولەكە روھن چيكرى، و ل سەر تەحتى بەلاڤ كرى. قولنگى رەبەن چەندى نكلى خوە ليدا، ليدا، لى تشتەك نەكەتە ناڤ نكلى وى. قولنگ سەرى خوە ھەژاند، چيرۆك ناسكر و برچى ڤەگەرەھا مالى. تەڤى وى ژى سپاسيا رۆقى كر، و ژى رە گۆت: «سەھى تول با مى». پەلوولا رۆقى ھەمى ژى رە ما. ب كەيف ھەموو ئاليست و سميلىن خوە ژى تاليست و پاڤز دكر. سەرى خوە ژى پى رە دەھژاند و دگۆت: «دا تو بزاني كەس ب من نكارە!».

رۆژا دى نيرۆ، رۆقى چوو سەر ئەزىما قولنگ. ديت كو قولنگ ھەك نۆك و گارس كەلاندنە، ئەو ل ناڤ ڤەلشين تەحت و لاتان بەلاڤ كرنە. ژ رۆقى رە گۆت: «كەرەمكە سەر فراڤينى». رۆقى چەندى ھەول دا، لى نكارىبوو لىبەكى تەنى ژى بخوە. قولنگ ژى ل بەر چافى رۆقى ب وى نكلى خوە پى دريژ نۆك

و گارسیٰ خوه لبؤ لبؤ دهرانی و خوار. جاره که دی ههر یه کی پشته خوه دا
یی دی و ههر یه ک ب ئالیکه ده چوو. ژ له ورا ههر کو ددؤ ب هه فوره نه
راست بن، دبیزن هه فالتیا قولنگ و رو فیه!

ژنتى

دوو برا ھەبوون. ھەردوو کا ب ھەڤ رە ژن ئانين. ژنيان وان ژى ب ھەڤ رە ب دوو جانان بوون. ھەردوو برا سۆز دانە ھەڤ و گۆتن: «ھەگەر زارۆکیڭ مە، يەك كەچ بە و يەك كور بە، ئەمى وان بدن ھەڤ، ئانگور؛ ل ھەڤ مەھر كن». خوھدى و ھاچىكر كو ھەردوو برا د بوويەرەكى دە مرن، بەريا كو زارۆکیڭ خوھه بېين. پشتى وان ھەردوو ژنتيان ژى پەيمان دانە ھەڤ كول سەر سۆزا مېرى خوھه بېين. پشتى چەند مەھا، ھەردوو کا بارى خوھه دانين. يەك كور بوو و يەك كەچ بوو. ھەردوو ژنتيا ژى ب كول، ب خەم، و ب كەسەر زارۆکیڭ خوھه خوھدى كرن. ھەر چەندەكى سۆزا رەھەتيان نوھ دكرن، ھەتا ئەمى زارۆكان بوو چارەدە سال. كەچك پر خوھەشك و گرس خويا دكر. كورك ھين كچك خويا دكر. وەكە كو دېيژن: «كەچك زوو مەزن دبن، و كورك ھىدى ھىدى مەزن دبن». خوازگينيي كەچكى دچوون و دەھاتن. ھەرۆژ پيانەك شۆراڤ دكەتە دلى ديا كورك. ژ ديا كەچكى رە دگۆت: «چاوا تو دەھىلى خوازگينيي كەچا تە بېن؟ قەى تە پەيمان د ناڤەرا باقين زارۆكان دە ژبىر كرىه؟». ھەتا جارەكى خوازگينيەكى مالدار ئاقللى ديا كەچى ژرى بر و ژنكى كەچا خوھه دايى. ديا كورك گرى، كەنى.. فيدە نەكر. ھەردوو ژنتى بوونە دژمني ھەڤ. ديا كەچكى -ل بەر چافى ديا كورك- دا، ب شيرانى، خەلات و رەھەل. پشتى دەمەكە كورت، ب لەز و بەز داوھتا وى چىكر. زىر

و زېږ ب که چي و ديا وي ده دبارين. ديا که چي دخو ه ست ديا کورک
بقه هدرينه، دهر دکه ت ده قي دهری، ب دهنگي بلند دسترا و دگوت، دهنگ
دبر ديا کورک:.

هافينه نهخت فهدبره

مه جیدیا گرہ گرہ

خو ه لی ل سه ری دی و کوره.

دیا کورک هیسرین خو ه دباراندن و بی دهنگ کورپی خو ه خو ه دی دکر.
سال چوون، سال هاتن. کورک مه زن بوو. ره و سمیلان روی وی تزی کر. دهه
پاییز بوو. زیر و مه جیدین دیا که چي ژي نه مان. دیا کورک جو ه تهک گا ژ
کورپی خو ه ره کری. نیر و هاله تی باقی وی ژي دهر خست. کورک نیر و
هاله ت دانی سه ر ملی خو ه، و جو تی گا ژي دانه پیشیا خو ه. به ری خو ه دا
نهر دی باقی خو ه، دا کو باژونی. فی جاری دایکا کورک چوو ده قي دهری و
ب دهنگي بلند، دا کو دهنگي وی هره دیا که چي، ب ستران وه ها گوت:

پاهیزه چاخنی جوتنه

نیری لاوکی من ژ که قوته

خو ه لی ل سه ری دی و دوتنه.

هەر تاشتێ دزی، دمره ژێ

مرۆڤهك چوو مالا جیرانی خوه، بهروشا وی ژێ خوهست. ژێ ره گۆت:
جیران! ب خیرا خوه بهروشا خوه بده من، دا کو ئەز خوارنی تی ده چیکم، ژ
بهه کو میقانین من هاتنه و بهروشا من کچکه تیرا وان ناکه.
جیرانی وی ژێ نهمهردی نه کر. یه کسهه بهزی چوو بهروش ئانی و دا
جیرانی خوه، د گهل چهند گۆتین خوهش.
میرک راهشته بهروشی بر و چوو. لی دهمهك دريژ پیقه چوو و میرک
بهروش فنه گهراند. خوهدی بهروشی چوو دهفی دهیری جیرانی خوه و ژێ ره
گۆت: جیران کا ب خیرا خوه بهروشا من بده من!
جیرانی وی ژێ ره گۆت: جیران! ئەز ل بهختی ته و خوهدیمه تو بهنا خوه
ل من فهرهه بکی. ب خوهدی بهروشا ته زایه و بهروشه که بچووک ئانیه. ههما
چهند رۆژان خوه ل من بگهه، ئەزی بهروشی ب چیلیکا وی فه ژ ته ره بینم.
خوهدی بهروشی کیف کر و گۆت: ده بلا جیران!
بهری خوه دا مالی و چوو. د دلی خوه ده دگۆت: ب خوهدی ئەفی بی
هش وی دو بهروشان بده من.
پشتی دهمهك که ته وی ناڤی، میرک دیسا چوو و گۆت: جیران، ژ که ره ما
خوه ره، کا ههردوو بهروشین من بده من.
میرک لی فه گهراند: ب خوهدی دفی دیسا تو بهنا خوه ل من فهرهه بکی، ژ

بهر کو بهرؤشا ته ديسا وهلدیه و بهرؤشه که کچک ئانیه. ههما پشتی دهمه که
 نه درئژ وهره هدرسی بهرؤشین خوه ببه و مالا ته ئافا.
 ديسا خوه دیی بهرؤشی ب کيف فه گهریا مالا خوه.
 وهها چقا چوو دخوهست، ژئی ره دگۆت: بهرؤشی زایه. ههتا بوونه دهه
 بهرؤش.
 رۆژه کی خوه دیی بهرؤشی ژیره گۆت: جیران کا ههر دهه بهرؤشین من
 بده من.
 جیرانی وی لی فه گهراند و گۆت: ئه ری ب خوه دیی، دهه بهرؤشین ته ل
 با من بوون، لی مخابن و سه د مخابن، ئه ز فی سبه هی ژ خهو رابووم من دی کو
 ههر دهه بهرؤش ب هه ژ ره مرنه.
 خوه دیی بهرؤشی خوه هلالی و ل ئه ردی دا: ئه ژ تو چ دییژی؟ تو دخوازی
 ههر دهه بهرؤشین من بدی مانده لی. زوو ههر دهه بهرؤشین من بینه. هه ی
 ناخوه ئه ز زانم ئه ز چ ژ ته بکم.
 ديسا میړک لی فه گهراند: ئه ز ژ ته ره دییژم بهرؤش هه موو مرن و فی سسی
 من ب دهستی خوه ئه و هه موو فه شارتن.
 خوه دیی بهرؤشی ژئی ره گۆت: زوو بینه ما تی حه نه کی خوه ل کی بکی؟
 کی دییته کو بهرؤش بمرن؟!
 جیرانی وی لی فه گهراند و گۆت: به لی ئه ز به نی، خه به را ته یه، لی تو نرانی
 ههر تشتا کو دزی، دمره ژی.

حسرهتا كانيا بهلهك

دييژن مروفهك چوو ئورؤيا. هين خورتتهكى بچووك بوو. لور خوهند و شوغولى و مەزن بوو. هنگى خورتتهكى تازە بوو، مروفهكى مالدار ئەو ھەمبىز كىر و كەچا خوه دايى. ئەو كىرە قەسرەكى و هنگى دقئ پەرە دانى. ژنا وى ژى پر ژى ھەز دكر. سال و دەم بى قە چوون، زارؤكىن وى چىپوون. بى كو لى بنەريا وى بگؤتا ئەڤ مەلكى زەمانى خوه يە، لى سەرانسەرى ژيانا وى، خەمگىنى د رەنگ و رووى وى رە خويا دكر. ژنا وى پىلزانى كو دەردەكى وى ھەيە. رۆژەكى ژنك بى رە روونشت و ژى پرسى: ئەز دزانم دەردەكى تە ھەيە، كا ژ من رە بىژە دەردى تە چيە؟ مېرك چقا خوه قىردە و رەد دا، لى ژنى ژى نە قەريا. ھەتا مېرك ژى رە گؤت: ب خوهدى راستە، دەردەكى من ھەيە. ئەز دترسم، ئەز ب وى دەردى بىرم و ئەو حسرهت ب من رە ھەرە گؤرى. ژنكى ژى رە گؤت: ئەز د بەختى تە دە مە تو ژ من رە بىژى، بەلكى ئەز چارەكى ژ دەردى تە رە بىنم. مېرك ژى رە گؤت: ئەز ب حسرهتا ديتنا كانيا بەلەكم. كانيا بەلەك، ئەو كانيا گوندى مە بوو. چقا تى بىرا من، ئەز ژ دەردى ديتنا وى دحەلم. ھەر ئەز مەزن دىم، زەحفىز مەيلا وى ل من ددە. رۆژ ب رۆژى، سەحەتا مېرك ب شوونندە قە گەريا. ھەتا ژنك ترسيا كو مېرى وى ژ قەھرا بمرە. ژ مېرك رە گؤت: خوه حازركە، ئەمى ھەرن وەلاتى تە، ژ بۆ كو تو ديسا كانيا بەلەك بىنى.

ميرك ب في گوتني ره شا بوو و بهششي. روح پي فته هات و ژي ره
گوت: كهنگي؟

ژنكي ژي ره گوت: نهز هه موو تشين لازم ناماده دكم. هه و دي روژه كي
ژنا وي ژي ره گوت: نه مي ئيرو ب ري كهفن، هه رن وولاتي ته. نهزي ژي ب
ته ره بيم نهزي دخوازم كانيا بهلهك ببنم. ژنكي تشين لازم، ژ مال، ژ جل
و خوارني ترميلا خوه داگرت و مي ري خوه ل تهنشتا خوه سوار كر و بهري
خوه دان وولاتي ميرك.

سي روژان ب ري فته مان. هه ر كو نيزيكي جي خوه دبوون رهنكي ميرك
گه شتر دبوو. ب چ هاوي، د ناڤا چراډ و توژ و هيري فته گهانه گوندي وي.
بهري خوه دان مالا نه هلي خورت. ژنك چ ببنه، ديت كو پيره كه ديا وي
خزان، پورسي، ژهه فكه تي، كو نيم دده مريشكين خوه. پيري چوو خوه نافيته
كورپي خوه. هه قدوو ماچ كر و هه مبيژ كر. ژنا ميرك ما شيپا. جههك پاقژ
نهديت كول سهر روونه، لي نه خه ما وي بوو. نه و ل هيڅيا ديتنا كانيا بهلهك
بوو، نهو كانيا كو هوقا سالان مي ري وي ل سهر دگري.

پشتي كروي و ديا خوه باش كي فخواه شي ل هه قدوو دان. ژنكي ژي ره
گوت: ده و هره بكه فته ترميلاي دا نه م هه رن سهر كانيا بهلهك.

ب نه شقهك نايي گوتن، ميرك بهري خوه دا كانيا بهلهك.

ده ما گهان سهر كانبي، ژنكي ديت كو كانبهك ب قاسي تفككي يه،
گولكهك بچووكه، ناههك هندك ژي دزي، ل بني داره كه يه كانه يه، چهند كه فر
ل دورا وينه، ميش و كه ليش تين ژي فته دخون. ميرك دهستي خوه كر ناڤوي
ناڤا شيلو ده، ژي فته خوار، ده ست و رووي خوه بي شووشت، بهري خوه ب

ناسيمان څه کړ و سپاسيا خوه دى کړ، کو جاره که دى کانیا بهلهک دیت، و ژ
که یفا سهره خوه دانی سهر که څره کی ژ یی کانیا بهلهک و د خدو څه چوو.
دهما باش خدو لی گران بوو. ژنکی نهو هشته سهر کانیا بهلهک و که ته ترمبیا
خوه و بهری خوه دا وهلاتی خوه. نامهک ژى ره نقیسی، تیده دانی:
ل پدی من نهوه. تو تنی ژ کانیا بهلهک ره باشی.

بههرا من ژى ژ عهلو ره

ديټژن زلامهك ههبوو ب ژنا خوه نهرازي بوو، ههر و ههر گازن ژى
دكرن، دگوت: ژنين دنيايى ههمى ژ ته زاناترن. ئهز مروفهكى بى شهنسم.
دڤى ئهز جاره كه دى شهنسى خوه بجهريينم، نانگو ژنه كه دى ژ خوه ره بينم.
ههتا گها رادهيهكى ههو كاريبوو ل ژنا خوه بنه ره. ههما دا خوه رابوو و ژ
مالى دهر كهت. بهرى خوه دا چول و بهياران. گوندى پيشى هاته راستا وى،
گو ب خوه دى نه زى ل فى گوندى بيم ميغان، بهلكى ئهز ژنه كى ژ خوه ره ل
فر بينم. ده ما كه ته ناڤا گوند، دهرى پيشى هاته راستا وى لى دا. خوه دى مى
دهرى ژى ره فه كر و گهله كى قه درى وى گرت، ئهو دانين سهرى مالى، و
مالى ههمى ل دوى جفيان. ميرك ژ وان ره گوت: ناڤى من عهلو يه و ئهز ل
ژنه كى دگهرم.

ديت كو كه چه كه وى مى پر خوه شك ههيه. عهلو چافى خوه بهر دا
كه چى. ههما يه كسه ر ژ باڤى وى خوه ست. باڤى وى ژى - بى دودلى -
گوت: من كه چا خوه دا ته.

بوو چاخى فراقينى. فراقين دانينه ئهردى. كوفلهت ههمى هاتن ل دورا
فراقينى روونشتن. كه چكا هاتيه خوه ستن خوه دا ئاليكى، گوت: بههرا من ژ
عهلو ره. دى ژى خوه دا ئاليكى، گوت: بههرا من ژ عهلو ره. باڤى ژى خوه
دا ئاليكى، گوت: بههرا من ژ عهلو ره. خوه و برا ژى خوه دان ئاليكى،

گۆت: بههرا مه ژ عهلو ره.

پشتی کو عهلو تیر خوار و خوه دا ئالیکى، دهرگستیا عهلو راهشته
جهرى خوه و چوو سهر بیرى، دا ئاڤا جهمدى ژ دهرگستى خوه ره بینه، لى
كهچك پر دۆمكر و فهنه گهريا. دایكا وى ل پهى چوو دا بنهره كا چ بوویه؟
دیت کو كهچا وى ل سهر كهڤیا بیرى روونشتیه و دگرى. ژى پرسى: كهچا
من خیره؟ چ ههیه؟ گۆت: یادى، نهز هاتم دا نهز ئافى ژ بیرى بكشینم، من
دیت کو کولیلکهك د كهڤیا بیرى ده شینهاتیه، ژ ئالىی هوندر فه. ب خوهدى
نهز پر ترسهامه، دهما نهز شوو بكم، وى كورهك ژ من ره چیبى، و نهزى بيمه
مالباڤا، وى كورى من ب من ره بى سهر بیرى، و فى كولیلکى بینه، خوه
بنهوينه و دهستى خوه باڤیره فى كولیلکى و د بیرى وهربه. دى ژى ره گۆت:
ب خوهدى كهچا من، ههقى ته ههیه. دى ژى ل تنشتى روونشت و گريا.
دهما کو دى و كهچ فهنه گهريان، باڤ ژى ب دوو وان ده چوو. دهما کو
چيروك ژ باڤى ره گۆت، گۆت: ب خوهدى ههقى وه ههیه. و نهو ژى ل
تنشت وان روونشت و گرى.

دهما نهو نههاتن، خوه و برا ژى تهڤ ب دوو وان ده چوون. دهما چيروك
بهیستن، نهو ژى ل كیلکهك وان روونشتن و گرین.

عهلو ب تهك و تهنى ل مالى ما. گهلهكى چافى وى ل رى ما، ههچى چوو
فهنه گهرا. ژ خوه ره گۆت: ب خوهدى تشتهكى گهلهكى مهزن بوویه. دا
خوه رابوو، بهرى خوه دا بیرى. چوو، چ بینه!! کو وان خوهديين مالى ههمى
ب ریزل دؤرا دهڤى بیرى روونشتینه، ب ههڤ ره و ب دهنگى بلند دگرین.
دهما ژ وان پرسى: كا هوون چما دگرین. ژى ره گۆت: حال و قسهت نهڤه.

پورا سەرى ئەلۇ ژ ئەجىبا شىپا سەكى. ھەما ھىدىكا و بى كويەك گۆتى
بېژە، ب شوون خوە دە فەگەريا. بەرى خوە دا مالا خوە، و ژن و زارۆكىن
خوە. ژ خوە رە دگۆت: ھەى گدى، ئەۋ تشىن ولۆ ژى ل دىيائى ھەنە! ئەۋ
گوندى پىشى بوو كو من ئەۋ ئەجىب لى دىت، گەلۆ ئەز وردەتر بچوووما منى
چ بدىتا!؟

مرۆڤل چ بگهره دى ۋى بېينه

دېژن مرۆڤهك گوندى چوو بهغدايى. دهما فهگهريا، گوندى ههمى چوون سهردانا ۋى. ژى پرسين: كا ته چ ل بهغدايى ديت؟ ميرك دهست پى كر و گۆت: خوهدى بهغدايى خرا بكه. ههمى بوويه جهى فسق و فسادى. تو چاوا دلەبتي تو راستى خرابيى تى. ههما تشتى من ديت خوهدى نهكه هرون بېين. پشتى چەند رۆژان، مرۆڤهكى دى چوو بهغدايى. ديسا گوندى ههمى چوون جقاتا ۋى، دا كو ژوان ره بههسا بهغدايى بكه. ميرك دهستپىكر و گۆت: خوهدا تو بهغدا ئافا بكى و ئافا بهيلى! كو مرۆڤ پىل ئاخا بهغدايى دكه، مرۆڤ دچه دنياكه دى. ههمى خير و بهرهكهته. جهى ميژ و عيادهتى به. ههر ئهنيشكهكى مزگهفتهك لى به. تو خزان و مالداران ژ ههڤ ناس ناكى. خوهدى ديتنا بهغدايى بكه بههرا وه ههميان، وهكه كو من ديتى.

مرۆڤهك د جقاتا يهكى و ديا دودوا ده ژى روونشتى بوو و ههر گوهدارى دكر. ههما ژنشكا فه دا خوه رابوو شپيا و گۆت: يابۆ بهخدا ههر ئهوه بهخدايه، لى ب خوهدى خويابه كو مرۆڤل چ بگهره دى ۋى بېينه.

هه‌یقا مه

جاره‌کی ژنه‌ک چوو سه‌ر بیرى دا ئافى بینه. سه‌رى خوه داقوول کر و ده‌ولا خوه به‌ردا بیرى، به‌رى ده‌ولا وى بگه‌ی بنى بیرى، ل ئافا بیرى نه‌رى دیت کو هه‌یف د بیرى ده‌خویایه. ژنک پر ل به‌ر خوه که‌ت چاوا هه‌یقا مه که‌تیه بیرى. دقئ نه‌ز وى ژ بیرى ده‌رخم. به‌ترى بیست جاران ده‌ولا خوه داده‌لاند بیرى و دکشانده، ئافا وى درژاند. لى دیسا ده‌ما ل بنى بیرى دنه‌رى ددیت کو هه‌یف هین تی‌ده‌یه.

پشتى قى یه‌کى، دیسا ده‌ولا خوه داده‌لاند بنى بیرى، و کشاند، لى هلنه‌کشیا؛ خویایه ل که‌له‌مه‌کى ئالهابوو. ژنکى ب هه‌می هیزا خوه وه‌ریس دکشانده و دکشانده هه‌تا کو ده‌ول ب له‌ز ب ده‌ستى وى قه‌هات و هلکشیا. ژنک ب پشتى قه‌که‌ت و گورمینی ژى هات. ل سه‌ر پشتى، چافى وى ل ئاسیمان له‌یه‌یفى که‌ت، دیت کو وال ژوره. ژنک -ته‌قلی ره‌هتیا خوه- پر شا بوو، و سپاسیا خوه‌دى کر و گوت: من هه‌یقا خوه ژ بنى بیرى ده‌رخست، و وا چوو جه‌ی خوه.

گۆلك

مرۆفەك ب رۆنكى چوو گوندەكى، ل ماله كى بوو مېقان. وى شەقى ل ور
ما، سەرى سېهە، بەريا كو خاتر ژ خوهدىي مالى بخوازه، كه چا خوهدىي مالى
كه ته هوندر و ژ باقى خوه ره گۆت: چيله كا مه كه تيه بهر زانى.
خوهدىي مالى ل كه چكى فەگەراند: بلا بابۆ! و گۆت: سۆز به، هه گەر كو
گۆلكا چيله كا مه مى به، دى وى بكم دياريا مېقانى خوه يى عەزىز.
مېقان بەششى و ئەف گۆتن نەكر تشتهك. خاتر ژ خوهدىي مالى خوهست و
چوو سەر ئوخرا خوه.

پشتى دەمه كه درېژ، هه و ديت كو جاره كى ل دەريى وى كهت. چوو
دەرى فەكه، چ ببينه!! ديت كو گارانەك دەوار ل پشت دەريى وى يه. ژ
گافان پرسى: ئەف چيه؟

گافان ژى ره گۆت: ما تو نه فلانكهسى؟ گۆت: بەلى.

- تو فلان سالى، ل فلان گوندى، ل فلان مالى نەبووى مېقان؟

- بەلى.

- دەما چيله كا وى كه ته بهر زانى، خوهدىي چيله كى نه گۆت: "هه گەر
گۆلكا وى مى به، ئەوى دياريا ته بى؟". ئەو گۆلك مى بوو، و ئەف گاران
هەمى ژ وى گۆلكى زنده بوويه. ئانگۆ ئەف گاران هەمى يا تهيه.

شاه

بهلى، جاره كى مروفه كى گوندى چوو باژير، دا كو كهلوومهلان ژ خوه
ره بينه. ديت كو خه لكين وي باژارى، ب هوور و گرافه، همى ل
مهيدانه كى ل ههڤ جقيانه. نهو ژى چوو خوه دا پشت وان و سه كنى. ههو ديت
كو تهيره كى سېى هات.. هات، ل سهر سهرى وي دانى. ميرك ههو ديت
پوليس هاویردورى وي گرتن. ملهت همى ب ههڤ ره ئيريشى وي كر.
ميركى پهپوك ماتمايى ما و ب سووندا كهت، گوت: من تشتهك نه كربه!
ژى ره گوتن: نه م دزانن ته تشتهك نه كربه. عاده تا وهلاتى مه نهڤه، ههر
سى سالان نه م فى تهيرى هلتاڤيژن، كو ههره ل سهر سهرى كى دهينه، نه م وي
ژ خوه ره دكن شاه.

ميرك گوت: ديمهك، نها نه ز شاهی وه مه؟
هميان ب ههڤره گوتن: بهلى، بهلى. تو شاهی مه يى.
ميرك دهڤ خوه لل كرن و نهو برن حه مامى، سهرى وي شووشتن، رها وي
كورت كرن، دهستهك جلى قرالى لى كرن و بهرى وي دان قه سري، دا كو
وى دهين سهر تهختى شاهنشاهی.
ميرك ب رى ده ديت كو زلامهك پيشوپاش ل كه ره كى سوار كرنه و د ناڤا
كولانان ره دبن و تينن. ههچى تى راستا وي، هنهك ناڤ و خوه لى دره شينه.
ميرك ماتمايى ما. گوت: خوه ديكى، پرس بى نهين، نهڤى مروفى چ كربه، كو

ملەت وەھا لی دکه؟

ژی ره گۆتن: ئەف قراالی مه یی بەریا ته بوو. ئیرو ژی ژ قراالی که تیه. دقئی
ههچی مروفئی کو نه حهقی لی هاتبه، ب فی رهنگی تولا خوه ژئی هلینه.
میرکی ره بهن ژ خوه ره باش پۆنژی. ژ یین دهر دؤرا خوه ره گۆت: ئەز
هیقی و سه د هیقی ژ وه دکم، هوون سی رۆژان دهستورا من بدن، دا کو ئەز
ههرم گوند دا کو ژ ژن و زاروکیڤ خوه ره بیژم چ ب من ره چیبوویه.
ژی ره گۆتن: ده ههره، سی رۆژ موهلەت ب ته ره.
میرک گۆت: لنگنۆ من هلین!
میرک چوو و چوو و چوو.. چوونه که بی فه گهر. ژ خوه ره گۆت: ب
خوه دی، من ئەو شاهنشاهی نافیی کو داویا وی ناڤ و ههری به.

خيارى تەحل

دېيىڭ، ھەبۇو خۆرتەك ژ كەچەكى ھەزىكر، ئەو خوەست و ژ خوە ره ئانى. چقا ئىقار، وى ھەزىكرنا خوە ژ ژنا خوە ره ددا خويانى، و چقا ئىقار دەما ژ كارى خوە دەھات، رەنگە رەنگىن ئىمىشان ژ وى ره تانىن، نەمازە خیار؛ خیارىن كو ژ ژنا خوە ره تانىن پر نازك بوون، ھى كولىلكىن وان ب وان قە بوون. ديا وى ژى ب وان ره دژى.

ھەر كو مىرك خیار تانىن مالى، ژنا وى رادھشت چەند لب خیار دا بىه ژ خەسوا خوە ره، مىرك دگۆت: نا، نا. نەبە. من بەھرا وى برىه ئۇدا وى. چەند مەھ د سەر زەواج و ان كەت. رۆژەكى خەسوا وى نەخوەش كەت، بووك چوو ئۇدا وى پىرى دا دۆرا وى بدە ھەڤ. دىت كو د كۆلەكەكى دە كۆمەك خیارىن خەرابە ھەنە، و بىھن ب وان كەتیه. ژ خەسوا خوە پرسى: ئەڤ چ خیارىن خەرابەنە؟ خەسوا وى ژى ره گۆت: كەچا من، ھەما دەڤ ژى بەردە.

كو و نەكر بووكى بەلا خوە ڤەنەكر، و گۆت: دڤى تو چىرۆكا ڤان خیاران ژ من ره بىژى. خەسوو نەچار بوو و ژ بووكى ره گۆت: ئەڤ خیارىن ھان، ئەوین كو ھەر شەڤ كورى من ژ من ره تىنە و داتىنە بەر سەرى من، لى مخابن دەما ئەز دىخ دەڤى خوە ئەز دىنم كو تەحلن، وەك زراڤ، ئەز نكارم بخوم، و وان تافىژم وى كۆلەكى.

بووكا ژنكى، دەما ئەڤ تىشت بھىست، د جھى خوە دە سار بوو و ماتمايى

ما. ب ههزارين ههزاران راماڻ د ناڤا مهڙي وي ده چوون و هاتن. و د وي
کيلکي ده بريار د ناڤهرا خوه و دهرووني خوه ده ستاند، گوت: دقي زوو نه
دهرنگ نه ز څي کهسي هان خهلاس بم.

نيقاري، وهکو هه شهڅ، ميړي وي څ کاري خوه څه گهريا، شيفه خوه خوار
و روونشت. څنک ل هه مبهري وي روونشت، بي شهر و قرين، څي ره گوت:
فلانکس، نه ز ته هيقي دکم کو تو من بهردی.

ميړک څ بهر څي گوتنا وي وه که دينا لي هات، څ څنا خوه ره گوت: چما؟
قهی من چ کريه، من چ گونه کريه؟ نه ز پر څ ته هه ز دکم. نه ز ته ب دنيایي
هه می نادم.

لي، څنک څ دوزا خوه څه نه گهريا و گوت: بفي نه څي تي من بهردی. باش
بوو کو من ئيرو ته نه شهکه ره کر نه سبه. چاوا تو خياري ته حل څ پيرا ديا خوه
ره دبی و تو يي نازک ددی من. هه گهر سبه زاروکين من څ ته چيبيوونا.. تو
ئيرو چ ب ديا خوه دکي، وي سبه زاروکين ته څي ولول من بکن. چقاسي
ميړک خوه ناڅيته دهست و لنکي وي و څي ره گوت: ل من بيووره، نه ز
جاره که دن نه ما وها دکم.

لي لافلاڅين ميړک جهي خوه د دلي څنکي ده نه دی. څنکي ب څينه که
خورت خوه څي بهردا و چوو مالا باقي خوه.

پشتي سال و ده مين دريژ دهرباسبون، څنک ل مهينه کي سوار بوو.
کوره کي وي ب سهری هه څساري مهينا وي گرتيه و دو سي کورين وي يين
دن څي دابوون دوزا وي و ب ريکي څه دچوو. څنکي ديت کو کالهک څ ور
څه تي، گوپالهک د دهستي وي ده يه و تووري پارسي ل ملي وي يه.

ژنكى باش لى نەرى، ئەو ناسكر. زانى كو ئەڭ مېرى وى بى پېشى يە. ژ
كورپن خوه ره گوت: هيدى ل فر بسەكن! ژنك ژ مھينا خوه پەيار بوو ھاتە
خواری. ژ كالىۆ پرسى: تە ئەز ناسكرم؟

كالىۆ ب كوور و دوور لى نەرى، ئەو ناس نەكر. ژنكى دەست پى كر و
گوت: تە ئەز ناس نەكرم، لى من تو ناسكرى. ئەز ئەو پىرەكم؛ ئەوا كو دەڤ ژ
تە بەردا، ژ بەر كو تە خیارپن تەحل ددان ديا خوه، و يپن شپرين و نازك ژ من
ره تانين. پشتى تە من شوو ب مرۆڤەك ژ خوه دپترس كر، و ھەفت زارۆكپن
من ئپن باش ژ وى ھەنە.

ژ كالىۆ پرسى: كا ئيجا تو ژى ھنەكى بەحسا خوه ژ من ره بكە!
كالىۆ لى ڤەگەراند و گوت: تو ژيانا من دپينى، ب كورتى، من ژى د پەى
تە ره ژنەكە دن ئانى، و برەك زارۆكپن مە ژى چىپوون، لى مخابن، دەما كو
بكپر خوه ھاتن، ھەميان دەڤ ژ من بەردان. ڤا ئېرۆ توورى پارسى ل ملې منە.

عملو! تهتو بده بابو

زلامهك ههبوو پر خزان بوو.. تم و تم ل بهر دهستی خهلكی كار دكر. جاره کی چهند قورووش كهتن دهستی وی، چوو ژ گوندیان پرسی؛ ژ وان ره گوت: "چهند قورووشی من ههنه، نهز دخوازم ژ خوه ره كاره کی پی بكم. گهلو نهز چ بكم وی باش به؟"

یه کی ژ گوندیان ژی ره گوت: "نهز بم، تی کرین و فروتنا جهران ژ خوه ره بکی. كاره کی پر باشه."

گوتنا میرك كهته سه ری وی. چهند قورووشی خوه كرن کویركا خوه و به ری خوه دا باژیر. چوو ههتا گها جهی جهره. جهر پر بوون؛ هن بچووك بوون، هن مهزن بوون... چافی خوه ل وان گهراند؛ ل شهربك و جهر و كوژیان. چافی خوه بهردا كوژیه کی، ژ خوه دی بازار كر، ل ههژ كرن و كوژی ژ خوه ره کری. حدیری ما وی چاوا كوژیی خوه بگهینه گوند! چوو كاپكهك (قهتهك وهریس) نانی، د چه میلی كوژی ره كر و دا پشتا خوه، و به ری خوه دا گوند. قهدهره کی ب ری قه چوو، پر وهسته ها، ل بن سها داره کی، پالا خوه دا كه فره کی و ژ خوه ره گوت: "نهزی ههنه کی بهنا خوه قه كم و دیسا ب ری كه قم."

لی، پستی کو روونشت و بایی هینك ل بن سیا دارى لیخست، نهو هینك بوو، و پالا كوژیی خوه ژى دا لاته کی و ههردوو ئالیین كاپك ژى د دهستی

کوفی دهنه و سهری د دهستی وی دهنه.

پشتی هه کی ره حهت بو، بیهنا خوه فه کر، که ته ناؤ خهون و خه یالان.
ب خوه ره شته غلی و گوت: "ئه زی فی کوفی بسم گوند بفروشم. چار
قورووشین من وی بن ههشت، ئه زی فه گهرم دو کوفین دن پی بکرم و ئه زی
بفروشم، فی جاری وی بن شازدهه قورووش، و ئه زی ب فی رهنگی بکرم و
بفروشم تا کو حالی من خوهش بیه و ئه زی زی بسم یهک ژ مالداران.. وه که کو
ئیرۆ ئه ز ل جهم خه لکی کار دکم، وی خه لک زی ل جهم من کار بکن. گهلۆ
دهما حالی من خوهش بیه، ئه زی پیشی چ بکم؟! دفی ئه ز ژنه کی ژ خوه ره
بینم، ئه ز ههرم که چا کی وی له فه کار بن، و پشتی من ژن ئانی وی زارۆک ژ
من ره چیبین. زارۆکا پیشی ژ من ره چیبیه وی کور به. گهلۆ ئه ز نافی وی
بکم چ؟ ئه زی نافی وی بکم عهلۆ، سهر نافی بافی خوه. دهما ئه مرئ عهلۆ بیه
سالهک وی ته نی ته نی بسه کنه، وی رابه، و وی بکه شه، ئه زی باکمی
ئهلۆ! ته تۆ بده بابۆ."

ب فی گوتنی ره، د خه یالی خوه ده، عهلۆ ل پیشیا خوه دیت، کو رادیه و
دکه فه. ههردوو دهستین خوه ژ کاپک بهردان و ب له ز خوه ئاقتیه عهلۆ و
گوت: عهلۆ! ته تۆ بده بابۆ.

دهما خوه ئاقتیه عهلۆ، ههردوو دهستین خوه ژ کاپک بهردان کوفی ژ
پشت وی فه وه رگه ره ها، ل ئه ردی کهت و شکه ست. ب گورمینیا کوفی ره
میرک ل خوه های بو، دیت کو هه ر تشتین د خهون و خه یالین وی ده ته قده
ب جاره کی ژ ده ست وی چوون، و چ سه میانی وی هه بوو پی ره چوو. دیسا
ب خه مگینی و ب دله کی شکهستی دا سهر ری و به ری خوه دا گوند.

دەما گھا گوند، خەلك ھاتن دۆرى، ۋى چىرۆكا خۈە ژ وان رە گۆت، و
ژ ۋى چاخى دە گۆتتا (عەلۆ! تەتۆ بدە بابۆ) بوو مەسەلۆك كەتە ناۋ گوندىان
و بەلاۋ بوو.

خهون

زلامه کی نأفسەر هه بوو، دیندار بوو، گه لهك باش بوو و ژ خوه دی ب ترس بوو. خه لکین گوند ته ژ ژای رازی بوون. دهم بوو چاخی چوونا هه جی و خه لکی کارا خوه کرن دا کو هه رن هه جی، دلی وی ژای پر د چوونا هه جی ده هه بوو، رابوو کوفله تی خوه کوم کر، ئزنا وان ستاند، ژ وان ره گوت: "ئه ز دخوازم هه رم هه جی، کا هوون چ دیژن؟".

ژنا وی ته فی زاروکان گوتن: "دفی تو هه ری هه جی". ئه وی ژای ده ما دیت کو ب دلی هه میانه، که یفا وی زه حفتر هات، و رابوو کارا چوونی کر. پستی کو هه ر تشتی خوه پیکانی، و هندك ما کو ب ری که شه هه ره هه جی، شه فه کی د خه ونا خوه ده دیت کو چقا ئه و دچه بهر که فیری ره ش (که عبی) کو وی ماچکه، دینه کو بووکا وی ری نادى، بهری وی ده فی خوه دخی و ماچ دکه.

میرك ب فه جنقاندن ژ خه و رابوو. تف کره شه ییتن. هه کی پونژی، د خه ونا خوه ده رامیا، لی داوی، ژ خه و ره گوت: "خه و ن نه تشتکی هیژانه کو مرؤف بی بگره".

لی ده ما میرك شه فا دن ژای رازا، دیسا ئه و خه و ن ب خوه دیت. سی چار شه فان ل په ی هه ژ، چقا رادزا ددیت کو بووکا وی بهری وی ل هه جی، ل بهر که عبی یه.

ميرك نهما دهبار كر، بانگ ژنا خوه كر و خهونا خوه ژى ره گوت، و لي
 زيده كر: گهلو چما هدر شهف نهز في خهوني دببم!؟
 ژنكي ژى ره گوت: ب خوهدي نهز تشته كي ژ خهونا ته نزام.
 پشتره كوفله تي مالا خوه جفاند و خهونا خوه ژ وان ره گوت. هدر يه كي
 ژ وان ب رهنگه كي بدرسفدك دا. لي نهف هدمي ژي نه كهتن سهرى وي.
 رابو ب دزي ژ بووكا خوه پرسى: كا ژ من ره ب راستى بيژه، ته چ
 قهنجي كريه تا كو نهز ته ل پيشيا خوه ل هجي دببم!؟
 بووكا وي گوت: ناپو! ب خوهدي، نهزي ب راستى ژ ته ره بيژم. من ت
 قهنجي نه كرنه، لي من خرابيهك مهن كريه، نهز هيقي دكم كو خوهدي ل من
 ببوره.

خهزورر گوت: كهچي بيژه. ته چ كريه بيژه.
 رابو بووكي ژ دهسپيكي ده ژى ره گوت:
 بهري دهه روظان، مه بهرخهك گورانده. مه هورر كر و مه گوشتى وي
 خسته تهشتان و مه دانى نافا هوشى. خهسوا من ل بهر تهشتا گوشت
 روونشتييو، هه و من ديت كو جيرانا مه يا ب دو جانان هات، كهته هوشى
 و گوت: نهز هاتمه ناگر بيم، ژ بهر كو ناگرى مه فمريه. نهز چووم من بيړكا
 وي تزي ناگر كر و من دا دهستى وي و چوو. لي دهما چوو چافى من لي
 كهت، من ديت كو چاوال تهشتا گوشت دنه ره و دبهوره. گها مالى، نه گها
 ديسا فه گهريا و گوت: ب خوهدي نهو ناگرى وه دا من ب رى ده فمري و
 نه گها مال. ديسا نه چوون مه ناگر ژى ره ناني، مه دايى و چوو.
 ب في رهنكي، سى چار جاران هات و چوو، و بالا من لي بوو، هدر جار

ژی ب حەسرەت ل تەشتا گۆشت دنەری، من بالا خوە دایی کو دلۆفانی ب
خەسوا من رە چینه‌بوو، کو راهژە ھەنەك گۆشت و بدە فی پیرەكا ب دو جانان
(ب بەر).

مە گۆشت كەلاند و مە دانی بەر كوفلەت. ھەمیان ژێ خوار، لی من كر
و نەكر رەوشا وی پیرەكی ژ بەر چافی من نە دچوو، ژ ترسا خەسوا خوە ژێ
من نەدویری ئەز راهیژم ھەنەك گۆشت ژێ رە بیم. ئەز مام ھەتا كو تارى كەتە
ئەردی، من راهشت ھەنەك گۆشت ب دزی ل ناڤ داوا كراسی خوە پیچا، و ب
لەز و بەز من بر دا وی پیرەكی و ئەز ھاتم. لی تو خوەش باوەر بی، ب
فەگەری، ژ ترسا خوەدی ئەز دلەرزیم و من دگۆت "یا خوەدا! ل سەر فی
دزی ل من نەگرە. ب خوەدی ئەفە تشت من کریه".

دەما چیرۆك خەلاس بوو ل چافی خەزووری خوە نەری دیت كو ھیسر د
چاڤین وی دە دلیرن. ژێ رە گۆت:

كەچا من! ئەڤ كاری كو تە کریی، ئەز پیروژ دكم، و تی بەری من ھەری
حەجی، ژ بەر كو حەج لایقی یین وەكە تەبە.

بهخت

دييژن: زلامهك ههبوو، ههه و ههه پهریشان و خزان بوو، تم رینجبههري
خهلهکي بوو، کارى وى تم ب نان و زکى بوو، پرايا تهمهنى وى بوورى هين
بى ژن، مال و زارو بوو. ب روژ ل بهر پهز و دهواران بوو، و ب شهؤل بن
ئوليا دهواران رادزا.

روژه کى، گهلهك ژانا وى ژيانا وى يا تهحل و دژوار دا دلى وى. ژ خوه
ره گۆت: "ئهز نهما کارم فى ژيانا کامباخ ب ديلى دهرياس بكم". ل بهر
ديواره کى روونشت و پۆر- پۆرا رهوشا خوه دکر. زلامهك راستا وى هات و ل
بهر راوهستيا.. ژى پرسى: "چما تو پۆر- پۆرا حالى خوه دکى؟". ميرکى
پهریشان رهوشا ژيانا خوه ژى ره گۆت و گهلهك گازن ژ بهختى خوه کر،
گۆت: "ئهز نزام، چما بهختى ههه کەسى ب هانا وان تى ژ بلى بهختى من
پيڤه؟! قهى من چ کرپه ژى؟ قهى دلى وى ب من ناشهوته؟!".

ميرکى پهریشان ههه گازن ژ بهختى خوه دکر، و ميرکى گوهدار گۆتسا
وى برى و ژى ره گۆت: "چما تو ناچى و ل بهختى خوه ناگهري، و رهوشا
خوه ژى ره نابيژى؟".

ميرکى خزان ژى پرسى: "گهلۆ قهى تو زانى جهى بهختى مروشان ل کى
دهري يه؟". ميرک لى فهگه راند و گۆت: "بهلى، دييژن ههه مروشهك بهختى وى
ههيه، و جهى کو بهخت لى دميين ل پشت چيايى قافه".

ميركى خزان پر ب فئ گوتنى شابوو، و نهمەردى نەكر، يەك و دودۆ،
 داخو و رابوو، دا سەر رى و بەرى خو و چيائى قاف. قەدەرەكى ب رى فە
 چوو، راستى كۆرەمارەكى هات. چەند گافان ژ مار دوور كەت، مار
 بانگكريبى: ها خورتۆ! تو ب كووفە دچى؟ ل مار فەگەراند و ژى رە گوت:
 ئەزى ھەرم نك بەختى خو، بەلكى چارەكى ژ رەوشا من رە ببينە!. مار ژى
 رە گوت: گەلو قەى تو زانى جھى بەختان ل كوويه؟ ميرك گوت: بەلى، ب
 سالوخذانا ديژن ل پشت چيائى قافە. مارى كۆر ژى رە گوت: خوهدىكى
 ھەگەر تە بەختى من ديت تو ژى رە ببىژى، ئەف چەند سالە نەخووشىك ل من
 پەيدا بوويه كەس نەببە! كەنك ل لاشى من دەر كەتتە، ژ بەر خور و شەواتى
 ب شەف و رۆژ ھەدارا من ژ بەر نايى، كا چارەكى ژ فە دەرديى من رە ناببە؟!
 ميرك گوت: سۆز بە ل من، كو ئەز بەختى تە ببينم، ئەزى داخووازا تە ژى رە
 ببىژم. خاتر ژ مار خوہست، و ربا خوہ گرت و چوو.

قووناغەكى ب رى فە چوو، راستى جۆتكارەكى هات. پشتى سلاڤ لى كر،
 و ببھنا خو و جەم فەكر، داخو و رابوو دا ھەرە، جۆتكار ژى پرسى: برا! تو
 ب كووفە دچى؟ ژى رە گوت: ئەزى ھەرم ل بەختى خو بگەرم، بەلكى
 چارەكى ژ رەوشا من ببينە!. جۆتكارى ژى ژى رە گوت: خوهدىكى، كو تە
 بەختى من ديت تى دەرديى من ژى ژى رە ببىژى؟
 ميرك پرسى: كا دەرديى تە چيە؟

جۆتكارى گوت: ئەف ئەردى كو تو دىبىنى ھەمى يى منە، ئەز خوہشك
 داژۆم و توفى خو گەلەكى سبەھى تافىژمى. دەما دبە بوھار، گەلەك تازە شين
 دبە؛ ژ ھەمى زادين دۆرا خو گۆمرەھتر (بتر) دبە. ئەز پر شا دېم و ھيقيين

مەزن ل سەر گریددم، لی مخابن، شاهیا من ناچه سەری. دەما گەنغی من زەر و سۆر دبه، نێزیککی کو ئەز بچنم، ژ نشکافه ئاگرهك یی دکەفە و هەمی دشهوتە. ئەز دکم نازم چما ولۆ تی سەری من.

پشتی کو میړك گوهداری دەردی جۆتکاری کر، سۆزدا وی ژی، کو بهختی وی ببینه و کولا وی ژی ژی ره بیژه. رابوو سەر خوه. خاتر خوهست و چوو.

پشتی دەمهکه باش ری و ریبار برین، راستی باژاره کی هات، لی بوو شهقرهش. ت دەر ناسنه دکر. چوو بهری خوه دا سەرایي و ل بهر دەرگههیی وی خوه درێژ کر، سەری خوه دانی سەر کهفره کی و د خه و ره چوو. سبههیی زوو، دەرگهفانی سەرایي دیتن کو وا زلامهك ل بهر دەرگههیی قەسری رازایه. دهست و نگین وی گریدان و ئەو برن نك مهلك. مهلك ژي پرسی، گۆت: تو چ کهسی؟ و تو ژ کووڤه تی؟ و تی ب کووڤه هه ره؟ ب راستی ژ من ره بیژه، ب سۆز ئەزی ته بهردم. میړك ژي ره گۆت: ئەز بهنی! فا تو ره وشا من دبینی. ئەز مروڤه کی پر خزانم، و ئەزی هه رم نك بهختی خوه، بهلکی چاره کی ژ من ره ببینه.

مهلك گۆت: قەدی تو دزانی کو بهختی مروڤان ل کیده رییه؟ گۆت: بهلی، ئەز دزانم.

دەما ولۆ گۆت، مهلك فەرمان دا یین دۆرا خوه گۆت: هەمی دەرکهفن! من و وی ب ته نی بهیلن.

د وی گافی ده هەمی دەرکهتن، ئەو ههردوو ب ته نی مان. مهلك ژي ره گۆت: ئەز د بهختی ته و خوه دی ده مه، دەردهك من ژي ههیه، کو تو چوویی

تی ل بهختی من بگه‌ری، کو ته نهو دیت، تی دهردی من ژئی ره بیژئی، کا چاره کی ژ من ره نابینه! میړک گوت: کهره مکه مه‌لکی من دهردی خوه ژ من ره بیژه! مه‌لک گوت: نه‌ز مه‌لکی فی بازاریمه. هه‌یی و نه‌یی هه‌می د دهستی من ده یه، لی دکم و ناکم، ترسا من ناکه‌فه دلی که‌سی. دهردی من ژئی نه‌فه، نه‌ز نزام چما!

میړک سۆز دا مه‌لک کو ههره نک بهختی وی و ژئی ره بیژه. مه‌لک ژئی ره گوت: ده ههره، خوه‌دی ب ته ره به.

میړک ریا خوه گرت و چوو چیاپی قاف. ب پرس و پرسارا چوو و چوو تا گها پشت چیاپی قاف. دیت کو بهختی هه‌می که‌سان ل ورن. چوو ژ ناؤ بهختان پرسا بهختی خوه کر، تا نهو دیت. ل هه‌ف روونشتن. میړک پر گلی و گازنین خوه ژئی کرن، و گوت:

چما نه‌ققاس سال تو ب هانا من فه نه دهاتی؟ من سی چاریک ژ ته‌مه‌نی خوه ب دیلی و پهریشانی بووراند، قه‌ی دلی ته ب من نه‌دشه‌وتی؟!

بهختی وی لی فه‌گهراند و ژئی ره گوت: ل من بیووره، نه‌ز گه‌له‌کی د مافی ته ده شاش بووم، لی ژ ئیرو و پیغه وی ژیا‌نا ته خوه‌ش به.

میړک گوت: فا نه‌زی ههرم، کا ته چ کر دهستی من ده؟

بهختی وی ژئی ره گوت: هه‌ما ههره، رزقی ته ل پی‌شیا ته یه.

رابوو، خاتر ژ بهختی خوه‌ست و چوو ل بهختی مه‌لک گه‌رها، تا کو دیت.

ژئی ره گوت: تو بی بهختی فلان مه‌لکی؟ بهخت گوت: به‌لی.

میړک چیرۆکا مه‌لک هه‌می ژئی ره گوت. بهختی مه‌لک وه‌ها به‌رسف دا:

ههره ژ مه‌لک ره بیژه: ت جاری که‌سه‌ک ژئی ناترسه، ژ بهر کو نه‌و ژنه، و ت

چارا وی ل جهم من تونه.

میرک چوول بهختی جۆتکاری گهرها، تا ئهو دیت. چیرۆکا یی جۆتکاری ژئی ره گۆت. بهخت وهها بهرسف دا: تی ههره ژئی ره بیژه: خهزینه که زیو د بنی وی شکیری ده ههیه؛ ئهو شکیرا د نیقا زهفیا وی. دهما دبه تهمووز و تهباخ، دنیا گهلهک گهرم دبه، ژ گهرمی ئهو زیرین د بن ئهردی ده دسنجرن و ناگر ژئی دچه و ب گهنم دکهفه، دشهوتینه. بلا وی خهزینی ژ بنی وی شکیری دهرخه، هنگی نهما ناگر ب گهنم دکهفه.

میرک گۆت: هه ما ئهفه؟

گۆت: بهلی، ئهفه.

میرک رابوو سهر خوه و چوو. چوول بهختی مار گهریا، تا ئهو دیت و دهردی مار ژئی ره گۆت. بهختی مار وهها بهرسف دا: تی ههره ژئی ره بیژه: بلا ب مروفهکی ئهجهق فه بده وی ژ نهخوهشیا خوه ساخ به. گۆت: هه ما ئهفه؟! گۆت: بهلی ئهفه.

میرک رابوو سهر خوه، و ب دلهکی خوهش و ب هیقیین گهرم بهری خوه دا ریا فه گهری. پيشی گها نك مهلك.

مهلك ئهو دهرباسی دیوانا خوه كر. فهرمان دا، رهسپین خوه هه می دهرخستن. ههردوو ب تهنی مان. مهلك ب لهز پرسی: ته بهختی من دیت؟ گۆت: بهلی ئهزبهنی، من بهختی ته دیت.

مهلك ژئی ره گۆت: ب لهز بیژه. چ ژ ته ره گۆت.

گۆت: ژئی ره بیژه: تو ژنی، ژ بهر فی هاوی كهسهك ژ ته ناترسه.

مهلك خوه ئاقینه دهست و نگین وی و گۆت: تو فی یهکی ژ كهسی ره

نەبېژە. بەلى راستە ئەز ژىم. ژ بەر كو باقى من مەلك بوو، و كور ژى ره
چېنەبون، و ئەز كەچا وى يا يەكانە بووم، و دقابوو كو يەك ژ مالباتا مه
جھى وى بگره، ژ بەر قى يەكى، دى و باقى من ئەز خستم قى رهوشى ده.
وهره ئەزى ته ب دزى مەھر بكم، دا كو تو ئالیکاریا من د حوكمى قى
بازارى ده بكى.

ميرك گوت: ل من ببوره، ئەز نكارم.
مەلك ژى ره گوت: قەى تو قى رهوشا خوه يا كامباخ نابىي؟ چاوا من
قەبوول ناكى؟!
ژ مەلك ره گوت: ئەز دچم و بهختى من ل پيشيا منه. ما ئەزى چ بكم ژ
ته!؟

مەلك كر و نه كرت چاره ژى نه كر. ئەو بەردا.
ميرك چوو تا گها نك جوتكارى. دهما جوتكارى ئەو ديت، ب بازدان
چوو پيشى. خيرهاتن تى دا و ژى ره گوت: گەلو ته بهختى من ديت؟
ميرك گوت: بەلى، من بهختى ته ديت، و وها ژ ته ره دبېژە: خەزىنەك
زيران د ناڤا وى شكيرا ته يا نيقا زەڤىي ده هەيه، دهما هافىنى ژ گەرميا روڤى
ئەو زير دسنجرن، ئاگر ژ وان دچە، و ب گەنم دكەڤه، وى دشەوتينه. ده
هەرە جھى زيران بكوڤله و وان دەرڤه، تى ژ قى دوردى خەلاس بى.
جوتكارى سپاسيا وى كر و ژى ره گوت: ده وهره ئەز و تو ئەمى قى
شكيري بكوڤلن و زيران دەرڤن، و ل هەڤ پار بكن، ژ بەر كو ته ئەڤ قەنجيا هان
ب من كر دقې ئەز ژى قەنجيا ته قەگەرىنم.
لى كر و نه كر ميرك زيرى جوتكارى قەبوول نه كر.

جۆتكارى گۆت: قەدى تو رەوشا خوە يا كامباخ نابىنى؟! چما تو قەببول
ناكى؟

ميرك وەها ژى رە گۆت: بەختى من ژ من رە گۆتیه: ھەرە و ئەزل ل پېشیا
تە مە.

دە ژ جۆتكارى بەردا و چوو.. چوو تا گھا نك مار. مار ژى پرسى: د
بەختى تە و خوەدى دە مە، تە چ کر؟

ميرك روونشت و چ تشتى كو بى رە چىبوو ژ مار رە گۆت - ژ چوونى
ھەتا ھاتنى- و بەردەوام کر: و بەختى تە ژى دىيژە: بلا ب مرۆفە کى ئەحمەق
فە بدە وى ساخ بیه.

جارە کە دى مار ژى پرسى. وى ل مار فە گەراند و گۆت: بەختى من ژ من
رە گۆت: ھەرە و ئەزل ل پېشیا تە مە.

مار ژ خوە رە گۆت: "گەلۆ، ما ئەزى ژ فى ئەحمەقى ئەحمەق ژ کیدەرى
بینم!؟". بانگکری گۆت: ب خوەدى کى، وەرە د گوهى من دە بیژە، کا
بەختى تە چ گۆتیه، ژ بەر کو گوهین من گرانن، من دەنگى تە باش نە
بھیست!

ميرك ھات. خوە نيزیکی گوهى مار کر، و مار ژى نەمەردى نە کر، ب
پەلکا بن گوهى ميرك فەدا، و ژى رە گۆت: دە ھەرە، ما بى وە کە تە ژ بۆی
چ بژی!

چیرۆکا مە چوو دەشتى، دى و باقین مە چن بوھشتى.

بېش

ته حسیلدار هاته گوند، خه لك هه می چوون و بېشا خوه دان. کورې
ژنکې چوو بېشا خوه و کوفله تی خوه دا. ده ما فه گهرها مالی، دیا وی ژې
پرسی: تو ب کوو فه چوو بوو؟
ژ دیا خوه ره گوت: نه ز چووم من بېشا خوه دا.
دیا وی ب ته پال چوگین خوه دا و گوت: وهی ل منی.. وهیلا ل منی!.
تو ولوب ره هه تی چوو و ته بېش دا؟ مالا منی، تو ژې بوویی باقی خوه!؟
کورک ژ دیا خوه پرسى: یادى! قه ی باقى من چاوا بېشا خوه ددا؟
ژې ره گوت: کورې من! ده ما ته حسیلدار دهات، باقى ته خوه ددا
ئالبكى؛ ئانگو خوه فهدشارت. ل وی دگهرهان، تائهو دگرتن، و دبرن تېر لى
ددان، سهرى وی ژې دشکاندن، ژ نوو فه بېشا خوه ددا.
خورت ل دیا خوه فه گهراند: یانی بېشا خوه ژې ددا و سهرى خوه ژې ددا
شکاندن!.

بازرگانهك

مرۆفەك بازركان، د داويا مەها ئاقدارى دە، رۆژەكى تاڧ گەرم دەركەت،
چوو دۆرا گوند و گەرەها، دیت كو تەیرەكى هیلینا خوە ل سەر دارەكى
چیکریه، و سى چیلېك زى دەرخستنه.

میرك ژ خوە ره گۆت: ب خوەدى ئیسال ئەز د بازركانیا خوە دە ئەخریمه،
فا تەیر هیلینا خوە چیکریه و چیلېك دەرخستنه، و هین من دەست ب كاری
خوە نه کریه!.

وى شەقى میرك چوو حەفت گامیشین خوە كار كرن و باركرن، سەرى
سبەهى زوو بەرى خوە دا ئۆخرا خوە. ژ سبەهى هەتا ئیقارێ مەشى. هەو دى
ژ نەشكافە بەرفى لیکر. بەرف هات و هات، هەتا كو ئەو و گامیشین خوە
سەكنین و ئەما کاریبوون ب رى دە هەرن. ئەما کاریبوو نه هەرە و نه فەگەرە.
میرك فکری "کا ئەز چ بكم؟ ئەز و حەفت گامیشین خوە ل فرمەن، یان مایینا
من موهمتره؟". هەما میرك دا خوە، رابوو کیرا خوە ژ بەر خوە دەرخست،
زكى گامیشا خوە چراند و خوە كر ناڧ دل و هنافى وى دە، هەتا كو لى سار
بوو. هەر وەها گامیشەك ل دوو یا دى، زكى وان فەكر و كەتە ناڧ دل و هنافى
وان. هەتا كو هەر حەفت گامیش خەلاس بوون، رۆژ لى هلات، تاڧەكە گەرم
بەلاڧ بوو. ب خوە زانى كو ژ مرنى خەلاس بوو.

ب تەنا خوە، بى گامیش، بى بار، فەگەر یا مالى. بەر یا كو بگهێ مالا خوە

چوو ریا خوه ب تهر و هیلینا وی خست. دیت کو تهر ب هدرسی چیلیکین
خوه فه مرنه و هشک بوونه. ل جهم هیلینی سه کنی و گوټ:
تهیر کو ویتویت کانی؟! ته تشتهک ژ حهسابی سالی نه دزانی، ته مالا خوه
خهرا کر و یا م ژی ل سهر دانی!

چیرۆکا دەرەوان

دو مڕۆڤ چوونە شەریعەتی، قازی ژ وان پرسی: مشکێلا وە چیه؟

بی پێشی دەست پێکەر و گۆت:

ئەزبەنی! ئەز قی سبەهی چوومە نیچیری، دو کەفان ب من رە بوون، یەک ژ وان بی تیر بوو، و بی دی بی بدن بوو. من راهشته بی بی بدن و من نیشان ژ پەزکۆفی گرت هەتا کو ژ قەلشا تەحتی هاتە دەر، و من بەردایی، هەو من دیت کو پەزکۆفیا من د تەحتی دە گندری، و ئەز پەي چووم، من دا سەر شۆپا خوینا وی هەتا دەقی دەری قی جوامیری. دەما من دۆزا نیچیرا خوە لی کر، دا مەندەلی و گۆت: تشتە کی تە ل با من نینه.

قازی بەری خوە دا میرکی دی و گۆت: چما تە نیچیرا وی نەدایی؟ میرک ل قازی فەگەراند و گۆت:

ئەزبەنی! ب خوەدی ئەز ل مالا خوە روونشتی بووم و دیا من هری درست، و من ژ ی ژ وی رە دکر گرووفک، گرووفکا ریس ژ دەستی من کەت و گندری چوو ژ دەرڤە، ئەز چووم گرووفکی بینم، من دیت کو پەزکۆفیەکی راهشتیە گرووفکا ریس دیا من و ژ ی رە تینە مال دە. ئەز رابووم من ئەو پەزکۆفی گوران، سی سیلۆکین (بەرۆش) دیا من هەبوون، یەک ژ وان بی بنی بوو، یەک بی قەپاخ بوو، یا سسیا بی چەمیل بوو. دیا من هەرسی بەرۆش ژ گوشت داگرتن، ل ئاگر کرن، دەما گوشتی مە پڑها، مە گوشت ل خەلکی

باڙڙ همي بهلاڻڪر، هي ڙ نوو مه ديت في جواميري ل دهريي مه دا؛ ديڙه
ٺهڙ خواهديي في نيچيري مه. ٺهو نيچيرا ڪو خواهدي ڙ من ره ريڪري، و ب
گرووفاڪا ديا من ڦه هاتي. ڪا فيجا چي وي ل با من ههيه؟

قازي شاشو ماشو بوو، بهري خواه دا ههردو و ڙ وان ره گوت: چيو ڪا
وه يا دهره وايه، هه ما ڪا ڪي ڙ وه زه هفت دهره وان بڪه حدق ب وي رهيه.
يي پيشي دهست پي ڪر و گوت:

ٺهڙهني! ب خواهدي نه ڙ ٺاده تا مالباتا مهيه ڪو ٺهم دهره وان بڪن، لي
تشتي تي بيرا من، حيشتره ڪ مه هه بوو، لنگه ڪ تافيتيه چيائي جوودي، و يي دي
ددا چيائي مازي، و ديا من ٺهو ددو هت هه تا ڪو ٺهو گهليي د نافهرا ههردو
چيان ده تڙي شير دبوو و ب سهر ده دجوو.

ميڙڪ ل ور سهڪي. قازي بهري خواه دا يي دي و ڙي ره گوت: ها، چ ل
با ته ههيه؟

يي دي دهست پي ڪر و گوت:

ٺهڙهني! ڙ خواه تجاري مالباتا من نرانن دهره وان بڪن، لي تشتي تي بيرا من،
روڙه ڪي، خه لڪ چوونه خوي، يي ههسپي خواه بر، يي مهينا خواه، يي قانتر
خواه، يي گا، يي ڪه... من ڙي ديڪي خواه ب جل ڪر و ب وان ره بوومه
هه ڦال. ٺهم چوون سهر ڪاري و هه ميا باري خواه داگرتن، من ڙي دو جهوال
داگرتن، و ل پشتا ديڪي خواه ڪرن. د ڦه گهري ده، ٺهم راستا رووباره ڪي
هاتن، خه لڪ د رووبار ره دهرباس بوون، ديڪي من نه ڪاري بده ٺافي، من
باري خويا خواه هه مي، ب بهر ڪه هنيا ٺافيتيه وي ٺالي جهم، و من راهشت ديڪي
خواه و ٺهم دهرباس بوون، ده ما ٺهم چوون وي ٺالي و من خوي ڦهيدا و ڪر

چەوالان دە و ل پشتا ديك كر، من ديت كو جەمەك ژ يا دى گرانزە، بارى ديك خوار دبوو، من كەفرين وى بەر بەستى هەمى دانين سەر ئالىي سقك، لى راست نەبوو. هەو من ديت كو ب قاسى درانه كى خوى يا من ل ئەردى يە. دەما من راهشتى و ئەو دانى سەر جەما سقك، بارى ديكى من بوو وەكە مېزىنى. هەتا ئەم گەهانە مالى، من بارى ديكى خوە دانى، من ديت كو پشتا ديك بوويه جەدەو، ئەز ل تەختورى دنيايى هەمى گەريام، دا ئەز دەرمانە كى ژ پشتا ديكى خوە رە بېنم، هەميان ژ من رە دگوتن: دەرمانى پشتا ديكى تە، گوزا هندى يە. ئەز ل گوزا هندى گەرھام و نە گەرھام من ئەو پەيدە نەكر. ئەز پەر خەمگين بووم. من ژ ديا خوە پرسى: كا ئەزى گوزا هندى ژ كوو بېنم؟! ديا من گوت: كورى من! ب خوەدى ئەز نزانم گوزا هندى ل كوو هەيه! لى رۆژا كو ئەز بووك بووم، رەحەتتى باقى تە ب قاسى بەنيشتە كى گوزا هندى دا من. كا وەرە ل قولا درانى من بنەرە، بەلكى هين پچەك تېدە مابە. دەما ئەز چووم من ل درانى ديا خوە نەرى، من ديت كو ب قاسى هەفترشە كى تى دە يە. دەما من ئانى و ل پشتا ديكى خوە دا، هەو من ديت كو دارەكە گوزى ل سەر پشتا ديكى من شين بوو، حەفت گوزچنينا گوز ژى دچنين و يە كى دەنگى يى دى نەبھيست، و ديكى من ژى قىژقېژا وى بوو بانگ ددا و دچېريا. رۆژە كى ئەز ژى ب سەر وان قە دچووم و دەھاتم، من ديت كو جۆتكەك گوز ب سەرى شاخە كى قەنە، من خوە تەواند شەلكەك ئاخ، و من ئاقىت وان گوزان، هەو من ديت كو ئەو ئاخ بوو دەشتەك، حەفت جۆتكاران جۆت ل سەر گرېدان، يە كى دەنگى يى دى نەدبھيست، ديكى من ژى د بن دە بانگ ددا و دچېريا. رۆژە كى د ناڤا جۆت دە گايى مە وندا بوو.

نډم گهرهان و نه گهرهان مه نهو نه دیت. هافین هات. مه گڼمې خوه درووت،
مه بر پینده ری، مه گیره کر و دا بایی، مه کر چه والان ده و نانی مالی. باری
پیشی، من گڼمې خوه بر ئیش هیږا و نانی مالی، دیا من هه فیږی پیشی چیکر و
بر ل تهنووری دا و نانی مالی، من راهشته نانه کی، قدت کت، هه و من دیت
کو گایی مه د ناډ وی نانی ده مه خدل هاتیه و دکایی.

دەرەو

كورك ژ باڤي خوه ره گوت: باڤو! دهما تو دچي جفاتان و داخفي، تو پر
تشتان مەزن دكي، و ئيدي خەلك ب تە دكەنن.

ميرك زي ل خوه موکور هات و ژ كورپي خوه ره گوت: ب خوهدي،
كورپي من، ئەفا تو دببزي راسته. ئەز زي ل خوه هاي بوومه، لي كا ئەزي چاوا
بكم؟

كورك زي ره گوت: چاره ل با من ههيه باڤو! ده وەرە ئەزي هەر ئيقار ب
تە ره بيمه جفاتي، و دهما كو من ديت تە شاشكر، يان تە زيده كر، ئەزي
ئيشاره ته كي بدم تە، دا تو ل گوتنا خوه فه گهري و سەر راست بكي.
ميرك ل كورپي خوه فه گهراند: كورپي من! ب خوهدي ئەف تشت گهله كي
باشه.

روژا دي ئيقاري، كورك دا كيله كا باڤي خوه و بهري خوه دان جهي
جفاتي.

دهما دور گها ميرك و دهست ب ناخافتي كر، گوت: گهلي جفاتي! دوه
ئەز چووم چولي، من تشتهك ئەجيپ ديت!
خەلكين جفاتي زي ره گوتن: كهره مكه بيژه.
دهست پي كر و گوت: من ههسپه كي كوڤي ديت، دووڤي وي دوازدهه
مزان دريژ بوو.

كورڭ ب لەز و بەز گۆت: ھم ھم..
 باڤ ل خوھ ھای بوو كو زښده كر. د جھ ده گۆت: باوهر بكن، ھه گهر
 دوازدهه نه بن، لى ههشت ب ره حهتې هه بوو.
 كورڭ ديسا گۆت: ھم ھم..
 ديسا ميړك ل خوھ ښه گهرا و گۆت: يا جهماعه تا خيړى، به هوهر بكن،
 هه گهر ههشت نه بن زى، ژ كيماڼى ژ كيماڼى چار هه بوون.
 كورڭ ديسا گۆت: ھم ھم..
 ښى جارى، هنگى باڤ تږى بوو، بهرى خوھ دا كورپى خوھ و زى ره گۆت:
 ھم و قوزه لقهرت. باپيړى ته زى ژ گورستانى رابه، نه ز ژ چار مزان داناكه قم.
 ما ته دښى كو نه ز بيژم: بى دووڤ بوو؟!

قەرەچى نابىن خاتوون

دېيىن جاره كى مېرەك د گەل برەك ھەڧالىن خوه چوونە نېچىرى، ژ نشكى
ڧە راستى چەند كۆنن قەرەچيان ھاتن. مېر ژ ھەڧالىن خوه رە گۆت:
راوہستن! ئەمى بهنە كى ل با ڧان قەرەچيان روونن و بهنا خوه ڧەكن.

بەر ب وان ڧە چوون. كەچا خوه دىي عىلا قەرەچيان چوو پېشيا وان، و
بەرى خوه دا مېر، چوو سەرھەڧسارا ھەسپى وى گرت. دەما چاڧى مېر لى
كەت، نە ب دلەكى، ب سەد دلى دل كەتېي. ھەما مېر بى دودلى، خوه ژ
سەر پىشتا ھەسپى خوه ئاڧىت و بەرى خوه دا كۆنى باڧى وى. دەما ئەو و
ھەڧالىن خوه روونشتن، بەريا كو ئاڧى ڧەخوه، ئەو ژ باڧى وى خوه ست. ھنگى
ھەڧالىن وى ژى رە گۆتن: "ئەڧ كەچك نە بابەتى تەيە"، مېر گوھى خوه نەدا
وان. سپەھىبوننا وى ھش و سەودا د سەرى وى دە نە ھىتېوو. ژ خەلكى رە
دگۆت: "ئېرۆ قەرەچيە، لى سبە وى بېە خاتوون".

مېر ئەو ژ خوه رە ئانى. ھەفت رۆژ و ھەفت شەڧان ل وەلات بوو داوہت
و شاھيانە. قەسرەك تايبەتى ژى رە ئاڧا كر. ب سەدى خولام و جىرى و
خزمەتچيان ل بەر دەستى وى دانېن. ھنەكا سەرى وى دشوشت. ھنا جلىن
وى لى دكرن، ھنەكا پۆرى وى شەھ دكرن و كەزىين وى دھوونان، و ھنەكان
خوارنا وى چىدكرن.

خزمەتچيان بالا خوه دانى ھەر كو مېر دچە نېچىرى خاتوون، وان تەڧان ژ

قەسرى دەردخە، و دەرى ل خوە دگره. نه رۆژه کى، نه دودۆ، نه سسى...
 خزمەتچى و جىريين وى ترسيان کو نهخوہ شيهك گهاہه خاتوونا وان.
 چوون ژ مير ره گۆتن: حال و مەسەلا خاتوونى ئەفە، ئەفە.
 دەما مير ئەفە تشت بهيست، بوو دەردەك و کەت سەر دلى وى. مير ژ خوە
 ره گۆت "دفى کو ئەز ب خوە فى تشتى بزائم".
 رۆژه کى مير د دەريکى ره چوو و د دەريى دى ره فەگەريا کەتە قەسرى،
 بى کو کەس لى هاى ببه و خوە د پشت پەردە کى د فەشارت. نۆبەت ل
 خاتوونى گرت. هەو ديت کو خاتوونا وى دەريى قەسرى گرت، و چوو
 دەريى سندوقە کى فەکر و توورکەك ژى ئانى دەر و ئاقينه مىلى خوە. چوول
 بەر دەرى و کولەك و پەنجەرەن دسە کى، دەستى خوە فەدکر و دگۆت:
 "خوەدى ژ هەوہ رازى به، خوەدى زارۆکى هەوہ بهيلە، خيرا مريا و سەدەقا
 سەرى ساخا هوون تشتە کى بدن من، زارۆک ل مالى برچى مانە". هەتا کو
 دەرى و پەنجەرين قەسرى هەمى خەلاس کرن، بهنا وى فەرەه بوو. ديسا
 توورى خوە بى پارسى فەشارت. دەرى و پەنجەرە فەکرن. هنگى مير ژ پشت
 پەردى هاتە دەر. بەريا کو خاتوون هەرە ل سەر تەختى خوە روونە، مير ب
 ئاجزى و ب حسرەت، ب خورتى مىلى وى گرت و گۆت:
 "راستە، قەرەچى نابن خاتوون".

به رخ

به رخكه ژ ديا خوه بوو. پشټى دو مدهان، خوه دى وى نه و ئانى، دا وى سهرژيکه. به رخ گرى و خوه ئافيت سهر دهست و پيښ خوه دى خوه. لافلا ژى کر و گوت: "تى من نها نه گورينى!". خوه دى لى فه گهراند و گوت: "چما نهز نها ته نه گورينم؟"

- من بهيله، ههتا نهز بهارى بينم. ديژن بهار پر خوه شه. خوه دى به رخ هه نه كى فكري. دلى وى ب به رخ شهوتى. ب دلوقانى كيړا خوه ژ سهر هوستوى به رخ راكر. دهستى خوه ب سهرى وى ده ئانى و ژى ره گوت: "ده هره ناؤه هه قالين خوه!".

به رخ خوه ژ شاهيا هلاقيت، ههروه كى كو نوو خوه دى نهو دابه ديا وى. بهار هات و چوو. د داويا بهارى ده ميرك راهشته كيړا خوه و سووت و تووژ كر و به رخی خوه دريژ كر و كيړ داني سهر هوستوى وى، دا سهرژيکه. لى ديسا به رخ گرى. ب گريكى شهوات و لافلا خوه ئافيتسه خوه دى خوه. خوه دى ژى ره گوت: "فى جارى تو چ دخوازي؟".

به رخ گوت: من نها نه گورينه، ديژن هافين پر خوه شه. من بهيله دا نهز هافينى ژى بينم!".

ديسا ميرك ل هه مبهه دوز و لافلا به رخی قهلس بوو. دلى وى ئالى وى نه كر كو بگورينه. كيړا خوه بلند كر و لنگى خوه ژ سهر سينگا به رخ راكر،

و ژى ره گوت: هره وه كه كو تو دخوازي. هافيني ژى بيينه.
بدرخ پر سپاسيا خوه دىي خوه كر، كو بهنا خوه لي فهرهه كر و ههكه دى
ژيان دا وى.

هافين هات و بوورى. بوو دهسپيكا پاييزى. ديسا ميترك كارى گوراندا
بدرخ دكر. ديسا وه كه ههرجار بدرخك زارهزار كر و خوه ژ ناډ له بي خوه دىي
خوه خهلاس كر، و ژ خوه دىي خوه ره گوت: دييژن پاييز گهله كي خوه شه،
بهيله نهز پاييزى ژى بينم، دا نهو كول د دلي من ده نه مينه!"

پاييز هات و بدر ب داويى ده دچوو. ده مسال گها دهسپيكا زفستانى.
بدر يا كو خوه دىي بدرخ كارا گوراندا وى بكه، بدرخ ب خوه هات، و ل بدر
لنگى خوه دىي خوه مه خهل هات و ستووى خوه ژى ره دريژ كر، ژى ره
گوت: كه ره مكه، من سهرژيكه.

خوه دىي بدرخ نه جيمايى ما و ژى پرسى: تو ب خوه هاتى كو نهز ته
سهرژيكم، و تو هوقاسى ب ژيانى فه گريدايى بوو!؟

بدرخ ل خوه دىي خوه فه گهراند و گوت: بهلى نهز ب ژيانى فه گريدايى
بووم، تا كو من تشتين نوه لي دديتن، لي ئيرو نهز گهامه بهوه ريه كي كو
جيهان هه چار ده من. ماده ما كو ت تشتين نوه د جيهانى ده تونه بن، مرن و
ژين، هه بوون و نه بوون وه كه ههفن.

شیردت

مرؤفہ کی گوندی و خزان، پشتی زہ واجا خوہ ب دو مہان، ژنا خوہ ل با
دے و باقی خوہ ہشت، دگل کاروانہ کی جوو وہ لاتہ کی دوور، دا کو ژ خوہ
رہ بخہتہ و ہنک دراڤ ژ مالا خوہ رہ بینہ.

دهما چو، پستی دهمه کی ژ هډقالین خوه وندا بوو و ب وهلاتان کت،
نمدا زانی کا وی چاوا شه گره مالا خوه و وهلاتی خوه.

بيست سال دوى نافي ده چوون، ههتا روژه كى راستى ههك مروژ ژ
ههريما خوه هات، كو نهو ژى مينا وى نه چووبوون مالا خوه. كولين خوه ژ
هه ژره گوتن، له هه ژ بوونه خوه دى و كار كن كو فه گهرن وه لاتم، خوه.

د ریا فہ گهری ده راستی تشته کی نه جیب هاتن. دیتن کو زلامهك ل سهر
ریکی روونشیه، دبیزه و باندکه: شیرهههههت.. شیرت. وهرن شیرتانه! نهز
شیرتانه دفروشم.

میرک بانگ هه‌فالین خوه کر: وەرن، دا ئەم هەنەک شیرەت ژ خوه ره
بکرن.

هه ڦالين وى قهرڦين خوه پى ڪرن و ژى ره گوتن: ئه ڦ ڪه دا ڪو بيسټ
سالان مه دايه هه ڦ، ئه م ژ پو گوتنن ڦالا نامه زرخن.

لی میړك گوهیّ خوه نه‌دا وان. ب بهر شیره‌تغروّش فه چوو و ژیّ پرسی:
تو شیره‌تیّ ب چ دفروّشیّ؟

شیره تفرۆش لی ڤه گهراند و گۆت: ئەز شیرەتی ب زیره کی زهر دفرۆشم.
میرک سی زیر ژ کوورکا خوه دهرانین و دانه میرک. یانی سی شیرەت ژ
خوه ره کپین.

شیره تفرۆش ژێ ره گۆت: کوړی من! شیرەتا یه کی؟ کو تول چۆلان
رازه هایی، ل جهه کی بلند رازه. یا دودوان؛ کو ته گرت بهرنه ده، و کو ته
بهردا په ی نه که ڤه. یا سسیا؛ کو ته خوه ست تو قه راره کی بدی، د جه ده
نه ده، چقا بهنا ته فەر هه به، وی چپتر به.

میرک شیرەتین خوه ژ بهر کرن و ئەو و هه ڤالین خوه ب کاروانه کی ره ب
ری کهن.

چوون و چوون هه تال وان بوو شه ڤ، نه ما پیشیا خوه دیتن، ل نه واله کی
راست هاتن. باری ده وارین خوه دانین، ده وارین خوه گریدان. جهی خوه دانین
و رازان، بهریا کو میرک رازی، شیرەتا وی هاته بیر. کو دبیژه "د نه والی ده
رانه زه". چوو جهی خوه ل سهر ته حته که بلند دانی و رازا.

ده ما رو ناهیی دا دهر، میرک چافی خوه ژ خه و ڤه کر، چ ببینه!! دیت کو
وی شه ڤی له هیهک رابوویه، ئافا وی ب وی گه لی ده هاتیه، ئەو کاروان ل گهل
حه یوین هه می ل بهر خوه بر نه. ئەو ب تهک و ته نی مایه.

ته ڤی خه مگینیا خوه ژ، پر که یفا وی هات کو هین ساخ مایه. پر سپاسیا
خوه دی کر و دا خوه و رابوو و ریا خوه بهر ده وام کر، هه تا گها به خچه کی. ل
بن داره کی روونشت دا کو بهنا خوه ڤه که. هه و دیت کو چووک هه هات و ل
پیشیا وی دانی، ئەوی ژ دهستی خوه ئافیتی و گرت. کار کر دا وی
بگورینه، لی چوو کی کره کاز کاز، هی ڤی ژ کر گۆت: من بهرده. هه گهر

كو تو من بگورینی وی چیلیکین من د هیلینی ده ژ نیرا بمرن. ما تی چبکی ژ
گۆشتی من؟! ههمی ب ههفه پاریهك ژئی نایه دهر.

دلّ وی ب چووکی شهوتی و ئەو بهردا. دهما چووك فری و چوو سهر
دارئ، ژ میړك ره گۆت: تو دزانی ههگهر ته ئەز گوراندماما، دورهك د ئاڤا من
ده بوو، تیرا ته و كورپ كورپ ته دكر.

دهما ئەڤ گۆتن سهح كر، ههش د سهری وی ده نهما، دا خوه رابوو پهی
چووکی كهت. چووك فری ژ دارهکی چوو یا دی، ههتا میړك وهستهها. دیسا
شیرهتا دودوا هات بیرا وی "كو ته گرت بهرنهده، و كو ته بهردا پهی
نه كهفه". ههكهی ب خوه ره مژوول بوو. دیسا راهشته تووركی زاد و ئاڤا خوه
و ریا خوه بهردهوام كر.

ژ باژارهکی چوو بی دی، و ژ گوندهکی چوو بی دی. ب پرس و پرسیار،
ب بهری سبههی ره گها گوندی خوه. چوو بهری خوه دا مالا خوه. دهری
فه كر؛ چ ببینه! دیت كو خۆرتەك تو گونهم دکی ل بهژن و بالا وی بنههه، د
کیلەكا ژنا وی ده درێژکریه و رازانه. د جه ده خنجههرا خوه ژ بهر پشته خوه
ئانی دهه دا ل سینگا وی خه و بکوژه. هین دهستی وی ل با بوو، شیرەتا سسیا
هات بیرا وی كو دیژّه "د قهرارین خوه ده بهنا خوه فەرهم كه". دیسا دهستی
خوه داخست. خنجههرا خوه ل كالان فه گهراند. ل پشته دهیری ئۆدی
روونشت. ژ خوه ره گۆت: "ئەزى روونم، ههتا شیار ببن، ئەزى ههردوو كا
بکوژم".

میړك ما شیار، ههتا مهله بانگا سبههی دا. ههه دیت كو ژنا وی شیار بوو،
و بانگ وی خۆرتی كر، ژئی ره گۆت: كورپ من! كورپ من! رابه سهر خوه.

ڦا مهله بانگا سبههه دده. رابه دا نهه نميڙا خوه د وهخت ده بكن.
هه ما ميرك ب كهلوگري خوه نافيته وان. ژ نوو بهيست كو دي و باقي
وي نه مري خوه دي كرنه، كو ژنا وي ب حمل بوو بهريا كو نهو هه ره، بيي
كو ژنك زي زانه.

گۆرا باقى

خۆرتەكى گوندى، چووبو باژىر دا ژ خوه ره بشوغوله. دهمەك دريژ پى
فه چوو، گەلەكى بىريا گوند كر. ئزنا خوه ژ خوهدى كار خوهست و بەرى
خوه دا گوند. دهما نيزىكى گوند بوو، راستى مروڤه كى گوندى هات، ل ههڤ
سه كىن، خۆرتى رىوى پرسا گوند و گونديان كر.

ميرك لى ڤه گهراند: تشتهك هديه، لى من ناڤى ژ ته ره بىژم، نهها تو بگهئ
گوند، تى ب خوه زانى.

بى رىوى ژى ره گۆت: كا بىژه گدى، ئەڤ چيه؟ ب خوهدى ئەز ژ ته
ناگهرم تا تو بىژى.

ميرك نهچار ما و ژى ره گۆت: ب خوهدى ڤى سبى باقى ته ئەمرى
خوهدى كر، و مه ئەو سپارته ناخى، ئانگۆ ئەو ڤهشارتن.

هدما ميرك دهڤ ژ ههڤالى خوه بەردا و يەكسەر بەرى خوه دا مەزەل. چوو
سەر تربا باقى خوه. ديت كو هين تر ب بلندە و ناخا وى شله. گرى و خوه
ئاڤيت سەر سينگا گۆرى. ب گرى خوه ره دەست پى كر، هه موو بيرانيين
خوهيڤن خوهش و نه خوهش، ئانين بىرا خوه و ژ باقى خوه ره گۆتن. هەر گرى
و دهردين خوه ژ باقى خوه و ژ وى ناخا سار ره گۆت. هه و ديت كو مروڤهك
راسهري وى سه كنيه. ژى پرسى: خۆرتۆ! چما تول سەر ڤى تربى دگرى؟
خۆرت لى ڤه گهراند و گۆت: ئەڤ تربا باقى منه. ئىرو مريه و ڤهشارتنه.

مخابن ئەز نەگھامە سەر.

مېرك زى رە گۆت: نە خېر. ئەڤ نە گۆرا باقى تەيە.

خۆرت لى فەگەراند: چاوا نە گۆرا باقى منە، و ھىن ئاخا وى شلە؟

مېرك گۆت: بەلى، ئەڤ رەھمەتتى ھا زى ئېرۆ مريە، وەكە باقى تە.

خۆرت پرسى: ناخوہ کا تر با باقى من؟

زى رە گۆت: ويى ھايە، تر با باقى تە ل سەرى مەزەلە.

دەما خۆرت چوو سەر تر با باقى خوہ. سەكنى و زى رە گۆت: باقؤ!

قسوورا من عەفوو كە. ب خوہدى تشتى ل با من ھەيى، من ھەموو ل سەر وى

گۆرا ھان گۆت. ببوورە، ب خوہدى گرىى من زى نەما تى.

دوكتۇر

مروڭفەك چوو دوكتۇر ئانى سەر باقى خوه. دوكتۇر ژىي نەخوھش پرسى:
كووده تە تېشە؟
مېرك لى فەگەراند و گۆت: ئەۋ كاپۇكا من ئانگى راستى تېشە.
دوكتۇر چقا ھلانى و دانى، ديت كوت نەخوھشى ل دۆر مېرك نېنە. ژىي
پرسى: خالو! ەمرى تە چقاسە؟
لى فەگەراند: ەمرى من ەشتى سالە.
دوكتۇر گۆت: خالو! ب خوھدى ت نەخوھشى ل تە خويا ناكن.
يى نەخوھش پرسى: ناخوھ ئەۋ تېشا لنگى من ژ چيە؟
دوكتۇر لى فەگەراند: خالو! تېشا لنگى تە ژ ئختيارى يە.
مېركى نەخوھش ب عاجزى ل يى دوكتۇر فەگەراند و گۆت: دە ەدرە لۇ!
ب خوھدى توت تىشى ژ تەختۇرىي نزانى! ما ەگەر ژ ەمر با، ما ەمرى
ەدرەدو و لنگىن من نە بقاسى ەفن. ما چما يەك تېشى و يى دى نا!
ھىن ولۇ ديتن كو قەلەبالخەك ژ ئالىي دى تى. دوكتۇر پرسى: ئەۋ كېنە
شەر دكن.
مېركى نەخوھش گۆت: نە تىشتكە. دەۋ ژ وان بەردە. ئەۋ باقى من و باپىرى
منن. ئەۋ عادەتا واىە ەدر و ەدر خرەجرا واىە و ب ەۋ فەنە.
دەما دوكتۇر ئەۋ گۆتن بھىست، ژىي نەخوھش رە گۆت: خالو ب خاترى
تە. ب خوھدى خەبەرا تەيە. ئەز ت تىشى ژ تەختۇرىي نزانم. رابوو دا خوه و
چوو.

ژ چیرۆکین میرهکان

(۱)

دیژن جاره کی، شیرەك ل هەریما جزیرا بۆتان هاتە خویا کون. خەلکی گەلەك حەساب ژێ کون. خەلک بێ ناخفتن و دان دەست هەڤ. ل مەملاکەت بوو قوینی هەتا خەبەر گەها میر.

میر فەرمان دا رەسپی و شیوردارین خوه. جفینەك تایبەتی ژ بۆ فی هاوی ل دار خست. د ئەنجامی دە دیاریك مەزن خویا کر، گۆت: ل جزیری بانکن، بیژن: هەچی فی شیرێ بکوژە وی فی خەلاتا مەزن بستیئە.

ناڤ و دەنگی شیر و خەلاتی گەها هەر دەری و هەر کەسی.

پشتی دەمەکە نە درێژ دیتن کو شیر هاتیە کوشتن و کەلاخی وی ل چۆلەکی یە.

خەلک هاتن ب سەر میر دە کشیان و هەر یەك دیژە: من شیر کوشتیە.

میر ژ وان دپرسی: کا ژ من رە بیژن، وە چاوا ئەو کوشتیە؟

دەما دگۆتن بێ چاوا شیر کوشتنە، نە دکەت سەری میر، و ژ وان رە

دگۆت: هەرن، نە وە کوشتیە!

هەتا روژەکی شفانەك ب تەڤ دار و کولافی خوه بێ شفانتی، بێ ئزن و

دەستوور، کەتە ئەیوانا میر و گۆت: من شیر کوشتیە.

هاتن دا وی بگرن و بدن ئالیکێ.

میر گۆت: ژئی گهرن. بلا وهره.
 شپيا ل ههمبهري مير راوهستها. مير بانگ کړي و ژئی ره گۆت: هي ژئی
 وهره نيژيکي من. ژ من ره بيژه: کا ته چاوا شیر کوشتيه؟
 مير ل سهر نه رشي خوه روونشتيپوو، و ههر دوو وهزيړين وي يين ملي
 راستي و ملي چهبي ژئی روونشتي بوون.
 شقان هات پيشبهري مير، دهست پي کر و گۆت: من دو کوچک ههنه،
 نافي يه کي قهرؤيه، نافي يه کي گورزويه، وه که کو وهزيړي ملي ته يي راستي
 قهرؤ به، و وهزيړي ملي چهبي ژئی گورزو به، و وه که کو تو ژئی شیر بي، و
 دهستي خوه ژئی ب وان فه کر. قهرؤ ب گوهه کي شیر گرت، و گورزو ژئی
 ب گوهي دي گرت. من ژئی راهشته داري خوه و بلند کر. و ب گوتنا خوه
 ره قراسي داري خوه ژئی بلند کر.
 ههما مير ب لهز و ب دهنگي بلند ژئی ره گۆت: کورؤ داري خوه دهينه.
 ب خوه دي ژ ته پيڅه کوسي نه کوشتيه.

(۲)

جاره کي سبهها روژا جهژنا نه ورؤژي، ميري بۆتان فهران دا عهسکهري
 خوه و گۆت: دقي هوون ههرن ل جزيري مال ب مال بگهرن، بلا کهسهک د
 مال ده نه مينه، بلا ههمي ههرن ده رکهفن چؤل و چيا، ب کهيف و شاهي جهژنا
 نه ورؤژي ل دار خن. پшти کو مال ب مال ل دهريي وان خستن، و فهرانا مير

ژوان ره گوتن، هاتن با مير و ژي ره گوتن: ژندهك هديه ب تهنی، د مالا خوه ده يه، ژ مه ره گوت: نهز ئه مری مير ب جه نايينم. مير پرسى: وه نرانى ئه و ژن چ دخوازه؟ ژي ره گوتن: بهلى نه زبهنی، ژ مه ره گوت. مير ژ جهی خوه قهپچی و گوت: چ دخوازه؟ ژ مير ره گوتن: ژنكى ژ مه ره گوت: میری من، براى من و كورى من، هدرسى د زندانا مير ده نه. نهزى چاوا هدرم جه ژنى و شا بيم!؟

مير عهسكه رى خوه ريكرن جهم ژنكى. ژي ره گوتن: مير دبیژه: نهزى يه كى ژوان ژ بو خاترى وى، بهردم. كا ئه و كيژانى دخوازه؟ ژنكى ل فه گهراند و گوت: ههرن ژ مير ره بیژن: برا پشته، كه زه ب خشته، مير خواهش تشته. نهز ب تاجا سهرى مير كم، كو هدرسيكا ژى بهرنه ده، ل من حهرام بن جه ژن و شاهى. هاتن گوتنن ژنكى ژ مير ره گوتن. مير يه كسهر گوت: ههرن هدرسيكا ژى بهردن.

بەشەك
ژگۆتەن
پیشین كوردان

- گويز ب گوين، داگرتن هينز.
- زك تيهره و چاڤ برجي يه.
- خالا خواهرزي راكرن، ماما برازي وندا كرن.
- كرنى ههتا مرنى.
- سواري خهلكى ههر پدياره.
- خهتا خوههر ژ گايى پيره.
- ئهردا نزم پرتو نافي فهدخوه.
- يى كو جيپا چيىك وي چه مبالا ژى پيڤهك.
- دهما نهجلى ميرووي تى چهنگ و پهرى وي چهدين.
- چ سهرى ته ل كهفر كهت و چ كهفر ل سهرى ته كهت.
- ژ يهكى ره گوتن: نيڤى دنيايى ژ ته ره يه. گوت: ما نيڤى دن ژ كى ره يه؟
- ميڤى چى ل سهر نافي خوه تى.
- پرانى زورا ميڤانيى دبه.
- ژ خهلكى ره بههره، ژ م ره ژههره.
- كو مروڤ تايهكى ژ جلى وي بكشين وي دهه پينه ژى بكهفن.
- ههگهر تو ئههل شوغول سههل.
- كووچك دهڤل تهر يا خوه ناكه.

- بیانی، من دایی ژ جانی، داویی ژ پۆشمانی.
- کێلا بههانا ت جاری تژی نابە.
- ستریا ب دەستی م نهچنه!
- ههتا مڕۆڤ سه‌ر دهستی خوه نه‌مه‌شه، قیমে‌تا نگێ خوه نزانە.
- دنیا گوله، بیهنکه و بده هه‌فالێ خوه.
- مڕۆڤ بێ پیر وی بکه‌فه ده‌ریاکێ کویر.
- ل نالی ژێ دده، ل بزمار ژێ دده.
- نه هه‌ر گۆهتێ تێ گۆهتێ، و نه هه‌ر چیلەك تێ دۆهتێ.
- بێ ژ خوه‌دی غافله ئه‌و کافره.
- رۆڤی نه دچوو قوڵێ هه‌ژەك ژێ ب دووڤی خوه ڤه گرێدا.
- یا پیری ژ بێ کەسی.
- یا کالۆ ژ بێ نه‌فسی.
- هه‌ردوو کال هه‌ڤدوو پرسی.
- ده‌ما دزا ژ دزا دزی، ئه‌رد و ئه‌سمان له‌رزی.
- ده‌ما خولامی میر مر، خه‌لك هه‌می چوون سه‌رخوه‌شیی. ده‌ما میر ب خوه
مر کەس نه‌چوو.
- چافه‌کی چه‌مچری چێژه ژ یه‌کی کۆر.
- هه‌ر ته‌یره‌ك ب ره‌فا خوه ره‌ خویایه.
- چی کڕۆ ب خوه کڕۆ، خرابی کڕۆ ب خوه کڕۆ.
- ژ ده‌ڤه‌هی ره‌ گۆتن: تو ئافسی. ده‌ڤه‌ه گری و گۆت: باری م گرانتر بوو،
ئێمی م کیمتر بوو.

- دنيا ملڪه، مڙ دڦي هلكه.
- بازارا مائي و سووڪي ل ههڏ دهر نه ڪت.
- بهري گول بوو، باران ڙي لي هات شل بوو.
- نه خواري و نه فخر خواري، ب سميلا فخر مائي.
- تهير ل ناسيما دفره،
- دڪاره نه قش و نموشا ڙي بگره.
- دايي قه دايي
- خوهي به لايي
- ڙني وهره پشما مئي
- دا نه ز ته بگرينم ل دورا دني.
- خوه دا دڪه موو ڙي و نا قه تين.
- مالا پيري خوه شتره ڙ قه سرا ميري جيري.
- ڪيليمساسا خوه دي ڙي خه لاسي.
- دنيا ناسي مرن يه و ههر ڪهس نارد ي خوه لي دڪه.
- مروڙ ب چلڪا و حديوان ب پرتڪا.
- ههر زارو ڪهڪ ل سهر ديا خوه دگري.
- ڙنا فهديوڪ ب ڪونده ڪي يه.
- ميري فهديوڪ ب ڪونده ڪي يه.
- قهي باني مه دو بانه، ناليڪ ده شته يهڪ زوزانه؟
- ڪهني بيچارا تي ڙ قولي ديوارا.
- بهروووا ڙ قالك ي خوه دهره.

- من نهؤ پۆر نه ل بهر تافا ههيفى سېى كرىه.
- ديا كورما مال بهر ديوارا.
- كولا ئاشفانا ئاشه.
- ب خيرا لاوا دخوه حهلاوا.
- تو تير دكى و تو روھن دكى.
- قيزا بېنين ب چافى كالا، ههسپا بېنين ب چافى رهوالا.
- ئايى نهجار، ديسا رازه وه كه ههر جار، خوهدا يه كه و دهري ههزار.
- نهز ب شهؤ لى دگهرام، ب رۆژ ب دهست م كهت.
- نهز ل ئاسيمانانى دگهرام، من ل ئهردى ديت.
- تاؤ ب بېژنگى نايى فهشارتن.
- يهكى دهستى خوه د چهوالى گارس ده كر و پهنجهك ژى دهوانى و كره مهقلكى ده. دانى سهر ئاگر، ژ نشكافه بوو چقچقا وانى د مهقلكى ده. گارسين د چهويل ده ژ يين مهقلكى ره گۆتن: هوون فهيت ناكين، نهو چ رهقسا وه يه؟! يين مهقلكى ل وان فهگهراندن: ههگهر ئاگرى د بن مه ده، د بن وه ده با، هوون لبهك ب تهنى ژى د چهويل ده نه دمان.
- گيسكا گورى نه ژ سهرى كانى به ئافى فهناخوه.
- پارسهكه ب شوور و قهتتهكه.
- مال ده ب گورى ژ دهرفه به.
- ژ بهر دلؤپا چوو بهر شپكى.
- من نه مير ههيه ل ناؤ ميرا، نه گا ههيه ل ناؤ گارانى.
- دهما دكانچى خزان دبن، ل دهفتهرى كهفن فهدگهرن.

- چوونا حەممای نە وە کە دە رکەتتا وی یە.
- زێدە کرنا ھەر تشتی دەستی خوەدی دە یە، زێدە بوونا دەو دەستی دیا
من دە یە.
- ھەچی نەھا نەدە دەھا ناخوہ.
- یەکی دگۆت: فا ھرچەک.
- بی دی دگۆت: فا جھیی لنگی وی نە.
- ئەز چ دیبۆم و تەمبورا من چ دیبۆ.
- کار شیرە، دەما مەوۆ پەیی د کەفە دیی رۆفی.
- بلا دەفی گۆتتا تە نەرم بە، پشتا وی ھشک بە.
- فلانۆ نان ب گوھی خوە دخوہ.
- فلانۆ د گوھی گیی دە رازایە.
- گۆتتین ئیفارا د کەفە قوئی دیوارا.
- ھەگەر سی مەوۆفان گۆتن: کومی تە نە ل سەری تەییە، دفی تو دەستی خوە
باقیژی سەری خوە.
- سەد دۆست ھندکن، دژمنەک گەلە کە.
- ھەرە ئەدەنی، زیرا بچە گەردەنی.
- خوەدی خیرا دبن پارسەکی دەفی دیرا.
- گور دکوژن، و چەقەل دخون.
- ھەر گیاک ل سەر کوکا خوە شین تی.
- مینا ھنگفی د ئەیاری سی دە بە.
- ژ رۆفی فەنە کتر نینە و ژ ئەیاری وی ژی پرتەر نینە.

- فەقیر چوون دا خوه هلاویسن، دیتن کو زهنگین ل با دبن.
- گۆتئا کەتە نافا دەڤ و درانا، وی بگهی شههر و شههرستانا.
- ژ هنکا ره بههره، و ژ هنکا ره زههره.
- ما کا نه یا تهیه، کادین ژی نه یا تهیه.
- بلا ئافس به کهنگی به وی بزئ.
- ئاڤ ب بیژنگی نایی جفاندن.
- دهستی ترسوکا ناچه سهر سینگا گهورا.
- بی ههره دزیا هنگف، وی میش پیقه بدن.
- چیلیکی مارا بی ژههر نابن.
- چرا ل بهر کۆرا یه.
- ماستی سپارتی پسیکی.
- دین ژ خوه دین، لی بی ژ وان باوهر دکن ژ وان دینترن.
- دی و دۆهتی شهپر کر، بی ئاقلا باوهر کر.
- دی ببینه، دۆهتی لی ببینه.
- ههره ملهتا بگره ئادهتا.
- ههر تشت ژ زرافی لی مروڤ ژ ستووری دقهته.
- گولا زهرا! تو مابوو، ته ژی دا دهر.
- پیرا سباتی رابوو لقاتی.
- زهحفن لی بی نهحفن.
- یا ژ مه کیمه زهرخزیمه.
- قهی نانی گهنم ل سیویا ههرامه؟

- ھەر ئەز سىنگە كى دچكىتم، تو جھەرە كى پى ۋە دكى.
- تەماشە بەلاشە.
- فەقىر چوون دزى، ھەيف ئىقارى دەر كەت.
- فەقىر و ژار ۋە كە پار و ۋە كە پىرار.
- ئەز گا دكېم، دې گۆلك، گەنم دكېم دې شۆلك.
- تىرت جارى تىر نابن، برچى ھەر برچى نە.
- تو ب ژۆر ۋە تف كى تى سەر سىيلا، و تو ب ژۆر ۋە تف كى تى سەر رھى.
- بلا پىشتا تە ل مالى تە بە نە بەرى خەلكى.
- ھەتا ھەيە شېك و گۆرك، دەما نامىنى كۆفان و كۆرك.
- ئەولى زكى خوە تىر كە پاشى خېر كە.
- ھەر سووكەك و بازارە كە.
- روونى پايىزا بدن عەزىزا.
- كو دزى مالى ژ مالى بە، وى گۆلكى د كۆلەكى رە دەر خە.
- من گوھەك كر بېژنگ، و يەك كر سەراد.
- ھەر درانە كى وان شىكلە كى دخوە.
- گۆتەن ئىقارا دكەفن قولى دىوارا.
- كەفانى پر بوون، خوارن شەوتى.
- مالا تىر ژن، خەرابوو ژ بن.
- ژ يە كى رە گۆتن: نىقى دىنى دانە تە. د جى دە گۆت: و نىقى دى دانە كى؟!

- جهی ئاڤ لی ههیه، ئافایه.
- خوه لی وی سهری به کو ههفت سهری ژی نه عاجز بن.
- خاتوونی! مه تول ژور دیتی و ل ژیر ژی دیتی.
- فلانۆ د کهچکهک ئاڤ ده دخنقه.
- هدر کەس قازیه ژ خوه رازیه.
- دیوارۆ ژ ته ره دیبۆم، بووکی تو بهیه.
- مه مال نه کر ژ مالی پر، ئەم بکن ژ کافرێ کور.
- میڕ جو یه، ژن قافو یه.
- نه به ههڤالی دهره وینا، تی بفرۆشه جه و لقینا.
- نه روونه ل بهر دیوارا، دا هین نه بی فهخوارنا چخارا، و دهستی خوه نهخی بهریکا قالا.
- نه ئەسل کل و کلدانه، لی ئەسل تهشی و بادانه.
- سیواک و تزی و نقشت، دنیایی ناکن بوهشت. لی قهلهم و زیر و کورسی خوهشیی ددن هدر کهسی.

داوی

وہ شائین پروژین ھەئەشك و ھاریکاری یین
رېښه بهر یا گشتی یا راگه هاندن و چاپ و به لافكرنې
رېښه بهر یا چاپ و به لافكرنې - دهوك

نۆ	لايدن	نقىسەر	ناڤى پەرتو كى	سال
١.	كوربەندا سەردەم يا قوتايبيان	بەلافوكا سالانە	زمانى داىكى	٢٠١٢
٢.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	ئەمىن عەبدولقادر	تېۋر و تەكنىكىن شەرفە كرنا رۇمانى (تېۋر، گۆشى نېرىنى، مۆنتاج، دىالوگ)	٢٠١٢
٣.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	يونس احمد	رائحە الورى (قصص قصيره)	٢٠١٢
٤.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	حسب الله يحيى	الكتابه بالخبر الـبيج	٢٠١٢
٥.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	ئەدرىس عەلى دېرگۇنىكى	ئەو سىتېرا تەڤايى (ھەلبەست)	٢٠١٢
٦.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	مەمەد عەلى ياسىن	ھەڤە غەرى باى	٢٠١٢
٧.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	دەم ھات دېرەكى	Hest diaxivin (ھەلبەست)	٢٠١٢
٨.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	سەلمان شەيخ مەمى	د عەشقا تە دا (ھوزان)	٢٠١٢
٩.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	فەھىل محسن	دى رويبارەكى كەمە كلىل ژ بۇڤى دەرگەھى بى ۋەلات	٢٠١٢
١٠.	ئىكەتيا نقىسەرىن كورد/دھوك	خالد حسين	رۆزەكى ھوگۇت	٢٠١٢
١١.	كۆمەلا ھەلبەستفانين گەنج	كۆمەلا ھەلبەستفانين گەنج	داستانە كا ھەلبەسارتى	٢٠١٢
١٢.	رېڤخراوا سىما	پروفىسور د. سابەر عەبدوللا زىيارى	سىما ٢	٢٠١٢

Carek ji cara

**Hûkûmeta herêma kurdistanê
Wezaretê rewşenbîrî û lawan
Rêveberiya gştî ya ragehandn
û çap û belavkirinê
Rêveberiya çap û belavkirinê-duhok**



- Navê pirtûkê: Carek ji cara
- Nivîser: Diya Ciwan
- Babet: kurteçîrokên folklorî
- Berg û dîzayn: Mes'ûd Xalid Gulî
- Qeware: 15 × 22
- Jimara laperan: 204
- Tîraj: 500
- Nirx: 3000
- Jimara spardinê: 2218 1 sal 2012
- Zincîre: 19
- Çapxane: çapxana hewar - di hok - kurdistan
- Mafên çapê di parastîne bo rêvebarîya me û xudana pirtûkê ©

Diya Ciwan

Carek ji cara

(Pêlek ji derya pêmayê kurdî)

Kurteçîrokên folklorî

2012

Diyarî

Ji bo bavê Ciwan

Belkî,

Careke dî ji cara

Rêhme li dê û bavê hazir û guhdara

Çîroka me here deştê

Ez û tu hevdû bibînin li Buhiştê.

Diya Ciwan

Naverok

• Pêşgotnek.....	9
• Minnet.....	11
• Gundê şûz.....	13
• Sofî.....	15
• Hevaltî.....	17
• Lê ne bê mîkut.....	20
• Jineke kurd.....	22
• 'Ebbas.....	23
• Kurê ̈li ser rîya sêrtê.....	25
• Şorba nîskê (1).....	28
• Şorba nîskê (ʿ).....	29
• Mirovekî gundî.....	30
• Şivan.....	32
• Text têra me herçara nake.....	33
• Quling û rovî.....	35
• Jintî.....	37
• Her tiştê dizê ‘dimire jî.....	39
• Hisreta kanîya belek.....	41
• Behra min jî ji 'elo re.....	44

• Mirov li çi bigere dê wî bibîne.....	47
• Heyva me.....	48
• Golik.....	49
• Şah.....	50
• Xiyarê tehl.....	52
• 'Elo! teto bide babo.....	55
• Xewn.....	58
• Bext.....	61
• Bêş.....	68
• Bazirganek.....	69
• Çîroka derewan.....	71
• Derew.....	75
• Qereçî nabin xatûn.....	77
• Berx.....	79
• Şîret.....	81
• Gora bavê.....	85
• Duktur.....	87
• Ji çîrokên mîrekan.....	88
• Beşek ji gotinên pêşîyên kurdan.....	91

Pêşgotinek

Folklor, giyanê gel e, giyanê wî yê pîroz e, vejîneke ji dîroka wî re, dergehekî mezin e ji miletên din re, ku tê re derbasî hinavên vî miletî bibin, wî binasin, nasîneke xweşik û spehî ji her alî ve; hîzr û boçûn, civak, abor, huner, çande ya bi tevayî.. ûhd. Li gel ku folklor giringtîrîn regeze ji regezên dewlemdkirina semyanê çandeyî gelêrî yê jîndar re, neynikeke ji dîtina ruwê wî yê petî û ronîdar re.

Kelepûr bi tevayî -û kelepûrê devîkî bi taybetî- parçek ji vî folklorî ye, vedîtîneke ji buhredariya wî re, kolaneke di dîroka wî ya kevn de, lêgereke li dîtina rehên wî yên kûr di xakê de çûyî.

Kesê ku bi danheva vî kelepûrî rabe, roleke wî bi xwe jî xwe di hiştina bandore vî karî li yê dî -çi xwedevan, û çi guhdar- de heye, çiku danheva wî jêhatîbûneke xurt dixwaze.. Divê ku ew kes jê hez bike, karsaz û bikêrhatî be.

Di van çîrokên kelepûrî de, min ev tişt pelandin, ez hest bûm ku Diya Ciwan -bi hemû şîyanên xwe, xwe

si partiye vê babetê, ji dil û can kar jê re dike, ev yek min di derbirînên wê de derdixist, dema ku çîrokek ji wan dixwend, û pê re ji kêfa re fikir ku bifire, weke kêfa zarokekî ku bi leystikeke xwe yî nû şabe. Ne tenê weha, lê her ku xwendina wê çîrokê dubare ji fikir, her ew derbirîn li ser dêmên wê xuya dikirin.

Hêviya min ewe ku ev çîrok hin qurçik ji dîroka me ronî bikin, hin ji jiyana me, dîlpakiya me, û reseniya me berçav bike.

Fewaz fbdê

Minnet

Yek bi rêkê de çû, cilên wî pir tenik bûn, hew dî baraneke xurt lê kir. Di bin baranê de meşî. Ji nişka ve dît zilamek li mihîneke boz siwar e, bi taxim û bedl û kurk e, di ber wî ve çû û rawestiya. Jê pirsî: Tu diçe kûderê? Bersiv da: Ez diçim filanderê. Mêrkê siwar got: Ez jî diçim wî gundî. Yê siwar ji yê peyar re got: Ha ji te re vî kurkê min li xweke, ji bo tu şil nebî û ne cemidî. Mêrkê peyar sipasî jê re kir û got: Nexêr min navê. Hingî rû lê danî mêrik qebûl kir û kurk ji destan girt û li xwe kir.

Piştî demeke nêdirêj, baran sekinî. Kurkê mêrik ji xwe kir û di gel çend sipasiyan da xwedî. Lê xwediye kurk, her kêlîkê, ji mêrik re digot: Binêre, Xwedê ez ji te re rêkirim, Xwedê delîlê te bû ku tu rasta min hatî, gelo ku tu rasta min nehata û min kurkê xwe ne daba te, wê çi bi serê te bihata!?

Careke din mêrikê peyar sipasiya wî dîkir, û digot: Belê raste.

Her hinekî bi rê ve diçûn, xwediye kurk digot: Yaho, ku ne bi xêra vî kurkî ba, niha av ji cilên te diherikîn, vêga halê te

ne ti hal bû, vêga tu av û herî bû. Mêrik demekê xwe ker kir û hew bersiva wî da, heta giha dehma goleke avê. Li ser keviya golê sekinî û xwe avête nava golê. Xwe di nav de gevazt. Dema ji golê derket, tevde bû av û herî. Li xwediyê kurk nerî û got: Vêca tiştêkî te bi min re ma?.

Gundê Şûz

Her kezîzerek simbêlsorek di pişt de ye

Nav û dengê gundê Şûz bi maldarî, mêrxasî û ciwaniya kezîzerên wî belav bûbû. Cerekê birrek diz gihane hev û ji hev re gotin: Werin da em herin bigrin ser Şûz, emê têra xwe malê dinyayê bînin, û emê her yek zeriyeke jî ji xwe re bînin. Werin de em xwe bidin hev û herin.

Xwe didin hev û berê xwe didin gund. Bi rê ve, pêrgî pîreke û neviyê wê tên. Pîrê ji wan pirsî: Hûn kî ne û bi kû ve diçin? Jê re gotin: Berê me li Şûz e, armanca me jî filan tişt e. Pîrê xwe avête tor û bextê wan û ji wan re got: Hûn neviyê min jî bi xwe re bibin. Belkî hûn hinek mal bidinê û zeriyeke jî jê re bînin. Ji ber neviyê min sêwiye û ez xizan im û nikarim wî bi jin bikim.

Neviyê pîrê jî di gel xwe birin û çûn. Çûn û çûn, ta ku gihane benderê gund.

Şûzî li wan hatin hev. Beriya ku bikevin nava gund, kitek ji wan nehiştin, hemî kuştin. Neviyê pîrê girtin.

Jê pirsîn: Tu kurikî biçûkî, tu ne yê van tiştayî. Tu hatiyî çî?

Kurrik ji wan re got: Ewan ji pîrka min re gotin "Emê herin malê Şûziyan ji xwe re bînin û her yekê kezîzerekê ji xwe re bînin" ji bo wilo pîrka min ez jî bi wan re rêkirim.

Ji kurrik re gotin: De here, em te nakujin, da tu herî seranserê welatê xwe belav kî û ji xelkê re bibêjî: Raste kezîzerên Şûziyan hene, lê her kezîzerek simbêlsorek di pişt wê de ye.

Sofi

Sofi xwedî riheke sipî û dirêj bû, dirêjî û fetlên wê dighane navtengê. Sofî pir xwe bi wê rihê paye dikir, nemaze di koç û civatan de. Xelkê jî pir rêzdariya wê riha sipî digirtin. Sofî tim ew rih mîna semyanekî jî xwe re didît; her û her di civatan de bi wê dileyist, li dest û tiliyên xwe dipêça û dibir û tanî, hin caran şehek biçûk jî berîka xwe derdixist û şeh dikir, heta rojekê di civatekê de, keçîkekê jê pirsî: Apê sofî! Tu bi xwedê kî, tu bi şevê dema ku tu radizê, tu riha xwe dixî bin lihêfê, yan li ser wê dihêlî?

Apê sofî jî vê pirsê vecinîqî. Ji keçîkê re got: Xwe li min bigre, sibê dê bersiva te bidim.

Sofi bi gêjo mêjo hate mala xwe. Jina wî, zarokên wî jê pirsîn: Çi bi te hatiye? Bersiva wan neda. Tenê got: Zûka ciyê min deynin da razê.

Sofi kete nav cihê xwe. Riha xwe xist bin lihêfê de, deyaxa wî nehat. Danî ser lihêfê, dîsa deyaxa wî nehat. Heta roj li sofî hilat, xew nekete çavê wî. Sofî her wê rihê dixê bin lihêfê û dideyne ser lihêfê. Hema ku ronahiya rojê da der, da xwe rabû, ew rih da ber meqes û cûzanan, ew riha sipî mîna belekê berfa çiyayê

Herekûlê bi ser bejna Sofî de herikî û hate xwarê û li erdê belav bû li ber bayê ket. Dema Sofî li ber mirêkê li xwe nerî, nema xwe naskir, û hew karî here koçk û civatan de rûnê. Sofî bû pêtevzkê devê gundî û cîranan, bû benîşt û kete nav devê xelkê, tenê tiştê ku ji Sofî dihat ev bû; her ku li ber neynikê radiwesteha fikir niç niç û digot: Vê bêbavê çî ji min kir!

Hevaltî

Kurekî nûgihiştî birrek heval ji xwe re peyda kiribû, li nik bavê wî babeteke zor balkêş bû û gelek goman jî dikirin. Nav navna re, bavê ji wî dipirsî: Ev hevalên te kî ne? Çawa nin? Tu bi wan bawerî, ku ew heval in?. Kurik bi acizî li bavê xwe vedigerand: Belê bavo! Hevalên min çetirîn heval in.

Di ber re qerfên xwe li bavê xwe dikirin; jê re digot: Binêre bavo! Ez bi vî temenê kiçik, min hinde heval ji xwe re çêkirine, û tu xwediyê vî temenê dirêj te nikarî ji yek hevalî pê ve peyda bikî!

Heta rojekê mêrik ban kurê xwe kir û got: Tê îro bi min re bê û mala hevalên xwe nîşan min bikî û bê ku tu bi axivî û bê ku pirsekê ji min bikî.

Kurik jî got: Bila bavo!

Mêrik rabû çewalek tijî qerpel kir, û çend kevir jî kirin navê de. Piştî nimêja Eşayê ji kurê xwe re got: De bimeşe da em herin.

Mêrik rahişt wî çewalê qerpalan û avête ser piştê xwe. Kurik da kêleka bavê û meşîn. Li deriyê hevalê lêwik yê pêşî dan. Hevalê lêwik derî vekir. Xêrhatineke germ li wan da û ji wan got: Keremkin hundir.

Lê bavê lêwîk di cihê xwe de ma rawestayî û jê re got: Berya em derbasbin mal de, hacetek me heye.

Jê re got: Ha apo! Bêje, xêre?

Mêrik got: Şevê dî, diz ketin mala me, ev kurê min yê ku hevalê te ye, yek ji wan kuşt, û ev çewalê ku tu li ser piştê min dibînî, laşê wî tê de ye. Me divê îşev tu vî laşê li cem xwe bihewînî ta ku em sibehê rêkê jê re bibînin.

Lawik kete hev, û nema zanîbû çî bêje, û got: Ji bo Xwedê ji min dûr bikevin. Û derî di riwê wan de girt.

Bi vî hawî çûn mala hevalê didiwan, û yê sisiyan û yê çaran...hd. Hemiyar eynî bersiv dane hevalê xwe û bavê wî.

Mêrik ji kurê xwe pirsî: Hevalên te xelas in?

Lawik got: Belê babo!

Got: De vêca were em herin mala wî hevalê minî bi tek û tenê.

Çûn, gihan devê derî, destê xwe li derî dan. Hevalê wî derî vekir, û xwe avête dev û riwê wî, bi çend gotinên buha û rêzdar pêşwazî lê kir, jê re got: Keremke derbas be. Lê bavê kurik jê re got: Nexêr. Dem derengî şevê ye. Em derbas nabin, lê hewcebûnek me bi te heye. Xwediyê malê got: Keremke bêje. Got: Şevê dî diz hatin da bikevin mala me, û min yek ji wan kuşt. Va min laşê wî kiriye vî çewalê de, da ez îşev li ba

te bihêlim heta sibehê rêkê jê re bibînim.

Hema xwediyê malê, bê dudilî destê xwe avête çewêl û ji pişta wî anî xwar, û da pişta xwe û bire hundir, û bi lez li hevalê xwe vegera û jê re got: De derbas bin hundir, dest û riwê xwe bişon, da hûn şîvekê bixwin, niha tu pir westehayî, lê çewal û tiştê di çewêl de ne te dîtîyî û ne te kiriyî. Ew tiştê bûyî te ne dîtîyî û te ne bihîstîyî. Hemî dibe ayidê min û bi min ve girêdaye, û ez dizanim çawa û çilo bikim.

Mêrik wê çaxê bi kelogirî li lawê xwe nerî û jê re got: Kurê min! te hevaltî naskir çawaye?

Û li hevalê xwe vegera, jê re got: Ew çewalê ku te rahiştê û bir, ti laş tê de nînin, ew tijî qerpal û kevirin, tenê min xwest lawê min bizanê ka hevaltiya rast çawaye?.

Lê ne bê mîkut

Dema ku tehsîldar dihate gund, da ku bêşê ji gundiyan bistîne, gundî hemî li mala muxtêr kom dibûn, bêşa xwe didan, ji bilî mirovekî gundî ku xwe kiribû "Seyid û xwediyê keramata" pêve. Li Seyid dibûrîn. Bi tehsîldar dabûn fêmkirin, yê ku ta'îdariyê li Seyid bike, wê seyid û "Ecdadê" Seyid bi wan ve bidin û wan bikujin.

Bi vî hawî sal û meh derbas bûn, ew mamûr hate guhertin û yekî dî hate şûna wî. Gundî hemî kom bûn, mamûr navê wan yeko yeko xwend, navê Seyid jî xwend, Seyid li wê derê ne amade bû. Mêrik pirsî: Çima nehatiye? Jê re gotin: Seyid jî bêşê me'îfî ye. Mêrkê tehsîldar got: Ez vî tiştî nizanim. Divê were ew jî weke gundiya, bêşa xwe û kufletê xwe bide.

Gundî neçar bûn, rêkirin pey Seyid, ew û kurê xwe hatin civatê. Dema doza bêşê li Seyid kirin, aqîl di serê wî de nema. Hingî gef li Mamûr kirin: Ezê bi te ve bidim, wê Ciddê min bi te ve bide. Mêrik got: Ez zîlamê dewletê me, ez va tiştê nizanim. Ez îşev li gund im, muhlet heta sibehê bi te re ye; ku tu jî mîna van gundiya bêşa xwe bidî.

Kurê Seyid dît ku wê bavê wî jî bêşê bide. Ya ji wê muhîmtir wê bavê wî jî bibe mîna mirovekî gundî, êdî kes ji bavê wî natirse û hesaba nake. Kurik ma şiyar û pir fikirî. Got: Divê ez tiştekî bikim. Rahîşte mîkutekî û çû kete wê gova ku mihîna tehsîldar tê de ye. Mîkutek li ehniya wê da. Mihîne ne da û ne stend, di cih de mir, û hêdîka kurik vegera malê û kete nav cê xwe, bêyî ku kes lê hay bibe.

Serê sibehê, Seyid û kurê xwe jî, çûn bêşa xwe dan. Mêrik taştîya xwe xwar, û çûn da mihîna wî jê re bînin, da here ser oxira xwe. Çi bibînin, wa mihîn di govê de mirî ye. Gundiya hemiya jê re gotin: Ev ji ahê Seyid bû. Kezeb li mamûr qetiya. Rêkire pey Seyid û kurê wî. Perê wî lê vegerandin. Destê wî maçkir û danî ser serê xwe, lêbûrîn jê xwest, û got: Ya rebbî tu zarokên min biparêzî.

Seyid dîsa geş bû û jê re got: Min ji te re got "Kes nikare bela xwe li min xê, ciddê min ji wan re qebûl nake". Kurê seyid hêdî hêdî bi xwe re diaxifî û digot: Babo wele tu rast dibêjî lê ne bê mîkut.

Jineke Kurd

Jineke Kurd bi du cana bû, di meha xwe ya dawî de, ku zikê wê li erçena wê diket. Hew dîtîn êvarekê mihvanekî wan hate mal de. Piştî şîva mihvan danê bi qederekê, mêrik ji jina xwe re got: De here şebeşekî ji me re bîne da ez û mihvanê xwe bişkînin û bixwin.

Jinik çû rahişte şebeşekî mezin, û anî li ber mêrê xwe û mihvan danî. Mêrik go terq terq destê xwe li şebeş da. Jê re got: Hirmet, bi xwedê ev şebeş kal e. Ka were vî bibe, yekî dî bîne.

Jinikê hêdîka û bê deng hat rahişte wî şebeşî bir û yekî dî anî.

Heft caran jinikê şebeşek dibir û yek tanî. Dawiyê de mêrik ji mihvanê xwe re got: Tu dizanî! Bi xwedê ji vî şebeşî pêve di mala me de nîne.

Ebbas

Li gundê me, kurikek hebû navê wî Ebbas bû. Ebbas ji biçûkahiya xwe de ne meşî û bi rêve neçû, û hem jî yekane bû ji dê û bavê xwe re. Lê tevî wê rewşa xwe jî, her sibeh bi çalepka, ji sibehê heta êvarê, ji malê derdiket û diçû nav zaroka dilîst. Ew jî mîna hemî zarokên gund diçû, dihat, bi wan re dilîst, lê li ser çarpîka bi erdê ve dixuşiya. Lê carna xwe di listikê de jibîr dikir, hew didît ko tarî kete erdê, û zarok hemî dibezîn diçûne malên xwe. Ebbas dima di cihê xwe de rûniştî, heta ko dihate bîra diya wî diçû lê digeriha, radihiştê û ew tanî.

Temenê Ebbas di nehsaliya xwe de bû, rojekê mîna hemî rojên dî, di nav zarokan de, li serê şêrhê, dilîst. Dem zerekroj bû. Tariyê hêdî hêdî xwe berda erdê, ji nişkê ve, zarokan hemiya dan ber qîra û gotin hev:

- Bazdin, va garan ji wir ve tê, wê çêleka hêç, pêl me bike..

Ebbas hew dît ko zarok hemî ji dorê çûn, ew ma bi tenê. Dît ko garan jî ji wir ve tê, li dora xwe nerî, dît ko cîrana wa ji kaniyê tê, û berê wê li malê ye. Ebbas bang li wê kir:

- Xaltîkê! Tu bi Xwedê kî, tu bilez here mala me, ji diya min bêje: Ebbas li serê şêrhê ye, bin xwe gemar kiriye, û wa garan jî ji wir ve tê, bila bê min bibe, hey nexwe wê çêleka hêç pêl min bikê.

Jinikê jî lê vegerand û got:

- Ebbas! Hey rihê xaleta xwe, hewqas zimanê te dirêje, de bide xwe û rabe bimeşe. Bi xwedê ez neçûm û min ji diya te re negot. Bila hema çêlek pêl te bikê û diya te ji te xilas bê.

Jinik meşî û çû. Ebbas li hawêrdorê xwe nerî, dît ko li kolana jî kes nemaye. Ji alîkî dîve dît ko garan hêdî hêdî nêzîkî wî dibû. Ebbas mirina xwe di bin simên çêlekê de tanî ber çavê xwe. Bê goman Ebbas bi xwe jî nizanî çilo û çima da xwe û bezî, û bê rawestan, ta ko giha malê û xwe avête sînga diya xwe.

Korê li ser riya Sêrtê

Li gundên Kurdistanê, her dawiya payîzê, ji her malekê mirovek yan du mirov diçûne bajêr, da pêdiviyên xwe bênin berya ko berf bê û rê û rêbar bêne girtin.

Rojekê, di dawiya werzê payîzê de, mêrik û jina xwe, barek mewîj li kerê xwe kirin û berê xwe dan bajarê Sêrtê, da ko mewîjan bidin bi caw û hinek pêdiviyên xwe. Piştî qederkî çûn, di nîvê rê de, rasta mirovekî kor hatin. Dîtin ko teqereqa çovikê wî ye, li kevir û kortikan dilukume. Mêrik û jina xwe ji yê kor pirsîn:

- Tu diçî kûderê?

Mêrik got:

- Ez diçim Sêrtê.

Wan jêre got:

- Em jî diçin bajarê Sêrtê. De were da em te jî bi xwe re bighînin bajêr.

Mêrkê kor bê dudilî bi wan re bû heval û çûn. Piştî demekê mêrik ji jina xwe re got:

“Tu ji navbara kerê peyar be, emê vî ciwamêrê kor siwar bikin”.

Jinik peyar bû, wê û mêrê xwe bi destê koro girtin û li kerê siwar kirin. Hersêka riya xwe berdewam kirin. Bi rê de yê kor dest bi pirsê kir:

“Navê te çiye? Navê jina te çiye? Barê kerê te çiye?”

Mêrik jî bersiva hemî pirsên wî bi duristî da. Bi riya xwe de çûn ta ku gihan destpêka bajêr. Ji yê kor re gotin:

- Va em gihan qonaxa xwe. De vêca peyar be, da em jî herin bi karê xwe ve.

Hew dîtî ji nişkave Koro kir qîr û hewar. Xelk li xwe civandin. Xelkê pirsî: «We çi ji vî mirovê hafîz divê?!» Mêrkê kor rê neda yê dî û got:

- Ez mirovekî hafîzim, ev pîreka ha jina min e, ev jî kerê mine, navê jina min eve, û barê kerê min jî mewîje. Ev mirovê ha bi rêve rasta me hat, hevaltiya me kir, xuyaye ew û jina min li min bûne yek. Dixwaze jina min û kerê min jî ji min bistîne.

Yanî çîrok serûbin kir û berûvajî vegerand. Çîqa mêrik û jina xwe bankirin û sûnd xwarin, mêrik got: “Ev jina min e û ev kerê min e.” Lê gotinên wî bê encam bûn. Xelkê hemî ji yê kor bawer kirin û ji wî û jina wî bawer nekirin. Xelk bi dar û kevir û xeberan bi mêrik ketin, digotin: “Ev feqîr kor e, tu dixwazî jin û kerê wî jê bistîni”.

Di wê qelebalixê de polîs hatin. Mêrik û jina wî girtin û birin. Yê kor bi tenê ma. Polîsek tenê li ber wî hiştin bêyî ko haya wî jê hebê. Ji wî hebû ko dengê wî naçe kesî; di ber xwe de digot:

“Bi xwedê heger jinik û ker gihane min, fitlan û fit, heger yek ji wan bighê min ji xwe fit.”

Di cih de ew polîsê nobedar bi qirika wî girt, û li ser gotinên wî bû şahid. Ji nûve jinik û kerê wî lê vegerandin û lêborîn jê xwestin. Lê berya mêrik bi rê bikeve û biçe, li yê kor vegeriya û got:

- Ezê ji bo xwedê şîretekê li te bikim: Tu vî tiştê ku bi me re çêbûyî ji ti kesî re nebêje, ji ber heçî bibhîze hew rehmê li koran dike. Bê goman kor hemî ne mîna te ne.

Şorba nîskê (1)

Mirovek çû mêvandariya malekê. Serê sibehê, ew û xwediye malê rûniştin li ber sifrê li hêviya taştê. Piştî demeke ne dirêj, kebaniya malê beroşa nîskê anî, valakir legenekê û danî ber wan. Mêrkê mêvan yek nekir dido bi lez rahişte kevçikê xwe û di nîskê ve kir, dagirt û bi ser xwe de kir. Û pêre ziman û gewrî hemî lê peritîn, nema zanîbû wê çi bike. Daqurtênê bila qirik û hinav bişewitin, yan jî ji devê xwe vegeirîne û valake bergeşê û xwe bihetikîne!. Hema bû xerxera wî û berê xwe bi jor ve kir. Şorbe di devê xwe de bir û anî.

Xwediye malê zanî ku çi bi serê mêvanê wî hat. Jê pirsî:

- Mêvanê delal, xêre? Tu çima bi jor ve di nêrî?

Mêvan jî neçarî şorbe daqurtand û ji xwediye malê re got:

- Ezbenî, min dixwest ez ji te bipirsim; ka te ev beş û kijûlek çawa çêkirine?

Xwediye malê lê vegeand û got:

- Mêvanê hêja, çêkirina wan beş û kijûlekan pir bi hêsan çêbûne, tenê min ew bi hinek deyx û du pifa çêkirine.

Şorba nîskê (2)

Rojekê mirovek û kurê xwe, çûne mêvandariya malekê. Xwediya malê taştiya wan şorba nîskê çêkir. Dema beroş ji ser tîfîkê danî yekser vala kir legeneke kûr de û danî ber wan. Kurik xwe negirt, hema destê xwe avête kodîn dagirt ji nîskê û bi ser xwe de kir. Ji germiya nîskê dev û gewrî hemî lê şewitîn. Ji ber êş û şewatê yekser rondik ji herdu çavê wî barîn û bi ser hinarkên ruwê wî de hatin xwar. Hîn bavê wî dest bi xwarinê ne kiriye, li kurê xwe nêrî û jê pirsî:

«Kurê min, xêre? Tu çima digrî?»

Kurê wî lê vegerand û got:

«Bavo bi xwedê ew birayê min yê wê salê mirî hate bîra min, û kela girî li min da û ez girîm».

Bavê kuruk jî di pey wê gotinê kevçîkê xwe di bin şorba nîskê dakir û bi ser xwe de kir. Agir û pêt bi devê bavê jî ket. Hêsiya bi sê rêze ji çavê bavê wî jî dan pey hev. Kuruk jî ji bavê xwe pirsî:

«Bavo, tu li ser çi digrî?»

Bav lê vegerand û got:

«Kurê min! xwezî ez li ser te bigirîma berîya birayê te».

Mirovekî gundî

Beriya nimêja nîvro, zilamek çû ser kevîrê nivê hola gund⁽¹⁾ de, şipya sekinî û bang gundiyan kir:

- Heware gundîno heware. Heware gundîno heware.

Gundî hemî ji malên xwe derketin, hûr û gir, biçûk û mezin, jin û mêr, pîr û kal. Hemî li hola gund li dora mêrik kom bûn. Mêrik pirsî:

- Gelo kes di mala xwe de nemaye?

Jêre gotin: Nexêr. Hemî amade ne.

Mêrik dest pêkir û got:

- Vê sibehê zû ez ji xew rabûm. Min taştîya xwe xwar û cilê xwe li xwe kirin, min kerê xwe em û av kir û aqûl lê kirin, û min berê xwe da çiyê. Li wir min darê xwe berhev kirin, û li kerê bar kirin, bi werîs şidand, û min berê xwe da malê. Bi rê de, dema ez giham newala Girkê zêra, kerê min şemitî “tîhisî”, kete nava herî û çamûrê. Hêdî hêdî di nav de çû xwar, min barê êzinga ji ser piştê wî avêt. Min carna guhê wî dikşand û carna dûvê wî. Lê feyde nekir. Berf heleha bû û çamûrê zora min û kerê reben herdûka bir. Kerê min di nav de noq

⁽¹⁾ Tehteke (lat) mezin di nivê hola gund de ye. Ew lat cihê komkirina gundiya ye di çêbûna bûyerek giring de.

bû û mir. Min bi dilekî kul û dehê bi kovan dev jê berda
û berê xwe da malê, û ez hatim.

Bi vê gotina dawî re rawesta û bêdeng ma. Hîn xelkê
gund li hêviyê ne ka wê çî bêje. Bi hev re bang kirnê:

- Ê.. ê.. ê.. ê.. Çî çêbû? Dê tê çî bibêjî?

Mêrik li wan vegerand û got:

- Hew, ev bû ya min ji we re gotî.

Xelkê kirin niç niç, destên xwe li hev dan û serê xwe
hejandin. Gotin:

- Hema ev bû? Te em hemî ji bo vê yekê li vêderê
kom kirin? Ma hêjabû em hemî dev ji kar û malên xwe
berdin û werin?

Mêrik li wan vegerand û got:

- Belê hêjabû. Ma ez valame ji niha û çar salên dî, çî
yekî gundî bighê min û ji min bipirse: Ka kerê te çawa
mir?

Şivan

Şivanekî kara xwe kir da biçe Hecê. Beriya bi rê bikeve, pezê xwe hemî kom kir û ji wan re got:

- Baş li min guhdar bikin, va berê min ketiye Mala xwedê, eve çendik û çend sal ku ez û hûn bi hev re ne, ez dizanim ku min gelek te'darî li we kiriye, min gelek li hewe daye, min gelek cara simik û sitirhê hewe jî şikandine, û min zarokên hewe jî gurandine, lê bê goman ez jî bi were westehame û ji bo hewe şiyar mame, vêca heger ku hûn li min nebûrin, Hec a min qebûl nabe.

Bi vê gotinê re şivan rawesteha, pezê wî hemiya li hev nerîn û berê xwe danê û bi yek dengî jê re gotin:

- Belê ev tiştên ku te gotin hemî jî rastin, û em ji bo van hemiyan jî li te dibûrin, lê yek tişt bi tenê heye ku em li te nabûrin.

Şivan di cihê xwe de cefilî û kete hev, pirsî: Gelo ew çiyê?!

Pezê wî lê vegerandin û gotin:

- Te ev kerê ha, zengil dikir û sibeh û êvara dida pêşye me, û me jî ji neçarî situwê xwe xwar dikir û dida pey wî, te dizanî jî ku em hemî ji wî zanetir bûn.

Text têra me herçara nake

Zilamekî bî bi jineke bî re şû kir. Ji hev re gotin: Halê me herdûka mîna heve, emê herdû jî bi hevdû bisitirin. Piştî demeke ne dirêj, her ku mêrik ji derî ve bihata, û tiştin pê re bana, jinikê qîma xwe pê netanî. Heger mêrik kîlok goşt banya, jinkê digot: Hooo, mala minê! Rehmetî şeqa pezekî tanî.

Heger kîlok mast banya, wê bigota: Hooo, mala minê! Rehmetî bi sîtila tanî.

Heger kîlok dims banya, wê bigota: Hooo, mala minê! Rehmetî bi dena tanî.

Mêrik jî ji aliyê xwe ve teksîr nedikir. Jinkê çi bikira û çi çêkira ewî jî qelf û rexne lê dikir. Dema ku xwarinek didanî ber, digot: Hooo, ka xwarna rehmetyê!

Dema ku mal paqij dikir, digot: Hooo, ka paqijya rehmetyê!

Dema ku cil dişûştin, digot: Hooo, ka şîştina rehmetyê!

Her wê digot "rehmetî", û her wî digot "rehmetyê". Heta rojekê mêrik bankire jinikê got: Hermet ka were rûne û li mi guhdarî bike.

Jinik hat rûnişt û got: Belê bêje ez guhdar im.

Mêrik jê re got: Were emê hevûdû berdîn.

Jinkê xwe hilanî û li erdê da, got: Wa pepûkê! Wa kezîkurê! Qey çi bûye? Çi qewimiye? Çilo emê hevûdû berdîn? Ser çi? Ji ber çi? Hîna ne bûye çar mehê me! Vê gohtinê ji serê xwe bavêje.

Lê mêrik ji ya xwe nehate xwarê, got: Hermet, divê em hevûdû berdîn, ji ber ku riya me her çara li ser textekî nîne.

Quling û Rovî

Rojekê rovî û quling rasta hev hatin. Rovî ji quling re got: «De were ezbenî, ez û tu destê hevaltiyê bidin hev. Emê dawiyê li dijminatîya di navbera bav û kalên xwe de bînin». Quling got: «Bi Xwedê tu rast dibêjî. Ez bi xwe ji bo peymanî aştîyê di navbera min û te de amade me». Rovî got: «De were di destpêkê de hevdû biezimîn ser firavînê, da ku nan û xwê di navbera me de çêbibe, û dilê me li hevdû vebe». Rovî pêde çû got: «Bila cara pêşiyê dora min be». Quling got: «Belê, weke tu zanî». Roviye gewr, dem û cih destnîşan kir. Quling çû ser firavînê. Dît ku rovî pelûleke ruhî çêkiriye, û li ser tehtê belav kiriye. Qulingê reben çendî nikilê xwe lêda, lêda, lê tiştê neke nav nikilê wî. Quling serê xwe hejand, çîrok naskir û birçî vegereha malê. Tevî wê jî sipasiya rovî kir, û jê re got: «Sibehê tu li ba minî». Pelûla rovî hemî jê re ma. Bi keyf hemû alîst û simbelên xwe jî talîst û paqij dikir. Serê xwe jî pê re dihejand û digot: "Da tu bizanî kes bi min nikare!".

Roja dî nîro, rovî çû ser ezîma quling. Dît ku quling hinek nok û garis kelandine, ew li nav qelşên teht û

latan belav kirine. Ji rovî re got: «Keremke ser fîravînê». Rovî çendî hewl da, lê nikarîbû libekê tenê jî bixwe. Quling jî li ber çavê rovî bi wî nikilê xwe yê dirêj nok û garisê xwe libo libo deranî û xwar. Careke dî her yekî pişta xwe da yê dî û her yek bi alîkî de çû. Ji lewra her ku dido bi hev re ne rast bin, dibêjin hevaltiya quling û roviye!

Jintî

Dû bira hebûn. Herdûka bi hev re jin anîn. Jinên wan jî bi hev re bi dû canan bûn. Herdû bira soz dane hev û gotin: «Heger zarokên me, yek keç be û yek kur be, emê wan bidin hev, angû; li hev mehr kin». Xwedê weha çêkir ku herdû bira di bûyerekê de mirin, berya ku zarokên xwe bibînin. Piştî wan herdû jintiyan jî peyman dane hev ku li ser soza mêrê xwe bimînin. Piştî çend meha, herdûka barê xwe danîn. Yek kur bû û yek keç bû. Herdû jintiya jî bi kul, bi xem, û bi keser zarokên xwe xwedî kirin. Her çendekî soza rehmetiyan nuh dikirin, heta emrê zarokan bû çarde sal. Keçik pir xweşik û girs xuya dikir. Kurik hîn kiçik xuya dikir. Weke ku dibêjin: «Keçik zû mezin dibin, û kurik hêdî hêdî mezin dibin». Xwazgîniyên keçikê diçûn û dihatin. Heroj piyanek şorav dikete dilê diya kurik. Ji diya keçê re digot: «Çawa tu dihêlî xwazgîniyê keçê te bîn? Qey te peymanê di navbera bavên zarokan de jibîr kiriye?». Heta carekê xwazgîniyekî maldar aqilê diya keçê ji rê bir û jinikê keçê xwe dayê. Diya kurik girî, kenî. fêde nekir. Herdû jintî bûne dijminên hev. Diya keçikê –li ber çavê diya kurik- da, bi şîranî, xelat û

rehel. Piştî demeke kurt, bi lez û bez daweta wê çêkir. Zêr û zîv bi keçê û diya wê de dibarîn. Diya keçikê dixwest diya kurik biqehêrîne, derdiket devê derî, bi dengê bilind distira û digot, deng dibir diya kurik:

Havîne next vebire

Mecîdiya gire gire

Xwelî li serê dê û kur e.

Diya kurik hêsirên xwe dibarandin û bê deng kurê xwe xwedî dikir. Sal çûn, sal hatin. Kurik mezin bû. Rih û simbêlan riwê wî tijî kir. Dem payîz bû. Zêr û mecîdiyên diya keçê jî neman. Diya kurik cuhtek ga ji kurê xwe re kirî. Nêr û haletê bavê wî jî derxist. Kurik nêr û halet danî ser milê xwe, û cotê ga jî dane pêşiya xwe. Berê xwe da erdê bavê xwe, da ku bajonê. Vê carê dayika kurik çû devê derî û bi dengê bilind, da ku dengê wê here diya keçê, bi stiran weha got:

Pahîze çaxê cot e

Nêrê lawkê min ji kevot e

Xwelî li serê dê û dot e.

Her tiştê dizê, dimre ji

Mirovek çû mala cîranê xwe, beroşa wî jê xwest. Jê re got: Cîran! Bi xêra xwe beroşa xwe bide min, da ku ez xwarinê tê de çêkim, ji ber ku mêvanên min hatine û beroşa min kiçike têra wan nake.

Cîranê wî jî nemerdî nekir. Yekser bezî çû beroş anî û da cîranê xwe, di gel çend gotinên xweş.

Mêrik rahişte beroşê bir û çû. Lê demek dirêj pêve çû û mêrik beroş venegerand. Xwediyê beroşê çû devê deriyê cîranê xwe û jê re got: Cîran ka bi xêra xwe beroşa min bide min!

Cîranê wî jê re got: Cîran! Ez li bextê te û Xwedê me tu bihna xwe li min fereh bikî. Bi Xwedê beroşa te zaye û beroşeke biçûk aniye. Hema çend rojan xwe li min bigre, ezê beroşê bi çêlîka wê ve ji te re bînim.

Xwediyê beroşê kêf kir û got: De bila cîran!

Berê xwe da malê û çû. Di dilê xwe de digot: Bi Xwedê evê bê hiş wê dû beroşan bide min.

Piştî demek kete wê navê, mêrik dîsa çû û got: Cîran, ji kerema xwe re, ka herdû beroşên min bide min.

Mêrik lê vegerand: Bi Xwedê divê dîsa tu bihna xwe

li min fereh bikî, ji ber ku beroşa te dîsa welidiye û beroşeke kiçik aniye. Hema piştî demeke ne dirêj were hersê beroşên xwe bibe û mala te ava.

Dîsa xwediyê beroşê bi kêf vegeriya mala xwe.

Weha çîqa çû dixwest, jê re digot: Beroşê zaye. Heta bûne deh beroş.

Rojekê xwediyê beroşê jê re got: Cîran ka her deh beroşên min bide min.

Cîranê wî lê vegerand û got: Erê bi Xwedê, deh beroşên te li ba min bûn, lê mixabin û sed mixabin, ez vê sibehê ji xew rabûm min dî ku her deh beroş bi hev re mirine.

Xwediyê beroşê xwe hilanî û li erdê da: Ev tu çi dibêji? Tu dixwazî her deh beroşên min bidî mandelê. Zû her deh beroşên min bîne. Hey naxwe ez zanim ez çi ji te bikim.

Dîsa mêrik lê vegerand: Ez ji te re dibêjim beroş hemû mirin û vê sibê min bi destê xwe ew hemû veşartin.

Xwediyê beroşê jê re got: Zû bîne ma tê henekê xwe li kê bikî? Kê dîtiye ku beroş bimrin?!

Cîranê wî lê vegerand û got: Belê ezbenî, xebera te ye, lê tu nizanî her tişta ku dizê dimre jî.

Hisreta kaniya belek

Dibêjin mirovek çû Oropa. Hîn xortekî biçûk bû. Li wir xwend û şuxulî û mezin bû. Hingî xortekî taze bû, mirovekî maldar ew himbêz kir û keça xwe dayê. Ew kire qesrekê û hingî divê pere danê. Jina wî jî pir jê hiz dikir. Sal û dem pê ve çûn, zarokên wî çêbûn. Yê ku lê binerîya wê bigota ev melikê zemanê xwe ye, lê seranserê jiyana wî, xemgîniyê di reng û ruwê wî re xuya dikir. Jina wî pêdizanî ku derdekî wî heye. Rojekê jinik pê re rûnişt û jê pirsî: Ez dizanim derdekî te heye, ka ji min re bêje derdê te çiye? Mêrik çiqa xwe virde wired da, lê jinê jê ne qerîya. Heta mêrik jê re got: Bi Xwedê raste, derdekî min heye. Ez ditirsim, ez bi wî derdî bimrim û ew hisret bi min re here gorê. Jinikê jê re got: Ez di bextê te de me tu ji min re bêjî, belkî ez çarekê ji derdê te re bibînim. Mêrik jê re got: Ez bi hesreta dîtina kaniya belek im. Kaniya belek, ew kaniya gundê me bû. Çiqa tê bîra min, ez ji derdê dîtina wê dihelim. Her ez mezin dibim, zehftir meyla wê li min dide.

Roj bi rojê, seheta mêrik bi şûnde veqerîya. Heta jinik tirsîya ku mêrê wê ji qehra bimre. Ji mêrik re got:

Xwe hazirke, emê herin welatê te, ji bo ku tu dîsa kaniya belek bibînî.

Mêrik bi vê gotinê re şa bû û beşîşî. Ruh pê ve hat û jê re got: Kengî?

Jinikê jê re got: Ez hemi tiştên lazim amade dikim. Hew dî rojekê jina wî jê re got: Emê îro bi rê Kevin, herin welatê te. Ezê jî bi te re bêm ez jî dixwazim kaniya belek bibînim. Jinikê tiştên lazim, ji mal, ji cil û xwarinê tirimbêla xwe dagirt û mêrê xwe li teniştê xwe siwar kir û berê xwe dan welatê mêrik.

Sê rojan bi rê ve man. Her ku nêzîkî cê xwe dibûn rengê mêrik geştir dibû. Bi çî hawî, di nava çirav û toz û heriyê ve gihane gundê wî. Berê xwe dan mala ehlê xort. Jinik çî bibîne, dît ku pîreke diya wî xizan, porsipî, jihevketî, ku êm dide mirîşkên xwe. Pîrê çû xwe avête kurê xwe. Hevdû maç kirin û hembêz kirin. Jina mêrik ma şipya. Cihek paqij nedît ku li ser rûne, lê ne xema wê bû. Ew li hêviya dîtina Kaniya belek bû, ew kaniya ku huqa salan mêrê wê li ser digrî.

Piştî ku wî û diya xwe baş kêfxweşî li hevdû dan. Jinikê jê re got: De were bikeve tirimbêlê da em herin ser Kaniya belek.

Bi eşqek nayê gotin, mêrik berê xwe da Kaniya belek.

Dema gihan ser kaniyê, jinikê dît ku kaniyek bi qasî

tifikikê ye, golikek biçûke, avek hindik jê dizê, li binê dareke yekane ye, çend kevir li dora wê ne, mêş û kelmêş tên jê vedixwin. Mêrik destê xwe kir nav wê ava şêlo de, jê vexwar, dest û riwê xwe pê şûşt, berê xwe bi asîman ve kir û sipasiya Xwedê kir, ku careke dî Kaniya belek dît, û ji keyfa sere xwe danî ser kevirekî ji yê Kaniya belek û di xew ve çû. Dema baş xew lê giran bû. Jinikê ew hişte ser Kaniya belek û kete tirimbêla xwe û berê xwe da welatê xwe. Namek jê re nivîsî, tê de danî:

Li pey min newe. Tu tenê ji Kaniya belek re başî.

Behra min jî ji Elo re

Dibêjin zilamek hebû bi jina xwe nerazî bû, her û her gazin jê dikirin, digot: Jinên dinyayê hemî ji te zanatir in. Ez mirovekî bê şens im. Divê ez careke dî şensê xwe biceribînim, ango jineke dî ji xwe re bînim.

Heta giha radeyekê hew karîbû li jina xwe binere. Hema da xwe rabû û ji malê derket. Berê xwe da çol û beyaran. Gundê pêşî hate rasta wî, go bi Xwedê ezê li vî gundî bibim mêvan, belkî ez jinekê ji xwe re li vir bibînim. Dema kete nava gund, deriyê pêşî hate rasta wî lê da. Xwediyê malê derî jê re vekir û gelekî qedrê wî girt, ew danîn serê malê, û malî hemî li dorê civiyan. Mêrik ji wan re got: Navê min Elo ye û ez li jinekê digirim.

Dît ku keçeke wê malê pir xweşik heye. Elo çavê xwe berda keçe. Hema yekser ji bavê wê xwest. Bavê wê jî –bê dudilî- got: Min keça xwe da te.

Bû çaxê firavînê. Firavîn danîne erdê. Kuflet hemî hatin li dora firavînê rûniştin. Keça hatiye xwestin xwe da alîkî, got: Behra min ji Elo re. Dê jî xwe da alîkî, got: Behra min ji Elo re. Bavê jî xwe da alîkî, got: Behra min ji Elo re. Xuh û bira jî xwe dan alîkî, gotin:

Behra me ji Elo re.

Piştî ku Elo têr xwar û xwe da alîkî, dergistiya Elo rahişte cerê xwe û çû ser bîrê, da ava cemidî ji dergistiyê xwe re bîne, lê keçik pir domkir û venegeriya. Dayika wê li pey çû da binere ka çi bûye? Dît ku keça wê li ser keviya bîrê rûniştiye û digrî. Jê pirsî: Keça min xêre? Çi heye? Got: Yadê, ez hatim da ez avê ji bîrê bikşînim, min dît ku kulîlkek di keviya bîrê de şînhatiye, ji aliyê hundir ve. Bi Xwedê ez pir tirsîha me, dema ez şû bikim, wê kurek ji min re çêbibê, û ezê bême malbava, wê kurê min bi min re bê ser bîrê, û vê kulîlkê bibîne, xwe bitewîne û destê xwe bavêje vê kulîlkê û di bîrê werbe. Dê jê re got: Bi Xwedê keça min, heqê te heye. Dê jî li tiniştê rûnişt û girya.

Dema ku dê û keç venegeryan, bav jî bi dû wan de çû. Dema ku çîrok ji bavê re gotin, got: Bi Xwedê heqê we heye. û ew jî li tinişt wan rûnişt û girî.

Dema ew nehatin, xuh û bira jî tev bi dû wan de çûn. Dema çîrok bihîstin, ew jî li kêlek wan rûniştin û girîn.

Elo bi tek û tenê li malê ma. Gelekî çavê wî li rê ma, heçî çû venegera. Ji xwe re got: Bi Xwedê tiştêkî gelekî mezin bûye. Da xwe rabû, berê xwe da bîrê. Çû, çi bibîne!! Ku wan xwediyên malê hemî bi rêz li dora devê bîrê rûniştîne, bi hev re û bi dengê bilind digrîn. Dema ji wan pirsî: Ka hûn çima digrîn. Jê re gotin: Hal

û qiset eve.

Pora serê Elo ji ecêba şîpiya sekinî. Hema hêdîka û bê ku yek gotinê bêje, bi şûn xwe de vegeriya. Berê xwe da mala xwe, û jin û zarokên xwe. Ji xwe re digot: Hey gidî, ev tiştên wilo jî li dinyayê hene! Ev gundê pêşî bû ku min ev ecêb lê dît, gelo ez wirdetir biçûma minê çi bidîta!?

Mirov li çi bigere dê wî bibîne

Dibêjin mirovek gundî çû Bexdayê. Dema vegeriya, gundî hemî çûn serdana wî. Jê pirsîn: Ka te çi li Bexdayê dît? Mêrik dest pê kir û got: Xwedê Bexdayê xira bike. Hemî bûye cihê fîsq û fesadê. Tu çawa dilebitî tu rastî xirabiyê tê. Hema tiştê min dît Xwedê neke hûn bibînin.

Piştî çend rojan, mirovekî di çû Bexdayê. Dîsa gundî hemî çûn civata wî, da ku ji wan re behsa Bexdayê bike.

Mêrik destpêkir û got: Xweda tu Bexda ava bikî û ava bihêlî! Ku mirov pêl axa Bexdayê dike, mirov diçe dinyake dî. Hemî xêr û berekete. Cihê nimêj û îbadetê ye. Her enîşkekê mizgeftê lê ye. Tu xizan û maldaran ji hev nas nakî. Xwedê dîtina Bexdayê bike behra we hemiyan, weke ku min dîtî.

Mirovek di civata yekê û di ya dudiwa de jî rûniştî bû û her guhdarî dîkir. Hema ji nişka ve da xwe rabû şîpya û got: Yabo Bexda her ew Bexda ye, lê bi Xwedê xuyaye ku mirov li çi bigere dê wî bibîne.

Heyva me

Carekê jinek çû ser bîrê da avê bîne. Serê xwe daqûl kir û dewla xwe berda bîrê, berî dewla wê bighê binê bîrê, li ava bîrê nerî dît ku heyv di bîrê de xuyaye. Jinik pir li ber xwe ket çawa heyva me ketiye bîrê. Divê ez wê ji bîrê derxim. Bihtirî bîst caran dewla xwe dadiheland bîrê û dikişand, ava wê dirijand. Lê dîsa dema li binê bîrê dinerî didît ku heyv hîn têdeye.

Piştî vê yekê, dîsa dewla xwe dadheland binê bîrê, û kişand, lê hilnekişiya; xuyaye li kelemekê alihabû. Jinikê bi hemî hêza xwe werîs dikişand û dikişand heta ku dewl bi lez bi destê wê ve hat û hilkişiya. Jinik bi piştê ve ket û gurmînî jê hat. Li ser piştê, çavê wê li asîman li heyvê ket, dît ku wa li jore. Jinik –tevlî rehtiya xwe- pir şabû, û sipasiya Xwedê kir û got: Min heyva xwe ji binê bîrê derxist, û wa çû cihê xwe.

Golik

Mirovek bi rêwingî çû gundekî, li malekê bû mêvan. Wê şevê li wir ma, serê sibehê, berya ku xatir ji xwediye malê bixwaze, keça xwediye malê kete hundir û ji bavê xwe re got: Çêleka me ketiye ber zanê.

Xwediye malê li keçikê vegerand: Bila babo! Ê got: Soz be, heger ku golka çêleka me mê be, dê wê bikim diyariya mêvanê xwe yê ezîz.

Mêvan beşîşî û ev gotin nekir tiştek. Xatir ji xwediye malê xwest û çû ser oxra xwe.

Pişî demeke dirêj, hew dît ku carekê li deriyê wî ket. Çû derî veke, çi bibîne!! Dît ku garanek dewar li pişt deriyê wî ye. Ji gavan pirsî: Ev çi ye?

Gavan jê re got: Ma tu ne filankesî? Got: Belê.

- Tu filan salê, li filan gundî, li filan malê nebûyî mêvan?
- Belê.
- Dema çêleka wî kete ber zanê, xwediye çêlekê negot: "Heger golika wê mê be, ewê diyariya tebî?". Ew golik mê bû, û ev garan hemî ji wê golikê zêde bûye. Ango ev garan hemî ya te ye.

Şah

Belê, carekê mirovekî gundî çû bajêr, da ku kelûmelan ji xwe re bîne. Dît ku xelkên wî bajarî, bi hûr û gira ve, hemî li meydanekê li hev civiyane. Ew jî çû xwe da pişt wan û sekinî. Hew dît ku teyrekî sipî hat.. hat, li ser serê wî danî. Mêrik hew dît polîs hawîrdorê wî girtin. Milet hemî bi hev re êrîşî wî kir.

Mêrikê pepûk matmayî ma û bi sûnda ket, got: Min tişteke nekiriye!

Jê re gotin: Em dizanin te tişteke nekiriye. Adeta welatê me eve, her sê salan em vî teyrî hiltavêjin, ku here li ser serê kê deyne, em wî ji xwe re dikin Şah.

Mêrik got: Dêmek, niha ez Şahê we me?

Hemiyan bi hev re gotin: Belê, belê. Tu Şahê me yî.

Mêrik dev xwe lîl kirin û ew birin hemamê, serê wî şûştin, riha wî kurt kirin, destek cilê qiraliyê lê kirin û berê wî dan qesrê, da ku wî deynin ser textê şahinşahiye.

Mêrik bi rê de dît ku zilamek pêşopaş li kerekê siwar kirine û di nava kolanan re dibin û tînin. Heçî tê rasta wî, hinek av û xwelî lê direşîne. Mêrik matmayî ma. Got: Xwedêkî, pirs bê eyb in, evî mirovî çi kiriye, ku millet weha lê dike?

Jê re gotin: Ev qiralê me yê berya te bû. Îro jî ji qiralî ketiye. Divê heçî mirovê ku neheqî lê hatibe, bi vî rengî tola xwe jê hilîne.

Mêrikê reben jî xwe re baş ponijî. Ji yê derdora xwe re got: Ez hêvî û sed hêvî ji we dikim, hûn sê rojan destûra min bidin, da ku ez herim gund da ku ji jin û zarokên xwe re bêjim çi bi min re çêbûye.

Jê re gotin: De here, sê roj muhlet bi te re.

Mêrik got: Lingno min hilênin!

Mêrik çû û çû û çû.. çûneke bê veger. Ji xwe re got: Bi Xwedê, min ew şahîşahî navê ku dawîya wê av û herî be.

Xiyarê tehl

Dibêjin, hebû xortek ji keçekê hez kir, ew xwest û ji xwe re anî. Çiqa êvar, wî hez kirina xwe ji jina xwe re dida xuyanî, û çiqa êvar dema ji karê xwe dihat, renga rengên êmîşan ji wê re tanîn, nemaze xiyar; xiyarên ku ji jina xwe re tanîn pir nazik bûn, hê kulîlkên wan bi wan ve bûn. Diya wî jî bi wan re dijî.

Her ku mêrik xiyar tanîn malê, jina wî radihişt çend lib xiyar da bibe ji xeswa xwe re, mêrik digot: Na, na.. nebe. Min behra wê birye oda wê.

Çend meh di ser zewaca wan ket. Rojekê xeswa wê nexweş ket, bûk çû oda wê pîrê da dora wê bide hev. Dît ku di kulekekê de komek xiyarên xerabe hene, û bêhn bi wan ketiye. Ji xeswa xwe pirsî: Ev çi xiyarên xerabene? Xeswa wê jê re got: Keça min, hema dev jê berde.

Kir û nekir bûkê bela xwe venekir, û got: divê tu çîroka van xiyaran ji min re bêjî. Xesû neçar bû û ji bûkê re got: Ev xiyarên han, ewên ku her şev kurê min ji min re tîne û datîne ber serê min, lê mixabin dema ez dixim devê xwe ez dibînim ku tehlin, wek zirav, ez nikarim bixwim, û wan tavêjim wê kulekê.

Bûka jinkê, dema ev tişt bihîst, di cihê xwe de sar bû û matmayî ma. Bi hezarên hezaran raman di nava mejiyê wê de çûn û hatin. Û di wî kêlîkê de biryar di navbera xwe û derûnê xwe de stand, got: Divê zû ne dereng ez ji vî kesê han xelas bim.

Êvarî, weku her şev, mêrê wê ji karê xwe vegeriya, şîva xwe xwar û rûnişt. Jinik li hemberî wî rûnişt, bê şer û qirên, jê re got: Filankes, ez ji te hêvî dikim ku tu min berdî.

Mêrik ji ber vê gotina wê weke dîna lê hat, ji jina xwe re got: Çima? Qey min çi kiriye, min çi guneh kiriye? Ez pir ji te hez dikim. Ez te bi dinyayê hemî nadim.

Lê, jinik ji doza xwe venegeriya û got: Bivê nevê tê min berdî. Baş bû ku min îro te eşkere kir ne sibe. Çawa tu xiyarê tehl ji pîra diya xwe re dibî û tu yê nazik didî min. heger sibe zarokên min ji te çêbibûna.. tu îro çi bi diya xwe dikî, wê sibe zarokên te jî wilo li min bikin. Çiqasî mêrik xwe avête dest û lingê wê û jê re got: Li min bibûre, ez careke din nema weha dikim.

Lê lavlavên mêrik cihê xwe di dilê jinikê de nedî. Jinikê bi vîneke xurt xwe jê berda û çû mala bavê xwe.

Piştî sal û demên dirêj derbasbûn, jinik li mihînekê siwar bû. Kurekî wê bi serê hevsarê mihîna wê girtiye û du sê kurên wê yên din jî dabûn dora wê û bi rêkê ve

diçû. Jinikê dît ku kalek ji wir ve tê, gopalek di destê wî de ye û tûrê parsê li milê wî ye.

Jinikê baş lê nerî, ew naskir. Zanî ku ev mêrê wê yê pêşî ye. Ji kurên xwe re got: Hêdî li vir bisekinin! Jinik ji mihîna xwe peyar bû hate xwarê. Ji kalo pirsî: Te ez naskirim?

Kalo bi kûr û dûr lê nerî, ew nas nekir. Jinikê dest pê kir û got: Te ez nas nekirim, lê min tu naskirî. Ez ew pîrekim; ewa ku dev ji te berda, ji ber ku te xiyarên tehl didan diya xwe, û yên şêrîn û nazik ji min re tanîn. Piştî te min şû bi mirovek ji xwedêtirs kir, û heft zarokên min ên baş ji wî hene.

Ji kalo pirsî: Ka îca tu jî hinekî behsa xwe ji min re bike!

Kalo lê vegerand û got: Tu jiyana min dibînî, bi kurtî, min jî di pey te re jineke din anî, û birek zarokên me jî çêbûn, lê mixabin, dema ku bikêr xwe hatin, hemiyan dev ji min berdan. Va îro tûrê parsê li milê mine.

Elo! Teto bide babo

Zilamek hebû pir xizan bû.. tim û tim li ber destê xelkê kar dikir. Carekê çend qurûş ketin destê wî, çû ji gundiyan pirsî; ji wan re got: "Çend qurûşê min hene, ez dixwazim ji xwe re karekî pê bikim. Gelo ez çi bikim wê baş be?".

Yekî ji gundiyan jê re got: "Ezbim, tê kirîn û firotina ceran ji xwe re bikî. Karekî pir baş e". Gotina mêrik kete serê wî. Çend qurûşê xwe kirin kwîrika xwe û berê xwe da bajêr. Çû heta giha cihê cera. Cer pir bûn; hin biçûk bûn, hin mezin bûn... Çavê xwe li wan gerand; li şerbik û cer û kuvîyan. Çavê xwe berda kuviyekî, ji xwedî bazar kir, li hev kirin û kuvî ji xwe re kirî. Heyirî ma wê çawa kuviyê xwe bighîne gund! Çû kapikek (qetek werîs) anî, di çembilê kuvî re kir û da piştê xwe, û berê xwe da gund. Qederekî bi rê ve çû, pir westeha, li bin siha darekê, pala xwe da kevirekî û ji xwe re got: "Ezê hinekî bihna xwe vekim û dîsa bi rê kevim".

Lê, piştî ku rûnişt û bayê hênîk li bin siya darê lêxist, ew hênîk bû, û pala kuviyê xwe jî da latekê û herdu aliyên kapik jî di destê kuvî de ne û serî di destê wî de ne.

Piştî hinekî rehet bû, bêhna xwe vekir, kete nav xewn û xeyalan. Bi xwe re şitexilî û got: "Ezê vî kuvî bibim gund bifroşim. Çar qurûşên min wê bibin heşt, ezê vegerim du kuviyên din pê bikirim û ezê bifroşim, vê carê wê bibin şazdeh qurûş, û ezê bi vî rengî bikirim û bifroşim ta ku halê min xweş bibe û ezê jî bibim yek ji maldaran.. Weke ku îro ez li cem xelkê kar dikim, wê xelk jî li cem min kar bikin. Gelo dema halê min xweş bibe, ezê pêşî çi bikim?! Divê ez jinekê ji xwe re bînim, ez herim keça kê wê levekar bin, û piştî min jin anî wê zarok ji min re çêbibin. Zaroka pêşî ji min re çêbibe wê kur be. Gelo ez navê wî bikim çi? Ezê navê wî bikim Elo, ser navê bavê xwe. Dema emrê Elo bibe salek wê tenê tenê bisekine, wê rabe, û wê bikeve, ezê bakmê *Elo! Teto bide babo*".

Bi vê gotinê re, di xeyalê xwe de, Elo li pêşiya xwe dît, ku radibe û dikeve. Herdû destên xwe ji kapik berdan û bi lez xwe avête Elo û got: *Elo! Teto bide babo*.

Dema xwe avête Elo, herdû destên xwe ji kapik berdan kuvî ji pişt wî ve wergereha, li erdê ket û şikest. Bi gurmîniya kuvî re mêrik li xwe hay bû, dît ku her tiştên di xewn û xeyalên wî de tevde bi carekê ji dest wî çûn, û çi semyanê wî hebû pê re çû. Dîsa bi xemgînî û bi dilekî şikestî da ser rê û berê xwe da gund.

Dema giha gund, xelk hatin dorê, wî çîroka xwe ji
wan re got, û ji wê çaxê de gotina (*Elo! Teto bide babo*)
bû meselok kete nav gundiyan û belav bû.

Xewn

Zilamekî navser hebû, dîndar bû, gelek baş bû û ji Xwedê bi tirs bû. Xelkên gund tev jê razî bûn. Dem bû çaxê çûna Hecê û xelkê kara xwe kirin da ku herin Hecê, dilê wî jî pir di çûna Hecê de hebû, rabû kufletê xwe kom kir, izna wan stand, ji wan re got: "Ez dixwazim herim Hecê, ka hûn çi dibêjin?".

Jina wî tevî zarokan gotin: "Divê tu herî Hecê". Ewî jî dema dît ku bi dilê hemiyane, keyfa wî zehftir hat, û rabû kara çûnê kir.

Piştî ku her tiştê xwe pêkanî, û hindik ma ku bi rê keve here Hecê, şevê di xewna xwe de dît ku çîqa ew diçe ber kevirê reş (Ke`ibê) ku wî maçe, dibîne ku bûka wî rê nadê, berî wî devê xwe dixê û maç dike.

Mêrik bi veciniqandin ji xew rabû. Tif kire Şeytên. Hinekî ponijî, di xewna xwe de ramiya, lê dawiyê, ji xew re got: *"Xewn ne tiştikî hêjane ku mirov pê bigre"*.

Lê dema mêrik şeva din jî raza, dîsa ew xewn bi xwe dît. Sê çar şevan li pey hev, çîqa radiza didît ku bûka wî berî wî li Hecê, li ber Ke`ibê ye.

Mêrik nema debar kir, bang jina xwe kir û xewna xwe jê re got, û lê zêde kir: Gelo çima her şev ez vê

xewnê dibînîm!?

Jinîkê jê re got: Bi Xwedê ez tiştekî ji xewna te nizanim.

Piştîre kufletê mala xwe civand û xewna xwe ji wan re got. Her yekî ji wan bi rengekî bersîvek da. Lê ev hemî jî ne ketin serê wî.

Rabû bi dizî ji bûka xwe pirsî: Ka ji min re bi rastî bêje, te çi qencî kirîye ta ku ez te li pêşîya xwe li Hecê dibînîm!?

Bûka wî got: Apo! Bi Xwedê, ezê bi rastî ji te re bêjim. Min ti qencî nekirine, lê min xirabiyek mezin kiriye, ez hêvî dikim ku Xwedê li min bibûre.

Xezûr got: Keçê bêje. Te çi kirîye bibêje.

Rabû bûkê ji destpêkê de jê re got:

Berî deh rojan, me berxek gurand. Me hûr kir û me goştê wî xiste teştan û me danî nava hewşê. Xeswa min li ber teşta goşt rûniştibû, hew min dît ku cîrana me ya bi du canan hat, kete hewşê û got: Ez hatime agir bibim, ji ber ku agirê me vemiriye. Ez çûm min bêrika wê tijî agir kir û min da destê wê û çû. Lê dema çû çavê min lê ket, min dît ku çawa li teşta goşt dinere û dibihûre. Giha malê, negiha dîsa vegeziya û got: Bi Xwedê ew agirê we da min bi rê de vemirî û negiha mal. Dîsa em çûn me agir jê re anî, me dayê û çû.

Bi vî rengî, sê çar caran hat û çû, û bala min lê bû,

her car jî bi hesret li teştê goşt dinerî, min bala xwe dayê ku dilovanî bi xeswa min re çênebû, ku rahije hinek goşt û bide vê pîreka bi du canan (bi ber).

Me goşt keland û me danî ber kuflet. Hemiyên jê xwar, lê min kir û nekir rewşa wê pîrekê ji ber çavê min ne diçû, ji tîrsa xeswa xwe jî min nediwêrî ez rahêjim hinek goşt jê re bibim. Ez mam heta ku tarî kete erdê, min rahişt hinek goşt bi dizî li nav dawa kirasê xwe pêça, û bi lez û bez min bir da wê pîrekê û ez hatim. Lê tu xweş bawer bî, bi vegerê, ji tîrsa Xwedê ez dilerizîm û min digot "Ya Xweda! Li ser vê diziyê li min negre". Bi Xwedê eve tişt min kirîye.

Dema çîrok xelas bû li çavê xezûrê xwe nerî dît ku hêsir di çavên wî de dilîzin. Jê re got:

Keça min! ev karê ku te kiriyî, ez pîroz dikim, û tê berî min herî Hecê, ji ber ku Hec layiqî yê weke te ye.

Bext

Dibêjin: Zilamek hebû, her û her perîşan û xizan bû, tim rênçberê xelkê bû, karê wî tim bi nan û zikê bû, piraniya temenê wî bûrî hîn bê jin, mal û zaro bû. Bi roj li ber pez û dewaran bû, û bi şev li bin oliya dewaran radiza.

Rojekê, gelek jana wê jiyana wî ya tehl û dijwar da dilê wî. Ji xwe re got: "*Ez nema karim vê jiyana kambax bi dîlî derbas bikim*". Li ber dîwarekî rûnişt û por-pora rewşa xwe dikir. Zilamek rasta wî hat û li ber rawestiya.. jê pirsî: "Çima tu por-pora halê xwe dikî?". Mêrikê perîşan rewşa jiyana xwe jê re got û gelek gazin ji bextê xwe kir, got: "Ez nizanim, çima bextê her kesî bi hana wan tê ji bilî bextê min pê ve?! Qey min çi kiriye jê? Qey dilê wî bi min naşewite?!".

Mêrikê perîşan her gazin ji bextê xwe dikir, û mêrikê guhdar gotina wî birrî û jê re got: "Çima tu naçî û li bextê xwe nagerî, û rewşa xwe jê re nabêjî?".

Mêrikê xizan jê pirsî: "Gelo qey tu zanî cihê bextê mirovan li kî derê ye?". Mêrik lê vegerand û got: "Belê, dibêjin her mirovek bextê wî heye, û cihê ku bext lê dimînin li pişt çiyayê Qaf e".

Mêrikê xizan pir bi vê gotinê şabû, û nemerdî nekir, yek û dudo, daxwe û rabû, da ser rê û berê xwe da çiyayê Qaf. Qederekî bi rê ve çû, rastî koremarekî hat. Çend gavan ji mar dûr ket, mar bangkiryê: Ha xorto! Tu bi kûve diçî? Li mar vegerand û jê re got: Ezê herim nik bextê xwe, belkî çarekê ji rewşa min re bibîne!. Mar jê re got: Gelo qey tu zanî cihê bextan li kûye? Mêrik got: Belê, bi saloxdana dibêjin li pişt çiyayê Qaf e. Marê kor jê re got: Xwedêkî heger te bextê min dît tu jê re bibêjî, ev çend sale nexweşik li min peyda bûye kes nebîne! Kenik li laşê min derketiye, ji ber xur û şewatê bi şev û roj hedara min ji ber nayê, ka çarekê ji vî derdê min re nabîne?! Mêrik got: Soz be li min, ku ez bextê te bibînim, ezê daxwaza te jê re bêjim. Xatir ji mar xwest , û riya xwe girt û çû.

Qûnaxekê bi rê ve çû, rastî cotkarekî hat. Piştî silav lê kir, û bêhna xwe li cem vekir, daxwe rabû da here, cotkar jê pirsî: Bira! Tu bi kûve diçî? Jê re got: Ezê herim li bextê xwe bigerim, belkî çarekê ji rewşa min bibîne!. Cotkarî jî jê re got: Xwedêkî, ku te bextê min dît te derdê min jî jê re bibêjî?

Mêrik pirsî: Ka derdê te çiye?

Cotkarî got: Ev erdê ku tu dibînî hemî yê min e, ez xweşik dajom û tovê xwe gelekî spehî tavêjimê. Dema dibe Buhar, gelek taze şîn dibe; ji hemî zadên dora xwe

gomrehtir (bitir) dibe. Ez pir şa dibim û hêviyên mezin li ser girêdidim, lê mixabin, şahiya min naçe serî. Dema genimê min zer û sor dibe, nêzîkî ku ez biçinim, ji nişkave agirek pê dikeve û hemî dişewite. Ez dikim nakim nizanim çima wilo tê serê min.

Piştî ku mêrik guhdarî derdê cotkarî kir, sozda wî jî, ku bextê wî bibîne û kula wî jî jê re bibêje. Rabû ser xwe. Xatir xwest û çû.

Piştî demeke baş rê û rêbar birrîn, rastî bajarekî hat, lê bû şevreş. Ti der nasnedikir. Çû berê xwe da Serayê û li ber dergehê wê xwe dirêj kir, serê xwe danî ser kevîrekî û di xew re çû. Sibehe zû, dergevanên Serayê dîtî ku wa zilamek li ber dergehê Qesrê razaye. Dest û nigên wî girêdan û ew birin nik Melik. Melik jê pirsî, got: Tu çi kesî? Û tu ji kûve tê? Û tê bi kûve here? Bi rastî ji min re bibêje, bi soz ezê te berdim. Mêrik jê re got: Ezbenî! Va tu rewşa min dibînî. Ez mirovekî pir xizan im, û ezê herim nik bextê xwe, belkî çarekê ji min re bibîne.

Melik got: Qey tu dizanî ku bextê mirovan li kîderêye? Got: Belê, ez dizanim.

Dema wilo got, Melik ferman da yên dora xwe got: Hemî derkevin! Min û wî bi tenê bihêlin.

Di wê gavê de hemî derketin, ew herdû bi tenê man. Melik jê re got: Ez di bextê te û Xwedê de me, derdek

min jî heye, ku tu çûyî tê li bextê min bigerî, ku te ew dît, tê derdê min jê re bibêjî, ka çarekê ji min re nabîne! Mêrik got: Keremke Melikê min derdê xwe ji min re bibêje! Melik got: Ez melikê vî bajarî me. Heyî û neyî hemî di destê min de ye, lê dikim û nakim, tirsê min nakeve dilê kesî. Derdê min jî eve, ez nizanîm çima!

Mêrik soz da Melik ku here nik bextê wî û jê re bibêje. Melik jê re got: De here, Xwedê bi te re be.

Mêrik rîya xwe girt û çû çiyayê Qaf. Bi pirs û pirsyara çû û çû ta giha pişt çiyayê Qaf. Dît ku bextê hemî kesan li wirin. Çû ji nav bextan pirsê bextê xwe kir, ta ew dît. Li hev rûniştin. Mêrik pîr gilî û gazinek xwe jê kirin, û got:

Çima evqas sal tu bi hana min ve ne dihatî? Min sê çarekê ji temenê xwe bi dîlî û perîşanî bûrand, qey dilê te bi min nedişewitî?!

Bextê wî lê vegerand û jê re got: Li min bibûre, ez gelekî di mafê te de şaş bûm, lê ji îro û pêve wê jiyana te xweş bibe.

Mêrik got: Va ezê herim, ka te çi kir destê min de?

Bextê wî jê re got: Hema here, rizqê te li pêşiya te ye.

Rabû, xatir ji bextê xwest û çû li bextê Melik geriha, ta ku dît. Jê re got: Tu yî bextê filan melikî? Bext got: Belê.

Mêrik çîroka melik hemî jê re got. Bextê Melik weha bersiv da: Here ji Melik re bêje: Ti carî kesek jê natirse, ji ber ku ew jin e, û ti çara wî li cem min tune.

Mêrik çû li bextê cotkarî geriha, ta ew dît. Çîroka yê cotkarî jê re got. Bext weha bersiv da: Tê here jê re bibêje: Xezîneke zêr di binê wê şêrê de heye; ew şêra di nêva zeviya wî. Dema dibe Temûz û Tebax, dinya gelek germ dibe, ji germiyê ew zêrên di bin erdê de disincirin û agir jê diçe û bi genim dikeve, dişewitîne. Bila wê xezîne ji binê wê şêrê derxe, hingê nema agir bi genim dikeve.

Mêrik got: Hema eve?

Got: Belê, eve.

Mêrik rabû ser xwe û çû. Çû li bextê mar geriya, ta ew dît û derdê mar jê re got. Bextê mar weha bersiv da: Tê here jê re bibêje: Bila bi mirovekî ehmeq ve bide wê ji nexweşiya xwe sax bibe. Got: Hema eve!? Got: Belê eve.

Mêrik rabû ser xwe, û bi dilekî xweş û bi hêviyên germ berê xwe da riya vegerê. Pêşî giha nik Melik.

Melik ew derbasî dîwana xwe kir. Ferman da, rihsipiyên xwe hemî derxistin. Herdû bi tenê man. Melik bi lez pirsî: Te bextê min dît?

Got: Belê ezbenî, min bextê te dît.

Melik jê re got: Bi lez bibêje. Çi ji te re got.

Got: Jê re bibêje: Tu jinî, ji ber vî hawî kesek ji te natirse.

Melik xwe avête dest û nigên wî û got: Tu vê yekê ji kesî re nebêje. Belê raste ez jinim. Ji ber ku bavê min melik bû, û kur jê re çênebûn, û ez keça wî ya yekane bûm, û divabû ku yek ji malbata me cihê wî bigre, ji ber vê yekê, dê û bavê min ez xistim vê rewşê de. Were ezê te bi dizî mehr bikim, da ku tu alîkariya min di hukmê vî bajarî de bikî.

Mêrik got: Li min bibûre, ez nikarim.

Melik jê re got: Qey tu vê rewşa xwe ya kambax nabînî? Çawa min qebûl nakî!?

Ji Melik re got: Ez diçim û bextê min li pêşiya mine. Ma ezê çi bikim ji te!?

Melik kir û nekir ti çare jê nekir. Ew berda.

Mêrik çû ta giha nik cotkarî. Dema cotkarî ew dît, bi bazdan çû pêşiyê. Xêrhatin tê da û jê re got: Gelo te bextê min dît?

Mêrik got: Belê, min bextê te dît, û weha ji te re dibêje: Xezînek zêran di nava wê şkêra te ya nêva zeviyê de heye, dema Havînî ji germiya rokê ew zêr disincirin, agir ji wan diçe, û bi genim dikeve, wî dişewitîne. De here cihê zêran bikole û wan derxe, tê ji vî derdî xelasbî.

Cotkarî sipasiya wî kir û jê re got: De were ez û tu

emê vê şkêrê bikolin û zêran derxin, û li hev par bikin,
ji ber ku te ev qenciya han bi min kir divê ez jî qenciya
te vegerînim.

Lê kir û nekir mêrik zêrê cotkarî qebûl nekir.

Cotkarî got: Qey tu rewşa xwe ya kambax nabînî!?
Çima tu qebûl nakî?

Mêrik weha jê re got: Bextê min ji min re gotiye:
Here û ez li pêşiya te me.

Dev ji cotkarî berda û çû.. çû ta giha nik mar. mar jê
pirsî: Di bextê te û Xwedê de me, te çi kir?

Mêrik rûnişt û çi tiştê ku pê re çêbibû ji mar re got –
ji çûnê heta hatinê- û berdewam kir: û bextê te jî dibêje:
Bila bi mirovekî ehmeq ve bide wê sax bibe.

Careke dî mar jê pirsî. Wî li mar vegerand û got:
Bextê min ji min re got: Here û ez li pêşiya te me ...

Mar ji xwe re got: "*Gelo, ma ezê ji vî ehmeqî
ehmeqtir ji kîderê bînim!?*". Bangkiryê got: Bi Xwedê
kî, were di guhê min de bibêje, ka bextê te çi gotiye, ji
ber ku guhên min giranin, min dengê te baş ne bihîst!

Mêrik hat. Xwe nêzîkî guhê mar kir, û mar jî
nemerdfî nekir, bi pelika bin guhê mêrik veda, û jê re
got: De here, ma yê weke te ji boyî çi bijî!

Çîroka me çû deştê, dê û bavên me çn buhiştê.

Bêş

Tehsîldar hate gund, xelk hemî çûn û bêşa xwe dan. Kurê jinikê çû bêşa xwe û kufletê xwe da. Dema vegeriha malê, diya wî jê pirsî: Tu bi kûve çû bû?

Ji diya xwe re got: Ez çûm min bêşa xwe da.

Diya wî bi tepa li çogên xwe da û got: Wey li minê.. Weyla li minêê!. Tu wilo bi rehetî çû û te bêş da? Mala minê, tu jî bûyî bavê xwe!?

Kurik ji diya xwe pirsî: Yadê! Qey bavê min çawa bêşa xwe dida?

Jê re got: Kurê min! dema tehsîldar dihat, bavê te xwe dida alîkî; ango xwe vedişart. Li wî digerihan, ta ew digirtin, û dibirin têr lê didan, serê wî jî dişkandin, ji nû ve bêşa xwe dida.

Xort li diya xwe vegerand: Yanî bêşa xwe jî dida û serê xwe jî dida şkandin!.

Bazirganek

Mirovek bazirgan, di dawiya meha Avdarê de, rojeke tav germ derket, çû dora gund û geriha, dît ku teyrekî hêlîna xwe li ser darekê çêkiriye, û sê çêlîk jî derxistine.

Mêrik ji xwe re got: Bi Xwedê îsal ez di bazirganiya xwe de exirîme, va teyr hêlîna xwe çêkiriye û çêlîk derxistine, û hîn min dest bi karê xwe nekiriye!.

Wê şevê mêrik çû heft gamêşên xwe kar kirin û barkirin, serê sibehê zû berê xwe da oxira xwe. Ji sibehê heta êvarê meşî. Hew dî ji nişkave berfê lêkir. Berf hat û hat, heta ku ew û gamêşên xwe sekinîn û nema karîbûn bi rê de herin. Nema karîbû ne here û ne vegere. Mêrik fikirî "*Ka ez çi bikim? Ez û heft gamêşên xwe li vir bimrin, yan mayîna min muhîmtire?*". Hema mêrik da xwe, rabû kêra xwe ji ber xwe derxist, zikê gamêşa xwe çirand û xwe kir nav dil û hinavê wê de, heta ku lê sar bû. Her weha gamêşek li dû ya dî, zikê wan vekir û kete nav dil û hinavê wan. Heta ku her heft gamêş xelas bûn, roj lê hilat, taveke germ belav bû. Bi xwe zanî ku ji mirinê xelas bû.

Bi tena xwe, bê gamêş, bê bar, vegeriya malê. Berya

ku bighê mala xwe çû riya xwe bi teyr û hêlîna wî xist.
Dît ku teyr bi hersê çêlikên xwe ve mirine û hişk bûne.
Li cem hêlînê sekinî û got:

Teyriko wîtwît kanî?! Te tiştek ji hesabê salê
nedizani, te mala xwe xera kir û ya mi jî li ser danî!

Çiroka derewan

Du mirov çûne şerî`etê, Qadî ji wan pirsî: Mişkîla we çiye?

Yê pêşî dest pêkir û got:

Ezbenî! Ez vê sibehê çûme nêçîrê, du kevan bi min re bûn, yek ji wan bê tîr bû, û yê dî bê ben bû. Min rahişte yê bê ben û min nîşan ji pezkoviyê girt heta ku ji qelşa tehtê hate der, û min berdayê, hew min dît ku pezkoviya min di tehtê de gindirî, û ez pey çûm, min da ser şopa xwîna wê heta devê deryê vî ciwamêrî. Dema min doza nêçîra xwe lê kir, da mendelê û got: Tişteki te li ba min nîne.

Qadî berê xwe da mêrkî dî û got: Çima te nêçîra wî nedayê? Mêrik li Qadî vegerand û got:

Ezbenî! Bi Xwedê ez li mala xwe rûniştî bûm û diya min hirî dirist, û min jî ji wê re fikir girûfik, girûfika rîs ji destê min ket û gindirî çû ji derve, ez çûm girûfikê bînim, min dît ku pezkoviyekê rahiştiye girûfika rîsê diya min û jê re tîne mal de. Ez rabûm min ew pezkovî gurand, sê sîlokên (beroş) diya min hebûn, yek ji wan bê binî bû, yek bê qepax bû, ya sisiya bê çembil bû. Diya min hersê beroş ji goşt dagirtin, li agir kirin, dema

goştê me pijiha, me goşt li xelkê bajêr hemî belavkir, hê ji nû me dît vî ciwamêrî li deryê me da; dibêje ez xwediyê vê nêçîrê me. Ew nêçîra ku Xwedê ji min re rêkirî, û bi girûfika diya min ve hatî. Ka vêca çî wî li ba min heye?

Qazî şaşomaşo bû, berê xwe da herdûka û ji wan re got: Çîroka we ya derewa ye, hema ka kî ji we zehfîr derewan bike heq bi wî re ye.

Yê pêşî dest pê kir û got:

Ezbenî! Bi Xwedê ne ji adeta malbata me ye ku em derewan bikin, lê tiştê tê bîra min, hêştîrek me hebû, lingek tavête çiyayê Cûdî, û yê dî dida çiyayê Mazî, û diya min ew didoht heta ku ew geliyê di navbera herdû çiyana de tijî şîr dibû û bi ser de diçû.

Mêrik li wir sekinî. Qadî berê xwe da yê dî û jê re got: Ha, çî li ba te heye?

Yê dî dest pê kir û got:

Ezbenî! Ji xwe ticarî malbata min nizanin derwan bikin, lê tiştê tê bîra min, rojekê, xelk çûne xwê, yê hespê xwe bir, yê mehîna xwe, yê qantira xwe, yê ga, yê ker... min jî dîkê xwe bi cil kir û bi wan re bûme heval. Em çûn ser Karê û hemiya barê xwe dagirtin, min jî du çewal dagirtin, û li piştê dîkê xwe kirin. Di vegerê de, em rasta rûbarekî hatin, xelk di rûbar re derbas bûn, dîkê min nedikarî bide avê, min barê xuya

xwe hemî, bi berkehniya avête wî alî cem, û min rahişt dîkê xwe û em derbas bûn, dema em çûn wî alî û min xwê veyda û kir çewalan de û li pişta dîk kir, min dît ku cemek ji ya dî girantir e, barê dîk xwar dibû, min kevirên wê berbestê hemî danîn ser aliyê sivik, lê rast nebû. Hew min dît ku bi qasî diranekî xwê ya min li erdê ye. Dema min rahiştîyê û ew danî ser cema sivik, barê dîkê min bû weke mîzînê. Heta em gihane malê, min barê dîkê xwe danî, min dît ku pişta dîk bûye cedew, ez li textorê dinyayê hemî geriyam, da ez dermanekî ji pişta dîkê xwe re bibînim, hemiyan ji min re digotin: Dermanê pişta dîkê te, gwîza hindê ye. Ez li gwîza hindê gerham û ne geriham min ew peyde nekir. Ez pir xemgîn bûm. Min ji diya xwe pirsî: Ka ezê gwîza hindê ji kû bînim?! Diya min got: Kurê min! bi Xwedê ez nizanim gwîza hindê li kû heye! Lê roja ku ez bûk bûm, rehmetiyê bavê te bi qasî benîşteki gwîza hindê da min. Ka were li qula diranê min binere, belkî hîn piçek têde mabe. Dema ez çûm min li diranê diya xwe nerî, min dît ku bi qasî hevîtirşekî tê de ye. Dema min anî û li pişta dîkê xwe da, hew min dît ku dareke gwîzê li ser pişta dîkê min şîn bû, heft gwîzçînîna gwîz jê diçînîn û yekî dengê yê dî nebihîst, û dîkê min jî qîjqîja wî bû bang dida û diçêriya. Rojekê ez jî bi ser wan ve diçûm û dihatim, min dît ku cotikek gwîz bi

serê şaxekî ve ne, min xwe tewand şelikek ax, û min avêt wan gwîzan, hew min dît ku ew ax bû deştek, heft cotkaran cot li ser girêdan, yekî dengê yê dî nedibihîst, dîkê min jî di bin de bang dida û diçêriya. Rojekê di nava cot de gayê me winda bû. Em geriha û ne geriha me ew nedît. Havîn hat. Me genimê xwe dirût, me bir benderê, me gêre kir û da bayê, me kir çewalan de û anî malê. Barê pêşî, min genimê xwe bir êş hêra û anî malê, diya min hevîrê pêşî çêkir û bir li tenûrê da û anî malê, min rahişte nanekî, qet kit, hew min dît ku gayê me di nav wî nanî de mexel hatiye û dikayê.

Derew

Kurik ji bavê xwe re got: Bavo! Dema tu diçî civatan û diaxivî, tu pir tiştan mezin dikî, û êdî xelk bi te dikenin.

Mêrik jî li xwe mukur hat û jî kurê xwe re got: Bi Xwedê, kurê min, eva tu dibêjî raste. Ez jî li xwe hay bûme, lê ka ezê çawa bikim?

Kurik jê re got: Çare li ba min heye bavo! De were ezê her êvar bi te re bême civatê, û dema ku min dît te şaşkir, yan te zêde kir, ezê îşaretekê bidim te, da tu li gotina xwe vegeirî û ser rast bikî.

Mêrik li kurê xwe vegerand: Kurê min! bi Xwedê ev tişt gelekî başe.

Roja dî êvarê, kurik da kêleka bavê xwe û berê xwe dan cihê civatê.

Dema dor giha mêrik û dest bi axaftinê kir, got: Gelî civatê! Doh ez çûm çolê, min tişteke ecêb dît!

Xelkên civatê jê re gotin: Keremke bêje.

Dest pê kir û got: Min hespekî kovî dît, dûvê wî diwazdeh mitran dirêj bû.

Kurik bi lez û bez got; Ihiim ihim..

Bav li xwe hay bû ku zêde kir. Di cih de got: Bawer

bikin, heger diwazdeh nebin, lê heşt bi rehetî hebû.

Kurik dîsa got; Ihiim ihim..

Dîsa mêrik li xwe vegera û got: Ya cema`eta xêrê, behwerbikin, heger heşt nebin jî, ji kêmanî ji kêmanî çar hebûn.

Kurik dîsa got; Ihiim ihim..

Vê carê, hingî bav tijî bû, berê xwe da kurê xwe û jê re got: Ihiim û quzelqert. Bapîrê te jî ji goristanê rabe, ez ji çar mitran danakevim. Ma te divê ku ez bêjim: bê dûv bû!?

Qereçî nabin Xatûn

Dibêjin carekê mîrek di gel birrek hevalên xwe çûne nêçîrê, ji nişkê ve rastî çend konên qereçîyan hatin. Mîr ji hevalên xwe re got: Rawestin! Emê bihnekê li ba van qereçîyan rûnin û bihna xwe vekin.

Ber bi wan ve çûn. Keça xwediyê ê`la qereçîyan çû pêşîya wan, û berê xwe da Mîr, çû serhevsara hespê wî girt. Dema çavê Mîr lê ket, ne bi dilekî, bi sed dilî dil ketiyê. Hema Mîr bê dudilî, xwe ji ser piştê hespê xwe avêt û berê xwe da konê bavê wê. Dema ew û hevalên xwe rûniştin, berya ku avê vexwe, ew ji bavê wê xwest. Hingî hevalên wî jê re gotin: "Ev keçik ne babetî te ye", Mîr guhê xwe neda wan. Spehîbûna wê hiş û sewda di serê wî de ne hiştibû. Ji xelkê re digot: "Îro qereçîye, lê sibe wê bibe Xatûn".

Mîr ew ji xwe re anî. Heft roj û heft şevan li welat bû dawet û şahyane. Qesrek taybetî jê re ava kir. Bi sedê xulam û cêrî û xizmetçîyan li ber destê wê danîn. Hineka serê wê dişûşt. Hina cilên wê lê dikirin, hineka porê wê şeh dikirin û keziyên wê dihûnan, û hinekan xwarina wê çêdikirin.

Xizmetçîyan bala xwe danê her ku Mîr diçe nêçîrê

Xatûn, wan tevan ji qesrê derdixê, û derî li xwe digre.
Ne rojekê, ne dudo, ne sisê...

Xizmetçî û cêriyên wê tirsîyan ku nexweşiyek
gihabe Xatûn a wan. Çûn ji Mîr re gotin: Hal û mesela
Xatûnê eve, eve.

Dema Mîr ev tişt bihîst, bû derdek û ket ser dilê wî.
Mîr ji xwe re got "Divê ku ez bi xwe vî tiştî bizanim".

Rojekê Mîr di derîkî re çû û di deriyê dî re vegebiya
kete qesrê, bêyî ku kes lê hay bibe û xwe di pişt
perdekê de veşart. Nobet li Xatûnê girt. Hew dît ku
Xatûna wî deryê qesrê girt, û çû deryê sindoqekê vekir
û tûrikek jê anî der û avête milê xwe. Çû li ber derî û
kulek û penceran disekinî, destê xwe vedikir û digot:
"Xwedê ji hewe razî be, Xwedê zarokê hewe bihêle,
xêra miriya û sedeqa serê saxa hûn tişteki bidin min,
zarok li malê birçî mane". Heta ku derî û pencerên
qesrê hemî xelas kirin, bihna wê fereh bû. Dîsa tûrê
xwe yê parsê veşart. Derî û pencere vekirin. Hingê Mîr
ji pişt perdê hate der. Berya ku Xatûn here li ser textê
xwe rûne, Mîr bi acizî û bi hisret, bi xurtî milê wê girt û
got:

«Raste, qereçî nabin Xatûn».

Berx

Berxikek ji diya xwe bû. Piştî du mehan, xwediyê wî ew anî, da wî serjêke. Berxik girî û xwe avêt ser dest û piyên xwediyê xwe. Lavlav jê kir û got: "Tê min niha ne gurînî!". Xwedî lê vegerand û got: "Çima ez niha te ne gurînim?"

- Min bihêle, heta ez biharê bibînim. Dibêjin Bihar pir xweşe.

Xwediyê berx hinekî fikirî. Dilê wî bi berxik şewitî. Bi dilovanî kêra xwe ji ser hustiwê berx rakir. Destê xwe bi serê wî de anî û jê re got: "De here nav hevalên xwe!".

Berxik xwe ji şahiya hilavêt, herwekî ku nû Xwedê ew dabe diya wî. Bihar hat û çû. Di dawiya Biharê de mêrik rahişte kêra xwe û sût û tûj kir û berxê xwe dirêj kir û kêr danî ser hustiwê wî, da serjêke. Lê dîsa berx girî. Bi girîkî şewat û lavlav xwe avête xwediyê xwe. Xwedî jê re got: "Vê carê tu çi dixwazî?".

Berx got: Min niha ne gurîne, dibêjin Havîn pir xweşe. Min bihêle da ez Havînê jî bibînim!".

Dîsa mêrik li hember doz û lavlava berxê qels bû. Dilê wî alî wî nekir ku bigurîne. Kêra xwe bilind kir û

lingê xwe ji ser sînga berx rakir, û jê re got: Here weke ku tu dixwazî. Havînê jî bibîne.

Berx pir sipasiya xwediyê xwe kir, ku bihna xwe lê fereh kir û hinek dî jiyan da wî.

Havîn hat û bûrî. Bû destpêka Payîzê. Dîsa mêrik karê gurandina berx dikir. Dîsa weke hercar berxik zarezar kir û xwe ji nav lepê xwediyê xwe xelas kir, û ji xwediyê xwe re got: Dibêjin Payîz gelekî xweşe, bihêle ez Payîzê jî bibînim, da ew kul di dilê min de nemîne!".

Payîz hat û ber bi dawiyê de diçû. Demsal giha destpêka Zivistanê. Berya ku xwediyê berx kara gurandina wî bike, berx bi xwe hat, û li ber lingê xwediyê xwe mexel hat û stuwê xwe jê re dirêj kir, jê re got: Keremke, min serjêke.

Xwediyê berx ecêbmayî ma û jê pirsî: Tu bi xwe hatî ku ez te serjêkim, û tu huqasî bi jiyanê ve girêdayî bû!?

Berx li xwediyê xwe vegerand û got: Belê ez bi jiyanê ve girêdayî bûm, ta ku min tiştên nuh lê didîtin, lê îro ez gihome behweriyekê ku cîhan her çar dem in. madema ku ti tiştên nuh di cîhanê de tunebin, mirin û jîn, hebûn û nebûn weke hevin.

Şîret

Mirovekî gundî û xîzan, piştî zewaca xwe bi du mehan, jina xwe li ba dê û bavê xwe hişt, digel karwanekî çû welatekî dûr, da ku ji xwe re bixebite û hinek dirav ji mala xwe re bîne.

Dema çû, piştî demekê ji hevalên xwe wîndî bû û bi welatan ket, nema zanî ka wê çawa vegere mala xwe û welatê xwe.

Bîst sal di wê navê de çûn, heta rojekê rastî hinek mirov ji herêma xwe hat, ku ew jî mîna wî ne çûbûn mala xwe. Kulên xwe ji hev re gotin, li hev bûne xwedî û kar kirin ku vegerin welatê xwe.

Di riya vegerê de rastî tiştekî ecêb hatin. Dîtin ku zilamek li ser rêkê rûniştiye, dibêje û bandike: Şîreeet.. şîret. Werin şîretan! Ez şîretan difroşim.

Mêrik bang hevalên xwe kir: Werin, da em hinek şîret ji xwe re bikin.

Hevalên wî qerfên xwe pê kirin û jê re gotin: Ev keda ku bîst salan me daye hev, em ji bo gotinên vala na mezêxin. Lê mêrik guhê xwe neda wan. Bi ber şîretfiroş ve çû û jê pirsî: Tu şîretê bi çi difroşî?

Şîretfiroş lê vegerand û got: Ez şîretê bi zêrekî zer

difroşim.

Mêrik sê zêr ji kûrka xwe deranîn û dane mêrik.
Yanî sê şîret ji xwe re kirîn.

Şîretfiroş jê re got: Kurê min! şîreta yekê; Ku tu li çolan razehayî, li cihekî bilind raze. Ya dudiwan; Ku te girt bernede, û ku te berda pey ne keve. Ya sisiya; Ku te xwest tu qerarekê bidî, di cih de nede, çîqa bihna te fereh be, wê çêtir be.

Mêrik şîretên xwe jiberkirin û ew û hevalên xwe bi karwanekî re bi rê ketin.

Çûn û çûn heta li wan bû şev, nema pêşya xwe dîtîn, li newalekê rast hatin. Barê dewarên xwe danîn, dewarên xwe girêdan. Cihê xwe danîn û razan, berya ku mêrik razê, şîreta wî hate bîrê. Ku dibêje "Di newalê de raneze". Çû cihê xwe li ser tehteke bilind danî û raza. Dema ronahiyê da der, mêrik çavê xwe ji xew vekir, çi bibîne!! Dît ku wê şevê lehiyek rabûye, ava wê bi wî gelî de hatiye, ew karwan li gel heywên hemî li ber xwe birine. Ew bi tek û tenê maye. Tevî xemgîniya xwe jî, pir keyfa wî hat ku hîn sax maye. Pir sipasiya Xwedê kir û da xwe û rabû û riya xwe berdewam kir, heta giha bexçekî. Li bin darekê rûnişt da ku bihna xwe veke. Hew dît ku çûkek hat û li pêşiya wî danî, ewî jî destê xwe avêtê û girt. Kar kir da wê bigurêne, lê çûkê kire kazkaz, hêvî jê kirin got: Min berde. Heger ku tu

min bigurînî wê çêlkên min di hêlînê de ji nêza bimirin. Ma tê çibkî ji goştê min!? Hemî bi heve pariyek jê naye der.

Dilê wî bi çûkê şewitî û ew berda. Dema çûk firî û çû ser darê, ji mêrik re got: Tu dizanî heger te ez gurandibama, durrek di nava min de bû, têra te û kurê kurê te fikir.

Dema ev gotin seh kir, hiş di serê wî de nema, da xwe rabû pey çûkê ket. Çûk firî ji darekê çû ya dî, heta mêrik westeha. Dîsa şîreta dudiwa hat bîra wî "Ku te girt bernede, û ku te berda pey nekeve". Hinekî bi xwe re mijûl bû. Dîsa rahişte tûrikê zad û ava xwe û riya xwe berdewam kir.

Ji bajarekî çû yê dî, û ji gundekî çû yê dî. Bi pirs û pirsyara, bi berê sibehê re giha gundê xwe. Çû berê xwe da mala xwe. Derî vekir; çî bibîne! Dît ku xortek tu guneh dikî li bejn û bala wî binere, di kêleka jina wî de dirêjkiriye û razane. Di cih de xincera xwe ji ber piştê xwe anî der da li sînga wî xe û bikuje. Hîn destê wî li ba bû, şîreta sisiya hat bîra wî ku dibêje "Di qerarên xwe de bihna xwe fereh ke". Dîsa destê xwe daxist. Xincera xwe li kalan vegehand. Li piştê deriyê odê rûnişt. Ji xwe re got: «Ezê rûnim, heta şiyar bibin, ezê herdûka bikujim».

Mêrik ma şiyar, heta Mele banga sibehê da. Hew dît

ku jina wî şiyar bû, û bang wî xortî kir, jê re got: Kurê min! kurê min! rabe ser xwe. Va Mele banga sibehê dide. Rabe da em nimêja xwe di wext de bikin.

Hema mêrik bi kelogirî xwe avête wan. Ji nû bihîst ku dê û bavê wî emrê Xwedê kirine, ku jina wî bi hemil bû berya ku ew here, bêyî ku jinik jî zanibe.

Gora bavê

Xortekî gundî, çûbû bajêr da ji xwe re bişuxule. Demek dirêj pê ve çû, gelekî bêrya gund kir. Iznaxwe ji xwediyê kar xwest û berê xwe da gund. Dema nêzîkî gund bû, rastî mirovekî gundî hat, li hev sekinîn, xortê rêwî pirsax gund û gundiyan kir.

Mêrik lê vegerand: Tiştêk heye, lê min navê ji te re bêjim, niha tu bighê gund, tê bi xwe zanibê.

Yê rêwî jê re got: Ka bêje gidî, ev çiye? Bi Xwedê ez ji te na gerim ta tu bêjî.

Mêrik neçar ma û jê re got: Bi Xwedê vê sibê bavê te emrê Xwedê kir, û me ew siparte axê, ango ew veşartin.

Hema mêrik dev ji hevalê xwe berda û yekser berê xwe da mezel. Çû ser tîrba bavê xwe. Dît ku hîn tîrb bilinde û axa wê şile. Girî û xwe avêt ser sînga gorê. Bi giriyê xwe re dest pê kir, hemû bîranînên xweyên xweş û ne xweş, anîn bîra xwe û ji bavê xwe re gotin. Her girî û derdên xwe ji bavê xwe û ji wê axa sar re got. Hew dît ku mirovek raserî wî sekiniye. Jê pirsî: Xorto! Çima tu li ser vê tîrbê digrî?

Xort lê vegerand û got: Ev tîrb a bavê min e. îro

miriye û veşartine. Mixabin ez ne gihome ser.

Mêrik jê re got: Ne xêr. Ev ne gora bavê te ye.

Xort lê vegerand: Çawa ne gora bavê min e, û hîn axa wê şil e?

Mêrik got: Belê, ev rehmetiyê ha jî îro miriye, weke bavê te.

Xort pirsî: Naxwe ka tirba bavê min?

Jê re got: Wêêê haye, tirba bavê te li serê mezele.

Dema xort çû ser tirba bavê xwe. Sekinî û jê re got: Bavo! Qisûra min efû ke. Bi Xwedê tiştê li ba min heyî, min hemû li ser wê gora han got. Bibûre, bi Xwedê giryê min jî nema tê.

Duktor

Mirovek çû duktor anî ser bavê xwe. Duktor ji yê nexweş pirsî: Kûde te têşe?

Mêrik lê vegerand û got: Ev kaboka min a nigê rastê têşe.

Duktor çîqa hılanî û danî, dît ku ti nexweşî li dor mêrik nîne. Jê pirsî: Xalo! Emrê te çiqase?

Lê vegerand: Emrê min heştê sale.

Duktor got: Xalo! Bi Xwedê ti nexweşî li te xuya nakin.

Yê nexweş pirsî: Naxwe ev êşa lingê min ji çiye?

Duktor lê vegerand: Xalo! Êşa lingê te ji xityarî ye.

Mêrkê nexweş bi acizî li yê duktor vegerand û got: De here lo! Bi Xwedê tu ti tiştî ji textoriyê nizanî! Ma heger ji emir ba, ma emrê herdû lingên min ne biqasî hevin. Ma çima yek têşê û yê dî na!?

Hîn wilo dîtî ku qelebalixek ji aliyê dî tê. Duktor pirsî: Ev kîne şer dîkin.

Mêrkê nexweş got: Ne tiştike. Dev ji wan berde. Ev bavê min û bapîrê min in. ev adeta waye her û her xirecira wa ye û bi hev ve ne.

Dema duktor ev gotin bihîst, ji yê nexweş re got: Xalo bi xatrê te. Bi Xwedê xebera te ye. Ez ti tiştî ji textoriyê nizanim. Rabû da xwe û çû.

Ji çîrokên Mîrekan

(1)

Dibêjin carekê, şêrek li herêma Cizîra Botan hate xuyakirin. Xelkê gelek hesab jê kirin. Xelk pê axiftin û dan dest hev. Li memlaket bû qupînî heta xeber giha Mîr.

Mîr ferman da rihsipî û şêwirdarên xwe. Civînek taybetî ji bo vî hawî li dar xistin. Di encamê de diyarîk mezin xuyakir, got: Li Cizîrê bankin, bêjin: Heçî vî şêrî bikuje wê vê xelata mezin bistîne.

Nav û dengê şêr û xelatê giha her derî û her kesî.

Piştfî demeke ne dirêj dîtî ku şêr hatiye kuştin û kelaxê wî li çolekê ye.

Xelk hatin bi ser Mîr de kişîyan û her yek dibêje: Min şêr kuştîye.

Mîr ji wan dipirsî: Ka ji min re bibêjin, we çawa ew kuştîye?

Dema digotin bê çawa şêr kuştîne, ne diket serê Mîr, û ji wan re digot: Herin, ne we kuştîye!.

Heta rojekê şivanek bi tev dar û kulavê xwe yê şivantiyê, bê izn û destûr, kete eywana Mîr û got: Min

şêr kuştiye.

Hatin da wî bigrin û bidin alîkî.

Mîr got: Jê gerin. Bila were.

Şîpya li hemberî Mîr rawestiha. Mîr bang kiryê û jê re got: Hê jî were nêzikî min. Ji min re bêje: Ka te çawa şêr kuştiye?.

Mîr li ser Erşê xwe rûniştîbû, û herdû wezîrên wî yên milê rastê û milê çepê jî rûniştî bûn.

Şivan hat pêşberî Mîr, dest pê kir û got: Min du kûçik hene, navê yekî Qero ye, navê yekî Gurzo ye, weke ku wezîrê milê te yê rastê Qero be, û wezîrê milê çepê jî Gurzo be, û weke ku tu jî şêr bî, û destê xwe jî bi wan ve kir. Qero bi guhekî şêr girt, û Gurzo jî bi guhê dî girt. Min jî rahişte darê xwe û bilind kir. Û bi gotina xwe re qirasê darê xwe jî bilind kir.

Hema Mîr bi lez û bi dengê bilind jê re got: Kuro darê xwe deyne. Bi Xwedê ji te pê ve kesî ne kuştiye.

(2)

Carekê sibeha roja cejna Newrozê, Mîrê Botan ferman da e'skerê xwe û got: Divê hûn herin li Cizîrê mal bi mal bigerin, bila kesek di mal de nemîne, bila hemî herin derkevin çol û çiya, bi keyf û şahî cejna

Newrozê li dar xin. Piştî ku mal bi mal li deryê wan xistin, û fermana Mîr ji wan re gotin, hatin ba Mîr û jê re gotin: Jinek heye bi tenê , di mala xwe de ye, ji me re got: Ez emrê mîr bi cih nayînim. Mîr pirsî: We nizanî ew jin çî dixwaze? Jê re gotin: Belê Ezbenî, ji me re got. Mîr ji cihê xwe qepîçî û got: Çî dixwaze? Ji Mîr re gotin: Jinikê ji me re got: Mêrê min, birayê min û kurê min, hersê di zindana Mîr de ne. Ezê çawa herim cejnê û şa bibim!?

Mîr eskerê xwe rêkirin cem jinikê. Jê re gotin: Mîr dibêje: Ezê yekî ji wan ji bo xatrê wê, berdim. Ka ew kîjanî dixwaze?

Jinikê li vegerand û got: Herin ji Mîr re bêjin: Bira pişt e, Kezeb Xişt e, Mêr xweş tişt e. Ez bi taca serê Mîr kim, ku hersêka jî bernede, li min heram bin cejn û şahî.

Hatin gotinên jinikê ji Mîr re gotin.

Mîr yekser got: Herin hersêka jî berdin.

Beşek ji
gotinên pêşiyên Kurdan

- Gwîz bi gwîz, dagirtin hîz.
- Zik têr e û çav birçî ye.
- Xala xwahrzê rakirin, mama birazî windakirin.
- Kirinê heta mirinê.
- Siwarê xelkê her peyar e.
- Xeta xwehr ji gayê pîr e.
- Erda nizim pirtir avê vedixwe.
- Yê ku cêra çêki wê çembila jî pêveki.
- Dema ecelê mêruwê tê çeng û perê wê çedibin.
- Çi serê te li kevîr ket û çî kevîr li serê te ket.
- Ji yekê re gotin: Nîvê dinyayê ji te re ye. Got: Ma nîvê din ji kê re ye?
- Mêrê çê li ser navê xwe tê.
- Piranî zora mêranyê dibe.
- Ji xelkê re behr e, ji mi re jehr e.
- Ku mirov tayekî ji cilê wî bikşîni wê deh pîne jê bikevin.
- Heger tu ehli şuxul sehli.
- Kûçik dev li terya xwe naki.
- Biyanî, min dayê ji canî, dawiyê jî poşmanî.
- Kêla behana ti carî tijî nabi.
- Stiriya bi destê mi neçîne!

- Heta mirov ser destê xwe nemeşe, qîmeta nigê xwe nizane.
- Dinya gule, bêhnke û bide hevalê xwe.
- Mirov bê pîr wê bikeve deryakê kwîr.
- Li nalê jî didi, li bizmar jî didi.
- Ne her gohtin tê gohtin, û ne her çêlek tê dohtin.
- Yê ji Xwedê xafî ew kfire.
- Rovî ne diçû qulê hejek jî bi dûvê xwe ve girêda.
- Ya pîrê ji bê kesî.
Ya kalo ji bê nefîsî.
Herdûka li hevdû pirsî.
- Dema diza ji diza dizî, erd û `ezman lerizî.
- Dema xulamê mîr mir, xelk hemî çûn serxweşiyê. Dema mîr bi xwe mir kes neçû.
- Çavekî çemçirî çêtire ji yekî kor.
- Her teyrek bi refa xwe re xuyaye.
- Çê kiro bi xwe kiro, xirabî kiro bi xwe kiro.
- Ji devehê re gotin: Tu avisî. Deveh girî û got: Barê mi girantir bû, êmê mi kêmtir bû.
- Dinya milk e, mêr divê hilke.
- Bazara malê û sûkê li hev derneket.
- Berê gul bû, baran jî lê hat şil bû.
- Teyr li asîmana difire,
dikare neqş û nimûşa jê bigre.

- Ne xwarî û ne vexwarî, bi simbêla ve mayî.
- Dayê qedayê
Xuhê belayê
Jinê were pişta minê
Da ez te bigrênim li dora dinê.
- Xweda diki mû jî û na qetîni.
- Mala pîrê xweştire ji qesra mîrê cizîrê.
- Kêlîmisasê xwedî jê xelasê.
- Dinya aşê mirinê ye û her kes ardê xwe lê dike.
- Mirov bi çilika û heywan bi pirtika.
- Her zarokek li ser diya xwe digrî.
- Jina fediyok bi gundekî ye.
Mêrê fediyok bi kundekî ye.
- Qey banê me du bane, alîk deşte yek zozane?.
- Kenê bê`ara tê ji qulê dîwara.
- Berûwa ji qalkê xwe dere.
- Min ev por ne li ber tava heyvê sipî kiriye.
- Diya kura ma li ber dîwara.
- Kula aşvana aş e.
- Bi xêra lawa dixwe helawa.
- Tu tîr dikê û tu ruhn dikê.
- Qîza bibînin bi çavê kala, hespa bibînin bi çavê rewala.
- Apê necar, dîsa raze weke her car, Xweda yeke û derî hezar.

- Ez bi şev lê digeram, bi roj bi dest mi ket.
- Ez li asîmana lê digeram, min li erdê dît.
- Tav bi bêjingê nayê veşartin.
- Yekê destê xwe di çewalê garis de kir û pencek jê deranî û kire meqilkê de. Danî ser agir, ji nişkave bû çiqçiq wanê di meqilkê de. Garisên di çewêl de ji yên meqilkê re gotin: Hûn fihêt nakin, ew çi reqsa we ye?! Yên meqilkê li wan veğerandin: Heger agirê di bin me de, di bin we de ba, hûn libek bi tenê jî di çewêl de ne diman.
- Gîska gurî ne ji serê kaniyê be avê venaxwe.
- Parseke bi şûr û qetteke.
- Mal de bi gorî ji derve be.
- Ji ber dilopa çû ber şirikê.
- Min ne mêr heye li nav mêra, ne ga heye li nav garanê.
- Dema dikançî xizan dibin, li defterê kevn vedigerin.
- Çûna hemmamê ne weke derketina wê ye.
- Zêdekirna her tiştî di destê Xwedê de ye, zêdebûna dew di destê diya min de ye.
- Heçî neha nede deha naxwe.
- Yekî digot; Va hirçek.
Yê dî digot: Va cihê lingê wê ne.
- Ez çi dibêjim û tembûra min çi dibêje.

- Kar şêr e, dema mirov pey dikeve dibêrovî.
- Bila devê gotina te nerm be, piştî wê hişk be.
- Filano nan bi guhê xwe dixwe.
- Filano di guhê gê de razaye.
- Gotinên êvara dikevin qulê dîwara.
- Heger sê mirovan gotin: Kumê te ne li serê teye, divê tu destê xwe bavêjê serê xwe.
- Sed dost hindikin, dijmînek gelege.
- Here Edenê, zêra bixê gerdenê.
- Xwediyê xêra dibin parsekê devê dêra.
- Gur dikujin, û çeqel dixwin.
- Her giyak li ser koka xwe şîr tê.
- Mîna hingivê di eyarê sê de be.
- Ji rovî fenektir nîne û ji eyarê wî jî pirtir nîne.
- Feqîr çûn da xwe hilawîsin, dîtî ku zengîn li ba dibin.
- Gotina kete nava dev û dirana, wê bighê şêr û şehristana.
- Ji hinika re behr e, û ji hinka re jehr e.
- Ma ka ne ya te ye, kadî jî ne ya te ye.
- Bila avis be kengî be wê bizê.
- Av bi bêjîngê nayê civandin.
- Destê tirsoka naçe ser sênga gewra.
- Yê here dizya hingiv, wê mêş pêve bidin.
- Çêlikê mara bê jehr nabin.

- Çira li ber kora ye.
- Mastê sipartî pisîkê.
- Dîn ji xwe dînin, lê yê ji wan bawer dîkin ji wan dîntir in.
- Dê û dohtê şer kir, bê aqîla bawer kir.
- Dê bibîne, dohtê lê bîne.
- Here mileta bigre adeta.
- Her tişt ji ziravî lê mirov ji sitûrî diqete.
- Gula zer! Tu mabû, te jî da der.
- Pîra Sibatê rabû liqatê.
- Zehf in lê bê nehf in.
- Ya ji me kême zerxizême.
- Qey nanê genim li sêwiya heram e?
- Her ez singekî biçikênim, tu ciherekî pê ve dikî.
- Temaşe belaş e.
- Feqîr çûn diziyê, heyv êvarî derket.
- Feqîr û jar weke par û weke pêrar.
- Ez ga dikirim, dibe golik, genim dikirim dibe şolik.
- Têr ti carî têr nabin, birçî her birçî ne.
- Tu bi jor ve tif kê tê ser simbêla, û tu bi jêrve tif kê tê ser rihê.
- Bila pişta te li malê te be ne berê xelkê.
- Heta heye şirrik û gurrik, dema namênê kovan û kurrik.

- Ewilî zîkê xwe têr ke paşî xêr ke.
- Her sûkek û bazareke.
- Rûnê payîza bidin ezîza.
- Ku dizê malê ji malê be, wê golîkê di kulekê re derxe.
- Min guhek kir bêjîng, û yek kir serad.
- Her diranekî wan şiklekî dixwe.
- Gotinên êvara dikevin qulê dîwara.
- Kevanî pir bûn, xwarin şewitî.
- Mala têr jin, xerabû ji bin.
- Ji yekê re gotin: Nîvê dinyê dane te. Di cî de got: Û nîvê dî dane kê!?
- Cihê av lê heye, avaye.
- Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu bibhîze.
- Me mal nekir ji malê pir, em bikin ji kavirê kur.
- Mêr co ye, jin qafo ye.
- Nebe hevalê derewîna, tê bifroşe cih û livîna.
- Ne rûne li ber dîwara, da hîn nebî vexwarna çixara, û destê xwe nexê berîka vala.
- Ne esil kil û kildane, lê esil teşî û badane.
- Sîwak û tîzbî û nivîşt, dinyayê nakin buhîşt. Lê qelem û zêr û kursî xweşiyê didin her kesî.
- Zêdebûna her tiştî di destê Xwedê de ye, lê ya dew di destê diya min de ye.
- Xwelî li wî serî be ku heft serî jê ne aciz bin.

- Xatûnê! Me tu li jor dîtî û li jêr jî dîtî.
- Filano di kevçîkek av de dixenîqe.
- Her kes qaziye ji xwe razîye.
- Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu bibhîze.
- Me mal nekir ji malê pir, em bikin ji kavirê kur.
- Mêr co ye, jin qafo ye.
- Nebe hevalê derewîna, tê bifroşe cih û livîna.
- Ne rûne li ber dîwara, da hîn nebî vexwarna çixara, û destê xwe nexê berîka vala.
- Ne esil kil û kildane, lê esil teşî û badane.
- Sîwak û tîzbî û nivîşt, dinyayê nakin buhîşt. Lê qelem û zêr û kursî xweşiyê didin her kesî.

Dawî

ریقہ بہ ریا چاپ و بہ لا فکرنی - دھوک

ژ	ناټي پږتو کي	نقيسه	ترخ	ژمارا لاپهړان	سال
۱-	بايلوژيا گهردي و خانهي	وهر گيرژ ټينگليزي: ديان جهيل	۵۰۰۰	۱۷۰	۲۰۱۱
۲-	مايکروبايلوژي	وهر گيرژ ټينگليزي: ديان جهيل	۵۰۰۰	۴۰۰	۲۰۱۱
۳-	رومان خوډيکا ژبانيه - ج۱	د.عارف حيتو	۵۰۰۰	۲۰۸	۲۰۱۱
۴-	شورشين جهموهری نهره	د.فاضل عمر	۴۰۰۰	۱۰۵	۲۰۱۱
۵-	روټلي دقې دنافا کرنا درامایا کوردیدا	شقان قاسم	۵۰۰۰	۲۴۳	۲۰۱۱
۶-	تطور الاعلام الكردي (۱۹۹۱-۲۰۰۳)	حسين صديق عقراوي	۵۰۰۰	۲۹۳	۲۰۱۱
۷-	الرواية التأريخية (دراسة في الادب الروائي محمد سليم سوري غودجا)	د. جمال خضير الجنابي	۵۰۰۰	۲۲۶	۲۰۱۱
۸-	تافگه ليگهريان ل روټاهيا پرا جينوتي	تد حسين نافشکي	۵۰۰۰	۱۵۲	۲۰۱۱
۹-	هن ثالين جفاکي کوردی دکولتري	نزار محمد سعيد	۴۰۰۰	۱۴۳	۲۰۱۱
۱۰-	هيتري ماتيس (۱۸۶۹ - ۱۹۵۴)	فهيمي بالايي	۴۰۰۰	۸۵	۲۰۱۱
۱۱-	شونوارين دهفرا دهو کي	عزوت فندي	۵۰۰۰	۲۴۷	۲۰۱۱
۱۲-	سزاتين عمهري عمدهي ژ کانيا چرافي	هزرفان عبد الله	۴۰۰۰	۴۴۵	۲۰۱۱
۱۳-	فن وعمارة الكورد	رنا فتحي الاومري	۵۰۰۰	۳۱۶	۲۰۱۱
۱۴-	فهردهنگا زمانې پهرتيا / کوردی - پهرتي	فاضل عمر	۴۰۰۰	۲۱۲	۲۰۱۱
۱۵-	بزافا شانويي (ل نا کوي - ناميدي - زاخو / شانوا قورتاخانهيان ل دهو کي ۱۹۷۰ - ۱۹۹۰)	رفعت رجب جهمال	۴۰۰۰	۲۵۲	۲۰۱۱
۱۶-	<i>Gotinên li ber mirinê</i>	ديا جوان	۲۰۰۰	۴۰	۲۰۱۲
۱۷-	ساليڼ په ناهيري ژبانا نيسحان نوري پاشاي	موسه دهق تزفي	۵۰۰۰	۱۷۰	۲۰۱۲
۱۸-	نالايي کوردستاني- فکولنه ک ديرو کي ل سهر نالا د ميژوا کوردستاني	يوسف صبري	۴۰۰۰	۲۱۲	۲۰۱۲
۱۹-	جاره ک ژ جارا (کورتو چيرون کين فلوکلوري)	ديا جوان	۳۰۰۰	۲۰۴	۲۰۱۲

Diya Ciwan



Carek ji cara

Kurteçîrokên folklorî

0019

رێڤه به ریا چاپ و به لاقرنی - دهوك
ژمارا سپاردنی 2012 - 2218